DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz


Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

## https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

- Telegram: https://t.me/birkitapbir
- WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y




Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Heinrich Böll

# Şerefa wendabûyî ya Katharina Blum

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Heinrich Böll

# Şerefa wendabûyî ya Katharina Blum

## Yan: Çawa bikaranîna zorê tête holê û çi encaman bi xwe re tîne

Wergera ji almanî: Şahînê Bekirê Soreklî

NÛDEM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Weşanên Nûdem: 29
Şerefa wendabûyî ya Katharina Blum
Çapa Yekem: Stockholm 1997

Orjînala pirtûkê: Die verlorene Ehre der Katharina Blum
oder: Wie Gewalt entstehen und wohin sie führen kann
Erzählung (Köln 1974)

© Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê: Anna Ancher (1859-1935),
Young girl in front of a mirror, 40, 1 x 32, 7 cm., 1899.
ISBN: 91 88592-29 4

Navnîşan: Termov. 52
176 77 Järfälla-Sweden
Tel û faks: 8-583 564 68

**Bêî destûra weşanên Nûdemê, jinûveçapkirin,
an jî di kovar û rojnameyan de weşandin qedexe ye**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Pêşgotina Wergêr

Heinrich Böll (Heynrîş Bôll tê xwendin) di sala 1917'an de li bajarê Kölnê hatiye dinyayê. Li dû kutakirina lîseyê ew di firoşgeheke pirtûkan de dest bi kar dike û dû re salên şerê cîhanî yê 2'em bi tevahî di leşgeriyê de derbas dike. Nivîskariya wî li dû kutabûna şer dest pê dike û kurteçîrokên wî yên destpêkê, wek Trên di demê de gihîşt û Lê tu li ku bûyî, Adem, xwe bi rewşa belengaziyê û dijwariyê ve peywendîgir dikin ku almaniyan li dû şer xwe tê de dîtin. Kurteçîrokên wî li dij şer in, wê xwebêjê didin ku şerê di navbera merovan de ji mirin û belengazî û xemgîniyê pê ve tiştekî nayne holê. Ew bizavê dike ji almanan re bibêje: Navêt fersend careke din bête dayîn ku partiyeke wek ya nazî û kesekî wek Hitler li Almanya bêyên ser karbidestiyê.

Böll yek ji hîmdarên kurteçîroka almanî ya nûjen e, hejmareke ji berhemên nerxbilind li dû xwe hîştine û yek ji wan Şerefa wendabûyî ya Katharina Blum e.

Bi taybetî di salên dawîn yên jiyana xwe de, Böll wek piştgirekî azadiyê û mafên merovan li tevahiya cîhanê deng dide. Ew ji haliyê rêxistin û dezgehên welatên cuda de tête vexwendin, wek serokê rêxistina navneteweyî ya nivîskaran, PEN, tête helbijartin û di sala 1972'an de Xelata Nobel ya edebiyatê ji bo wî tête pêşkêşkirin. Li dû jiyaneke bi xebat û fîdakariyê dagirtî, Böll di sala 1987'an de ji cîhanê koç dike.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Romana Şerefa wendabûyî ya Katharina Blum (Katarîna Blûm tê xwendin) di sala 1975'an de hatiye nivîsandin. Bêyî çi guman, bi nivîsandina vê romanê Böll mebesteke siyasî heye, bi hêviya ku kelkê bigihîne civatê. Ew ji rojnameyên şêwenizim û bikarhanîna zorê, herweha ji metodên dewletê yên ne di cîh de, razî nîne û dixwaze haya xwendevên bikişîne ser van pirsan, bi taybetî ser wê yekê ku çawa metodên şaş û xar û rojnamevaniya bênerx dikarin bibin sedema bikarhanîna zorê. Katharina Blum ya ku di jiyana xwe de çi caran zor bi kar nehaniye bi encama van metod û kirinên ne di cîh de dibe kujer. Mixabin, stîlê Böll bi kar tîne ne yekî hêsan e, ew bûyerên serpêhatiyê geh wek rapor, geh wek nûçe û geh wek çîrok pêşkêş dike; herweha axiftina rasterast û nerasterast bi kar tîne. Hindek hevokên hatinî bikarhanîn bêtir ji rûpelekê tiji dikin bêyî ku nuxte(.) bête bikarhanîn. Dema min di sala 1987'an de roman ji almanî wergerand kurdî, min hevok kurt nekirin û hewl da ji stîla hatî bikarhanîn bi dûr nekevim. Hindek hevalên li berhemê niherîbûn, wek Hesenê Metê, ji min re behsa dirêjbûna hevokine kirin ku têgihîştina wan carine zor dibe. Ji ber vê yekê, min ew di 1996'an de ji nû ve nivîsand. Cîhê gotinê ye ku têgihîştina beşine romanê di orijînala bi almanî, herweha wergerandina îngilizî de jî ne hêsan e. Romanên wek vê bêtir ji haliyê "întelektuelan" û xwendevanên şaxên edebiyatê de têyên xwendin. Hêvîdar im xwendevanê kurdî têgihîştina wê dijwar nebîne. Ya rast ew e ku min dil nebû wergera kurdî hîn bêtir hêsan bikim çimkî tiştekî wisa dikare bandoreke ne baş li nerxê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

edebî yê berhemê bike.

Bêguman, gellekî baştir e ku tişt di katê de bêyên kirin. Roman xwe bi bûyerên li Almanya di salên 70'yan de diqewimîn ve peywendîgir dike û ew ê bi kelktir bûya eger wergera kurdî di wê demê de hatibûya weşandin lê mixabin wisa nebû. Di wan salan de, bi armanca "şerê li dij terorîzmê" û rêxistinên wek ya Bader Meinhof, qanûnên taybetî dihatin bikarhanîn û polîs dikaribû têkeve hundir malên kesên ku guman di derheqê wan de li holê hebû. Çapemeniya Almanya, bi taybetî rojnameyeke ku Böll li vir wek Die Zeitung (ROJNAME) bi nav dike xwe bi pirsa "şerê li dij terorîzmê" ve peywendîgir dikir. Rojnameyên şêwenizim li serên kesên wek "sempatîzan," yanê piştgirên rêxistinên çep yên milîtan, dihatinî binavkirin dibûn bela. Ev berhema Böll xwe bi vê pirsê ve mijûl dike. Wek li jor hat diyarkirin, wergera kurdî berî neh salan amade bû û divabû ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya li Almanya de hatibûya weşandin, ya rast, Enstîtuyê tika kiribû ku ez bi vî karî rabim lê ev çîrokeke bi serê xwe ye û cîhê xwe ne li vir e. Min dil heye li vir spasiya Firat Cewerî bikim ku weşandina vê berhemê bi rêya Weşanên Nûdem pêkan kir, herweha Hesenê Metê ji bo pêşniyariyên wî yên berî çend salan. Li gel derengmayînê jî, tiştê ku Böll dixwaze bibêje hîn îroj jî ji bo Almanya û gellek welatên din pirseke aktuel e.

Ji bo hêsankirina têgihîştina romanê, min dil heye di destpêkê de navên hin kesên di romanê de xwedan rol in binivîsînim da ku xwendevan bikaribe li wan vegere, eger hewcedarî hebû:



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Katharina Blum (Katarîna Blûm): Bokeya serpêhatiyê.

Dr. Hubert Blorna (Hûbirt Blorna): Abûkatekî pîşesaziyê; Katharina di mala wî de wek malxevan kar dike.

Trude Blorna (Trûdê Blorna): Jina Dr.Hubert Blorna.

Hach (Hax): Abûkatê Giştî û dostekî Blorna.

Erwin Beizmenne (Êrvîn Baytsmênnê): Mamûrekî polîs'î şûnbilind (serek-komîsarê cînayî).

Walter Moeding (Valter Môdîng): Alîkarê Beizmenne; mamûrekî polîs.

Ludwig Götten (Lûdvîg Gôttin): Xortekî ku polîs li dû ye, Katharina di mala meriyeke xwe de rastê tê, jê hez dike û şevekê li gel derbas dike.

Werner Tötges (Vêrner Tôtgis): Rojnamevanekî ROJNAME'yê ku roleke mezin di herimandina jiyana Katharina de dilîze û ji haliyê wê de tê kujtin.

Alfred Schönner (Alfrêd Şônner): Wênekêşekî ROJNAME'yê yê ku bi şêweyeke nezelal tê kujtin.

Karl (Karl): Dû re diyar dibe ku endamekî hêza polîs e.

Else Woltersheim (Êlzê Volterzhaym): Merî û hevaleke Katharina.

Konrad Beiters (Konrad Bayterz): Hevalê Else Woltersheim.

Jin û mêr Hiepertz (Hêpêrts): Katharina carine di mala wan de kar dike.

Pletzer (Plêtser): Endameke hêza polîs.

Kurt (Kûrt): Brayê Katharina.

Wilhelm Brettloh (Vîlhelm Brêttloh): Mêrê Katharina yê hatî berdan.

Dr.Fehnern (Fênern): Katharina di navbera 1968'an û 1969'an de li nik wî di kar de bûye.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Alois Sträubleder (A. Ştroyblêder): Kesekî navdar û dewlemend ku dosetekî Blorna ye û li vir wek "mîrzamêvan" tête binavkirin.

Lüding (Lûding): Merovekî şûnbilind û dewlemend. Blorna di şirketa wî û Sträubleder de kar dike.

Hertha Scheumel (Hêrta Şoymil) û Claudia Stern (Klodya Ştêrn): Keçikên ku Götting û Karl li gel xwe tînin civîna dansê.

Şahînê B.Soreklî
Sydney: 15/7/1996



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Kes û bûyerên di vê
serpêhatiyê de xeyalî ne...



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 1

Ev rapora li pêş ji çavkanîne biçûk û sê çavkaniyên serek hatiye holê. Ew ê di destpêkê de carekê werin bi navkirin û hew. Çavkaniyên serek: nivîsar û dokûmentên li nik polîs, yên li nik abûkat Dr. Hubert Blorna, û yên li nik hevalê wî yê rojên xwendegeh û xwendekariyê, Peter Hach, abûkatê giştî. Birêz Hach -di navbera min û xwe de, bêguman- li ser protokol û nivîsarên îfadegirtinê ziyade kir û ez di derheqê hindek kirinên mamûrên polîs û encamên lêkolînên wan de agahdar kirim. Divêt li vir bête gotin ku agahiyên ji haliyê Hach de ne ji bo bikarhanîna ji armancên fermî re, lê ji bo mebestên şexsî hatibûn dayîn. Hach bi rastî jî bi ber acizbûn û dilxemgîniya hevalê xwe Blorna diket, yê ku va merseleya bi ser û binê wê ve fêhm nedikir, lê "dema ez tê de ponijîm," hat xuyakirin ku "mersele ne tenê dikare bête fêhmkirin, lê herweha mentiqî ye." Ji ber ku merseleya jina ciwan Katharina Blum, ji ber xusetê wê, herweha rewşa nemunasib ya abûkatê wê, dê kêmzêde serpêhatiyeke xeyalî bimîne, kirina şaşitiyên biçûk wek yên Hach ne tenê normal in ji bo merovan lê herweha dikarin bêyêu bexşandin.

Ne pêwîst e behsa çaviyên biçûk, hindek ji wan zor grîng, hinên din ne weqa, li vir bête kirin çimkî bandor, têkilî û peywendiya wan li gel serpêhatiyê; herweha şaşmayîn, kethevî û îfadedayîna bi wan ve peywendîgir ê di nav raporê de bêyên xuyakirin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

2

Eger xwendevan vê raporê -ji ber ku behsa çavkaniyan pirr têye kirine- wek "ava di rê de" bi bîr wîne, bila bi kerema xwe biborîne: çi rêyên din nebûn. Hebûna "çavkaniyan" û "birêveçûna" wan rê nadin ku merov behsa lihevrêsandinê bike. Heye ku baştir be merov behsa "berbihevhanînê," yan "bihevgîhandinê" bike. Kesê di zarokiya xwe de (yan tew di berbextiya xwe de) di ava kortan de, li kêleka wan, yan bi ava wan lîztibe û av ji kortan bi rêxistibe, dabe rijandin, di herqan de gîhandibe hev, kort vala kiribe, yan ava wê bi haliyekî de badabe ta ku tevahiya ava li holê di herqekê de gîhandibe hev, bilindî û nizimtiya wê guhertibe, yan heye ku tew bi hostetî ew ava raste kehrîzên dewletê kiribe, ew kesa dê mebesta behiskirina "çavkaniyan" û "birêveçûna" wan fêhm bike. Yanê, mebest tenê bi rêxistina avê û zewakirina şûna wê ye. Bêguman, şêwyeke tertîbkirinê ye. Wisa, eger va serpêhatiya li hindek şûnan wek birêveçûna avê biçe, proseyeke ku tê de bilindî û nizimtiya dûzahiyê rola xwe dilîze, bila xwendevan bibexşîne. Em bixwazin-nexwazin rawestandin, xetimandin, lihevkombûna qûmê; herweha herq û çaviyên ku "nedikarin tev hevûdin bibin" ê her hebin; ev hîn ji bilî çavî û çemikên binzemîn, ûhd., ûhd.

3

Bûyerên ku em ê li vir behsa wan bikin gellekî zelal in:

Roja çarşemê, 22.2.1974, êvara destpêkirina rojên kar-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nîvalê (1), jineke ciwane bîst û heft salîn dora katjimêr 6.45'ê êvarê ji apartmana xwe ya li bajarekî diçe der û berê xwe dide maleke ku tê de civîneke dansê heye.

Çar rojan şûnve, li dû bûyerine balkêş ku merov dikare wek "bûyerên dramatîk" bi nav bike -bi rastî jî çi navên din li wan nabin (ev e nimûneyeke mistewayên cuda ku dihêlin av di riya xwe de biçe) - di êvara roja yekşemê de, di demeke hema-hema wek ya roja çarşema borîn de (kata rast 7.04'ê êvarê bû) eynî jina ciwan li zengilê mala Walter Moeding, Komîsarê cînayî, dixe, yê ku di wê deqeyê de kincên şêxên Ereban li xwe dikêye, ji bo sedemên fermî, ne yên şexsî, da ku kîbûna xwe veşêre. Jina ciwan ji bo Moedingê şaş û mat mayî dide zanîn ku wê îroj nîvro, dora katjimêr 12.15, rojnamevan Werner Tötges di apartmana xwe de kujt, ku bila Moeding bi kerema xwe daxwaz bike da ku deriyê apartmanê bête şikandin û yê mirî ji wir bête "derxistin." Jina ciwan diyar dike ku ew di navbera katjimêr 12.15 û 19.00 de li bajêr digeriyaye, bi armanca dîtina hestê poşmantiyê, lê nikaribûye bibîne. Wê herweha ji Moeding daxwaza girtina xwe kir, da ku biçe cem "Ludwigê xwe yê hêja."

Moeding, yê ku berê çend caran di îfadegirtina merova ciwan Katharina Blum de beşdar bûye û loma wê dinase, û heta dilê wî jî hebkî bi wê dişewite, deqeyeke tenê jî li gotina wê nakeve gumanan. Ew wê di otomobîla xwe de dibe navenda polîs, serdarê xwe, serek-komîsarê cînayî Beizmenne, agahdar dike, jinikê rêdike hucreyeke girtîgehê û li dû 15 deqeyan ew û serek-komîsar Beizmenne xwe li pêş deriyê apartmanê digihînin hev. Komandoyekî polîs dêrî dişikênîne û tê xuyakirin ku gotina jinikê rast e.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Bila li vir li ser xwînê pirr neyê gotin, zatî hewcedariya weqa grîng jî ji bo vê yekê tune.Xwendevanê bixwaze xwînê bibîne, bila berê xwe bide televizyon û sînemayê, yan biçe temaşene hunerî û yên tirsandinê. Eger tiştekî rijandinê li vir hebe, bila ne xwîn be. Heye ku grîng be em bala xwendevên bikişînin ser bandora hindek rengan: Tötges, yê hatî kujtin, kirasekî şêxan li xwe kiribû ku hema ji rûyê şeltan hatibû çêkirin; û her kes baş dizane hebûna xwîneke pirr li ser tiştekî sipî çawa tê xuyakirin. Li vir rola dabençeyê hema hindik dimîne ku bibe ya tulumpeya reşandina rengan; û ji ber ku kirasê yê mirî ji cawekî gewrsipî hatiye çêkirin, xwîna li ser rijiyayî û belav bûyî bêtir wek tabloyeke wêneyên modenûjen, yan wek rengên li ser sehneyên şanoyê carine têyên bikarhanîn, xuya dike. De baş e. Ev bû bûyera cîh girtî.

4

Hindik mabû kujtina Alfred Schönner, wênekêşekî rojnameyan, yê ku herweha hatibû kujtin û laşê wî çarşema li pê bûyera yekem di beşekî daristana roavayê bajarê bi fealiyatên karnîvalê ve mijûl hatibû dîtin, têxin stuyê Blum, lê dû re, dema roj û katên herdu bûyeran dabûn hember hev, xuya bûbû ku çi peywendiya wê li gel bûyera duyem tunebû. Paşê, şofêrekî taksiyan dabû zanîn ku wî Schönner, yê ku herweha kincên şêxan li xwe kiribûne, li gel jineke ciwan ya ku kincên endelusî li xwe kiribûne, di otomobîla xwe de gîhandibûne ew beşê daristanê ye. Lê Tötges nîvroya roja yekşemê hatibû kujtin, Schönner li milê din, ne berî nîvroya sêşema li dû. Tevî ku li dû kur-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

tedemekê hat xuyakirin ku Schönner bi dabençeya ki ber laşê Tötges hatî dîtin nehatiye kujtin, dîsan jî ew ji bo çend saetan li Blum ketibûn gumanê; ev jî ji ber wekheviya mebestê. Yanê, eger wê ji bo girina tolê Tötges kujtibe, ma ew ê çima nikaribe Schönner jî bikuje, da ku heyfa xwe ji wî jî hilîne? Ji bo mamûrên polîs yên bi vê pirsê ve mijûl jî wekî tiştekî ne mentiqî dihat xuyakirin ku Blum xwediya du dabençeyan be. Blum currma xwe bi aqilmendiyeke bêxem kiribû; dema ji wê pirsîbûn, eger wê Schönner jî kujtibe, wê bersîv bi şêweyeke nixamtî, wek pirsekê dabû: "rast erê, ma çima ne ew jî?" Lê dû re polîs gumanên xwe li şûn hîştin û nema êdî ew di derheqê kujtina Schönner de gunehbar kirin, bi taybetî ji ber ku şahidan çi cîh ji gumanan re nehîştibûn. Hemî kesên Katharina Blum dinasîn, yan di demên îfadegirtina wê de fêrî xusetê wê bûbûn, dizanibûn, eger wê rast Schönner kujtibûya, wê dê rasterast bigota, erê, min kujt. Jê bêtir, şofêrê taksiyê, yê ku Schönner û jina ki gel wî biribûn ew beşê daristanê ("ya rast, şûneke bi çend dar-marên berrî ye, ne daristan e," wî gotibû), Blum di wêneyan de nenasîbû. "Ji bo xwedê, lo," wî gotibû, "van keçikên xweşik yên porqehweyî, 163 ta 168 sentîmetir dirêj, bejinzirav û 24 ta 27 salîn, bi sedhezaran ji wan di rojên karnîvalê de li herderê ne."

Di apartmana Schönner de jî çi şopên Blum nehatibûn dîtin, ne jî yên jinika bi kincên endelusî. Hevkar û nasên Schönner tenê dizanibûn ku ew roja sêşemê nêzikî nîvro ji meyxaneyeke ku tê de rojnamevan digihîştin hev "tev yeke ji wan keçikên berdayî derketibû."



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## 5

Berpirsiyarekî şûnbilind yê karnîvalê, bazirganekî mey û şampanyayê, ku bi serbilindî behsa rola xebata xwe ya zîz di derheqê vejandina hestên kêfxweşiya di van rojan de dikir, bexteweriya xwe diyar kiribû, ku nûçeyên van herdu bûyeran, ya yekê roja duşemê û ya ya din roja çarşemê belav bûn, ne zûtir. Wî gotibû, "nûçeyên wisa, eger di destpêka van rojên pîroz de belav bibin, ew ê hîmeta di derheqê karnîvalê de sar bikin û bandoreke kêm li rewşa kirîn û frotinê bikin.Eger xelk agahdar bibe ku kincên di rojên karnîvalê de têyên lixwekirin ji bo armancên cînayî têyên bikarhanîn, hestê kêfxweşiya wan ê biherime û rewşa kirîn û frotinê dê têk biçe. Tiştekî wisa bi rastî kufir e. Bextewerî û derbaskirina kateke xweş li ser hîmên bihevbaweriyê têyên holê."

## 6

Li dû ku kujtina rojnamevan û wênekêşê wê hat zanîn, ROJNAME'yê dest bi kirinên mat kir. Heyecanên nakevin aqilan! Sernivîsên mezin. Rûpelên Yekem. Hejmarên taybetî. Diyarnameyên miriyan yên weqa mezin. Te digot qey kujtina rojnamevanekî -eger kujtin li cîhanê dike îlleh hebe- tiştekî nemaze ye, ji kujtina serdarekî bankan, karmendekî, yan dizekî wan grîngtir e.

Rastiya ku vê bûyerê bi şêweyeke weqa mezin bala çapemeniyê kişand ser xwe divêt li vir bête danzanîn çimkî ne tenê ROJNAME'yê lê herweha rojnameyên din jî kujtina rojnamevanekî wek tiştekî gellekî xirab, erjeng, hema-he-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ma wek bûyereke bi hewcedariya merasîman, merov dikare bibêje, wek kujtineke ku peywendiya xwe bi terîqetên oldar ve hebe hesebandin. Heta gotina "qurbanê karê xwe" jî hatibû kirin, û helbet ROJNAME'yê bi serhişkî kujtina Schönner jî dixist stuyê Blum. Tew werin em bipejirînin ku ihtîmal mezin e Tötges ê nehatibûya kujtin, eger ew ne rojnamevan bûya (li şûna ku rojnamevan be, em bibêjin, koşkar yan nanpêj bûya), dîsa jî divabû merov hewl dabûya li rastiyê bigere, ka ew ê ne bêtir di cîh de bûya ku bête gotin, ew bi encama karê xwe hat kujtin, ne ku bû "qurbanê karê xwe," ji ber ku ew ê dû re xewan bibe çima meroveke zîreke bêhnfireh wek Blum ne tenê tevdêra kujtina wî dike, lê herweha nexşeya xwe bi kar tîne, û di kateke biryarxwaz de ku ji haliyê wê de hatibû bijartin ne tenê dabençeyê dikişîne, lê bi kar jî tîne.

## 7

Werin em ji vê mewziyeta herî nizim rasterast biçin dûzahiyên bilindtir. Me xwîn navêt. Bila heyecana rojnameyan jî ji bîr biçe. Apartmana Katharina Blum di navberê de hat paqişkirin, xaliyên pîs û pas bûnî hatin çekirin, mobêlya hat pakindkirin û li şûnê hat vegerandin; û ev hemî bi pere û daxwaza Dr. Blorna yê ku va mafa bi rêya hevalê xwe Hach bi dest xistibû, tevî ku hîn demeke ne kurt divabû da ku bête zanîn ka bi şêweyeke fermî dê bihata pejirandin ku Blorna bibûya berpirsiyarê tiştên Blum, yan na.

Çawa be jî vê Katharina Blumê di nav pênc salan de şêst hezar mark ji nerxê apartmana xwe ku bi tevahî sed



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hezar e dabûn. Wisa - wekî ku brayê wê, yê ji bo cezayekî biçûk nuha di girtîgehê de ye, dibêje - "gellek tiştên bi dohn li holê hene." Lê li milê din, kî dê fayiz û teqsîtên çel hezar markên manî bide, eger li ser van pereyan tew hên ziyade nebe jî? Bi gotineke din, li holê ne tenê mayîn lê herweha dayîn heye.

Çawa be jî Tötges nuha di gora xwe de ye (bi merasîm û hêlehopeke mezin, bi dîtina hinan). Tiştê balkêş, ji bo mirin û binaxkirina Schönner weqa haydarî û rûmet nehatin dayîn. Ma gello çima? Ji ber ku li şûna ew bibe "qurbanê karê xwe," bi ihtîmaleke mezin, bûbû qurbanê cerîmeteke evîndariyê? Kincên şêxan di enbara polîs de ne, herweha dabençe (yeke 08 mm), ya ku ji bilî Blorna kesek nedizane ji ku hatiye; mamûrên polîs û dayîreya abûkatê giştî kirin-nekirin bizanibin ka va dabençeya ji ku hatiye, lê bêyî çi encam.

## 8

Lêkolînên di derheqê çûn û hatinên Blum yên çar rojên di pirsê de berê baş çûn, lê di berhevkirina agahiyên li ser roja yekşemê de rastî dijwariyan hatin.

Roja çarşemê dûnîvro Blorna bi xwe meaşê du hefteyan, pereyên wê hefteyê û ya li dû wê, ji bo her hefteyê 280 mark, dabûn Blum, ji ber ku ew û jina xwe wê rojê dûnîvro derdiketin tatîla zivistanê da çend rojan li ser çiyan derbas bikin. Katharina ne tenê soz dabû wî û jina wî, lê ji wan re herweha sond xwaribû ku li dû ew karê rojên dûr û dirêj ew ê çend rojan rihetiya xwe bistîne û di rojên karnîvala îsal de demeke xweş derbas bike, li şûna ku wek sa-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

lên raberdû bike û bi ser karê xwe de biçe li cîhine din kar bike yên ku tenê di rojên karnîvalê de vedibûn. Wê ji wan re bi dilşadî gotibû ku daya wê ya bav-vaniyê (paptîzmê: wergêr), ya ku herweha heval û piştgira wê bû, Else Woltersheim, ew vexwendiye mala xwe, cîhê ku tê de êvareke dansê dê cîh bigirta, ku wê sebir nedikir xwe bigihînê çimkî ji mêj ve ye ew ji ber nebûna katê neçûbû dansê. Li ser va gotina wê jina Dr. Blorna gotibûyê, "xem nake, Katharinkê, dema em vegerin, em ê careke din hevaline vexwênin êvareke dansê da ku tu dîsan bikaribî rabî dîlanê." Katharina gellek caran gazinc kiribûn ku li dû hatina bajêr, ji pênc-şeş salan û vir de, qe fersend neketiye dest ku hema "biçim ji xwe re biçekî li derekê bireqisim jî". Wê hay hebûye ji wan şûnikên dansê ku tê de xwendekarên berzikbirçî li kes-meseke doxînsist digeriyan, wê gotibû herdu Blornan, herweha ji wan cîhên ku tê de bêwar û serserî tê de digihîştin hev, lê van deran ne cîhên yên wek wê bûne; û êvarên dansê yên ku ji haliyê kilîseyan de dihatin birêxistin ew hên bêtir aciz dikirine, wê gotibû.

Bi hêsanî hat îspatkirin ku Katharina roja çarşemê dûnîvro li dû kutakirina karê xwe li mala Blorna du saetan li mala Hiepertz jî kar kiriye, li kuderê ew carine diçû alîkariya xwediyên malê, li gor daxwaza wan. Ji ber ku Birêz û Xanim Hiepertz jî di rojên karnîvalê de bajar li şûn dihîştin û diçûn Lemgo, mala qîza xwe, Katharina herdu merovên umirmezin di Volkswagena(2) xwe de gîhandibûn rawesteka trênê. Tevî ku dîtina şûneke rawestandina otomobîlê ne hêsan bû jî, wê bi îsrar daxwaz kiribû ku wan bigihîne kêleka rêhesinê û çenteyên wan jî rake. ("Na, na, ne ji bo pereyan. Ji bo tiştên wisa ew pereyan



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

naxwaze. Eger em bidinê, ew ê li xatirê xwe bihêle," gotibû Xanim Hiepertz.)

Trên bi îspat katjimêr 17.30 ji rawestekê bi rê ketibû. Em bibêjin, pênc ta deh deqe ji bo Katharina divên da ku xwe di qerebalixa destpêka rojên karnîvalê de bigihîne otomobîla xwe û bîst, heye ku bîst û pênc deqe, da ku xwe bigihîne apartmana xwe ya li kêleka bajêr. Xwebêja vê ew e ku ew pêş katjimêr 18.00 ta 18.15 negihîştiye mal, û ev hemî xuya dike ku kata Katharina Blum roja çarşemê derbas kirî deqe bi deqe dikare bête îspatkirin, bi taybetî eger em bipejirînin ku wê li dû gihîştina mal xwe şûştibe, kincên xwe guhertibin û piçek xwarin avêtibe devê xwe, ji ber ku dora katjimêr 19.25 ew gihîştibû mala Xanim Waltersheim, şûna ku êvara dansê lê cîh digirt, bi trambayê, ne bi otomobîla xwe; û kincên li wê ne yên Erebên Şawî(3), ne jî yên Endelusê bûne; ew, kulîlkeke qurnefîlê ya sor di ber por re, bi gore û qondereyên sor, kazagekî yaxedirêjî ji herîrê xam yê renghingivîn û nîvkirasekî rîsînî di eynî reng de lê, ketibû hundir. Ha Katharina bi otomobîla xwe çûbe, ha bi trambayê, heye ku ji bo hinan wek hev be, lê divêt li vir bête diyarkirin ji ber ku rola vê yekê di dema proseya lêkolînê de wekî zor grîng hatibû dîtin.

## 9

Ji dema ku Katharina ketî hundir mala Xanim Waltersheim û şûnve girtina agahiyên di derheqê wê de hêsan bû çimkî ji katjimêr 19.25 û pê ve, bêyî zanibûna wê, ew ji haliyê polîs de dihat tehqîbkirin. Tevahiya êvarê, ji katjimêr 19.30 ta 22.00, dema ew li gel wî ji mala Xanim



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Waltersheim derketibû, wekî Katharina dû re bi xwe jî gotibû, ew "ji kûraniya dil û tenê li gel wî" merovê bi navê Lüding Götten reqisî bû.

## 10

Pêwîst e merov li vir çeyîkirina Peter Hach, abûkatê giştî, bi bîr wîne ji ber ku tenê bi xêra wî me hay jê heye ku, li gor kuste pista di navbera mamûrên polîs û karmendên dadgehê de, Erwin Beizmenne, Komîsarê cînayî, telofonên Woltersheim û Blum ji deqeya derketina Blum û Götten ji mala Woltersheim û şûnve xistibûne bin tehqîbê.Vê yekê bi şêweyekê cîh girtibû ku belkî layiqe ragîhandinê be: Ji bo kirina tiştekî wisa, Beizmenne telefone mamûrekî ji xwe bilindtir dikiriye û digotiye, "fîşên min yên biçûk dîsa ji bo min divên - îcar dubare."

## 11

Wisa xuya ye ku Götten ji mala Katharina telefon nekiribûye. Bi kêmasî li gor zanibûna Hach. Tiştê bêguman ev e: apartmana Katharina bi şêweyeke rêk û pêk dihat tehqîbkirin; û ji ber ku ta katjimêr 10.30'ê sibeya roja pêncşemê ne kesekî ji wir telefon kiribû, ne jî Götten ji hundir derketibû, sebir û pêkaniya tehmûlkirinê li nik Beizmenne nemabû û komeke ji heşt polîsên bi çekên giran xwe xistibûn apartmanê, ew jî bi miqayîtiyeke bêhempa, hundirê malê hatibû velokirin, lê Götten nehatibû dîtin; Kat-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

harina bi tenya xwe li mal bû, ya ku "balfireh û hema-hema dilşad xuya dikir," di mitbaxa xwe de qehwe ji qedeheke mezin vedixwar û parçeyek ji nanê spî yê bi rûn û hingiv dixwar.Yên li wir li wê ketibûn gumanê çimkî ew ne wek veciniqî û matmayî lê bêtir li ser hev, "tew belkî wek serkeftî," xuya dikir. Kirasekî hundir malê yê ji pemboyê şîn û bi çînên kulîlka egalan li wê bû, bêyî tiştekî din di bini de, û dema Komîsar Beizmenne jê ("bi hişkî," wê dû re gotibû) pirsî bû, ka Götten li ku bûye, wê gotibû, ew nedizane Ludwig kengê ji apartmanê derketiye. Ew dora katjimêr 9.30 ji xew rabûbûye û ew nedîtibûye. "Bêyî ku xêtir bixwaze?" "Erê."

## 12

Divêt li vir behsa pirseke ku bûbû sedema munaqeşeyeke germ bête kirin, pirseke ku ji haliyê Beizmenne de hatibû pirsîn, Hach jî ew dubare kiribû, dest jê berdabû, careke din dubare kiribû û dîsan dest jê berdabû. Blorna vê pirsê grîng dibîne ji ber ku, bi dîtina wî, eger ew rast hatibe pirsîn, heye ku nefreta li nik Katharina hatî holê, hestê fedîkarderketin û hêrsbûna wê ji wir bi rê ketibin. Ji ber ku Blorna û jina xwe Katharina wek keseke ji aliyê pirsên cinsî ve gellekî hesas, heta belkî pirrşermok, bi nav dikin, pêwîst e li îmkana ku Beizmenne belkî jî va pirsa germ - wî jî bi encama girra xwe, ji ber ku wî wisa texmîn dikir Götten ketiye dehfê lê bi ya wî nebû - pirsîbe bê bête niherîn. Têye gotin e Beizmenne ji Katharina, ya ku bi şêweyeke mathîştinê bêxem xwe dabû ser maseya mitbaxa xwe, pirsiye: "Ma na te?" Katharina jî ji fedîbûnê sor bû-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ye lê, wek meroveke ya xwe bi ser xe, lê vegerandiye: "Na, wekî tu dibêjî ez bi nav nakim." Merov dikare bêyî guman bibêje, eger Beizmenne rast va pirsa pirsîbe, ji wê bîstê û şûnve baweriya wî û Katharina bi hevûdin ê nema pêkan be. Lê li milê din, nebûna bihevbawerbûnê di navbera herduyan de (tevî ku îspatên li holê diyar dikin ku Beizmenne, yê ku tête gotin "weqa xirab jî niye," ji haliyê xwe de ji bo bicîhkirina baweriyeke wisa hewl daye) nikare wek îspatekê bête hesihandin ku wî rast va pirsa bêoxir kiriye. Li milê din, Hach, yê ku ji haliyê heval û nasên xwe de wek kesekî "birçiyê kirinên cinsî" tête binavkirin, bi xwe jî di dema velokirina apartmanê de li wir bûye, û ne dûr e ku ramaneke wisa bêvac bi dîtina Katharina ya zor lihavhatî re ku bi ew şêweya balkêş herdu destên xwe dabûn ser maseya mitbaxê, ketibe serê wî , û heye ku di wê katê de daxwaza dilê wî bû ku bi xwe wê pirsê bipirse, yan tew di hişên wî re derbas bûbe ku xweziya wî ew kirina ku bi şêweyeke hişk û nexweş ketibû pirsê kiribûya.

## 13

Dû re apartman bi ser û binê xwe ve hat velokirin û tiştine hatin birin, bi taybetî nivîs. Katharina dikaribû di serşokê de, bi beşdarbûna jinpolîseke bi navê Pletzer, kincên xwe li xwe ke. Li gel beşdarbûna wê jî deriyê serşokê nîvvekirî ma û ji haliyê du polîsên çekdar de siqesiq hat binçavkirin.Hîştin Katharina çenteyê xwe yê destan li gel xwe bibe, û ji ber ku ne dûr bû ew têkeve girtîgehê, rê dan ku ew tiştine ji bo êvarê grîng, tiştine paqişkirinê, herweha tiştine ji bo xwendinê, li gel xwe bibe. Pirtûkxaneya wê ji



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

çar pirtûkên evînê, sê romanên polîsî, pirtûkeke li ser jiyana Napoleon û yeke li ser jiyana Kirala Swêdê, Christina, pêk dihat. Çavkaniya hemî pirtûkên wê jî klûbeke pirtûkan bû. Li dû ku Katharina çend caran li ser hev gotina, "ji bo çi, ji bo çi, ma min çi cerîmet kiriye" hanî ser zimên, ew êdî ji haliyê jinpolîs Pletzer de bi zimanekî xweş hatibû agahdarkirin ku ploîs ji mêj ve ye li Götten digerine, yê ku dizîna bankekê hema-hema ketiye stu û ne dûr e ku tiliyên wî di bûyerine kujtinê û cerîmetên din de jî hebin.

## 14

Li dû ku Katharina Blum dora katjimêr 11.00 êdî ji mala wê derxistin û berê wê dan îfadegirtinê, di deqeya dawîn de biryar hat girtin ku destên wê nexin kelepçeyê. Beizmenne baştir dîtibû ku destên wê bêyên kelebçekirin, lê li dû gotûbêjeke kurt di navbera jinpolîs Pletzer û alîkarê wî Moeding de wî pejirandibû biryara xwe bide guhertin. Ji ber ku ew roja ya destpêka rojên karnîvalê bû hejmareke ji şêniyê xaniyê ku apartmana Katharina tê de bû neçûbûn kar, yan hîn xwe amade dikirin da ku biçin ew meş û temaşeyên sal bi sal di destpêka karnîvalê de di bin navê Saturn(4) de cîh digirin. Sîh-çel kes ji şêniyê xaniyê dehqatîn bi kincên hundir malê di salona jêrîn de gihîştibûn hev, û Schönner, wênekêşê ROJNAME'yê, ew jî bi sê-çar gavan ji deriyê asansorê wê de li ser lingan bû dema Katharina Blum, ki haliyekî wê Beizmenne, li yê din Moeding, di navbera polîsên çekdar de ji asansorê hat der. Wêneyên wê car li dû carê, ji pêş ve, ji paş ve, ji herdu ha-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

liyan ve hatin kişandin, û li dawiyê, dema wê fedok û matınayî hewl da ku rûyê xwe veşêre û di destên wê de çenteyê destan, cizdanê hûrmûrên şexsî, tûrikekî naylon, ku tê de pirtûk û tiştên ji bo nivîsandinê pêwîst hebûn, hemî li hevûdin geriyan, car din wêneyên wê di vê rewşê de û bi porê hinc û rûyekî xeyidî hatin kişandin.

## 15

Nîvsaetekê şûnve, li dû ku ew haydare mafên wê kirin û fersend danê da biçe xwe piçekî çêbike, bi beşdarbûna Beizmenne, Moeding, Xanim Pletzer, herweha abûkatê giştî Dr.Korten û Hach îfadegirtinê dest pê kir:

"Navê min yê zewacê Katharina Brettloh e û yê malbata bavê min Blum e. Ez di roja duyem ya adara 1947'an de li Gemmelsbroich, herêma Kuir, ji day bûm. Bavê min, Peter Blum, karkerekî derhanîna kevirên xaniyan bû. Ez şeş salîn bûm dema ew bi umrê sîh û heft salîn bi encama brîna cîgera xwe, brîna ku di dema şerê cîhanî de hatibû holê, mir. Li dû rawestandina şerê cîhanî bavê min dîsa li karê derhanîna kevir û nihîtan vegeriya bû û wisa dihat texmînkirin ku toza di karê wî de ew bi nexweşiyeke cîgerê jî xistibû. Li dû mirina wî diya min nikaribû bi hêsanî diravên teqawîta wî bi dest xe, ji ber ku Dayîreya Sosyal û Dezgeha Teqawîtê ya Karkerên binzemîn di derheqê pirsa diravên teqawîtiya wî de li hev nedikirin.Dema bavê min hîn sax bû ew pirr nexweş diket û pereyên karê wî kêm dibûn. Loma, diya min neçar dibû biçe malên xelkê paqiş bike û divabû min jî, tevî ku ez hîn zarokeke biçûk bûm, karê malê bikira. Li xwendegehê ez rastî dijwartiyan neha-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

tim, li gel ku min ne tenê li mal, lê herweha di malên cîranan û yên gundiyên din de kar dikir; min di warê çêkirina xwarinê, xwarin û vexwarina tête parastin û serjêkirina lawiran de alîkariya wan dikir. Ez herweha bi kirina karên hundirê malan yên din û bi kirina paleyê jî mijûl dibûm. Li dû ku min di sala 1961'ê de xwendegeh li cîh hîşt, diya min ya bav-vaniyê, Xanim Else Woltersheim ji Kuir, ji min re karekî şagirtiyê li Kuir dît, li nik qesabê bi navê Gerberts. Ji sala 1962 ta 1965 ez bi alîkarî û piştgiriya aborî ya Xanim Woltersheim li Kuir çûm xwendegeheke birêvebirina kar û barên malan, li kuderê Xanim Woltersheim bi xwe mamosta bû, xwendegeha ku min bi radeyên bilind bi seri kir, kir. Ji sala 1966 ta 1967 ez li Oftersbroich, ji gundê me ne dûr, di hêlîna zarokan de, ya ku bi şirketa Koeschler ve girêdayî bû, malxe bûm û li dû vî karî di mala Dr.Klutchen de, yê ku li Oftersbroich bijîşkî dikir, karekî alîkariya hundirê malê bi dest min ket, lê ez tenê salekê di wî karî de mam ji ber ku tixtor hêdî-hêdî dest pê kir destan bavêje min û va yeka jî li hesabê jina wî nedihat. Vê destavêtinê ez gellekî aciz dikirim. Di sala 1968'an de, dema ez çend hefteyan bêkar bûm û diçûm alîkariya diya xwe, yan hindek caran di temaşe û civînên ku Koma Gemmelsbroich ya Dahol û Borizanê bi rêdixistin de wek garson diketim kar, brayê min yê mezin, Kurt, ez bi Wilhelm Brettloh, karkerekî karxaneyên çêkirina cêw, naskirin dam, li gel kîjanî ez li dû çend heyvan zewicîm. Em li Gemmelsbroich bi cîh bûn, li kuderê min yekcaran, dema gerrok li herêmê pirr dibûn, di xwaringeha Kloog de, wek alîkara di mitbaxê de yan wek meyfroş kar dikir. Li dû derbasbûna şeş mehan



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ez pê hesiyam ku di dilê min de nefreteke bêyî hempa li hember mêrê min hatiye holê. Min dil niye li ser vê yekê bi firehî biaxifim. Min mêrê xwe li şûn hîşt û çûm bajêr. Telaqa me hat birrîn û ji ber ku min ew li şûn hîştibû gunehbariya hevberdanê ket stuyê min. Ji wê demê û pê ve min careke din navê malbata bavê xwe bi kar hanî. Li bajêr, ez berê li mala Xanim Woltersheim mam ta ku min karekî malxevaniyê di mala Hesabdar Dr. Fehnern de dît, li kuderê şûna razanê jî bi dest min ket. Bi alîkariya Dr. Fehnern ez beşdarê kûrsên xwendegeheke êvarê ya meslekan bûm û şehadeya fermî ya malxevaniyê bi dext xist. Ew meroveki qenc û comerd bû; û li dû kutakirina xwendegehê jî min karê xwe li cem wî domand. Di dawiya 1969'an de Dr. Fehnern ji bo kêmdayîna pereyên bacê ji haliyê şirketine mezin de ku wî ji bo wan kar dikir hat girtin. Ber wî bibin, wî meaşê sê mehan di nav zerfekê de da min û xwazt ku ez karê xwe bidomînim; dirêj nake ew ê vegere, wî got. Min ji bo heyvekê karê xwe domand û xizmete karkerên wî kir, yên ku di bin serdariya karmendên dayîreya bacê de dixebitîn; min herweha mala wî paqiş dikir, li baxçeyê wî diniherî û kincên wî dişûştin. Min kincên pak û ûtîkirî ji Birêz Fehnern re dibirin girtîgehê, herweha xwarin, bi taybetî goşthevîrkê Ardenne(5) yê ku min xwe li nik qesabê Kuir, Gerbers, fêrî çêkirina wî kiribû. Dû re ofîsa Dr. Fehnern girtin û dest dan ser mala wî; divabû ez ji odeya xwe derkevim. Dibêjine hukmatê îspatên hebûna tiliyên Dr. Fehnern di zexeliyên di derheqê kêmdayîna bacê de dîtine, loma jî ew şandin girtîgeha gelemper. Li wir jî ez diçûm dîtina wî, û min xwazt ez diravên du mehan lê vegerînim lê min kir nekir, wî nepeji-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

rand. Di nav demeke pirr kurt de min karek li mala Dr. Blorna û jina wî dît, yên ku min bi rêya Dr. Fehnern dinasîn.

"Mala Blornayan li cîhekî nû hatî şênkirin, li başûrê bajêr e. Tevî ku odeyek ji bo min hat dayîn jî, min ew negirt, ji ber ku min dixwazt êdî bi serê xwe bim û ji haliyê birêvebirina karê xwe de bêtir serbest bim. Jin û mêr Blorna di derheqê min de gellekî rindîxwaz bûn. Xanim Blorna - di ofîsa şirketeke mezin ya lêkirina xaniyan de kar dike - di kirîna apartmana min de, yeke ji yên di bin navê "Koşkên Xweş li Kêleka Çêm" de li nûbeşekî bajêr, li başûrê mala wan, ketibûn firotinê alîkariya min kir. Ji ber ku ew wek dezgehvaneke şirketê di kar de bû û mêrê wê, Dr. Blorna, abûkatê eynî şirketê bû, herdu jî di derheqê projeyên van apartmanan de baş haydar bûn. Li gel Dr. Blorna min hesabê xwe û dîtina pereyan, fayiz û teqsîtên wan kir, ji bo kirîna apartmaneke bi du odeyan, tev mitbax û serşokê, li qatê 8'em; û ji ber ku ta wê demê min 7000 mark dabûn hev û Dr. û Xanim Blorna li nik bankê ji bo deyinkirina 30 000 mark bûn kefîlên min, ji dest hat ku ez di destpêka 1970'yî de têkevim apartmana xwe. Di destpêkê de divabû ez heyvê bi kêmasî 1100 mark bidim bankê, lê ji ber ku Dr.û Xanim Blorna ji bo hewcedariyên min pere ji min nedibirrîn û Xanim Blorna hîn bi ser ve xwarin û vexwarin didan min da ku bi xwe re bibim mal, min dikaribû bêtir dirav bidim ser hev û deynê xwe zûtir bidim.

"Ev bûn çar sal malxevaniya mala Blorna bi tevahî di dest min de ye. Karê min katjimêr heftê sibeyê dest pê dike û dora çar û nîv li dû nîvro kuta dibe, bi serikirina ka-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

rê hundirê malê, şûştinê, kirîna tiştan û çêkirina şîvê. Di navbera çar û nîv û pênc û nîv de ez hundirê apartmana xwe didim hev; dû re, pirraniya rojan, ez saet û nîvekê ta du saetên din karê mala kal û pîr Hiepertz dikim. Xwediyên herdu malan jî ji bo karkirina di rojên şemê û yekşemê de pereyan bêtir didin min. Di kata xwe ya vala de ez carine li nik şirketa Klof ya çêkirina xwarina dawetan û temaşeyan dixebitim; geh jî ez bi navê xwe, yan yekcaran bi navê şirketa Klof, karekî qibale, wekî pêşkêşkirina alîkariya di dawetan, civînan, temaşeyên zewacê, civînên dansê û kombûnên din de digirim. Di demên wisa de karê min çêkirina tevdêran, parvekirina karan û dayîna pereyên karkeran e, lê carine jî ez xwarinê çêdikim, yan xwarin û vexwarinê li beşdaran belav dikim. Meha min tê 1800 ta 2300 mark, pereyên bacê tê de. Di defterên dayîreya bacê de ez xwediya karê xwe me. Diravên bacê û yên sîgortayê ez bi xwe didim. Hemî kaxezên bi pirsa bacê û yên wek wê ve girêdanî ji haliyê ofîsa Blorna de bêyî pere ji min re têyên dagirtin. Ji destpêka 1972'an de ez xwediya otomobîleke Volkswagen im, ji modêla 1968'an, ya ku Werner Klomer, aşpêjekî şirketa Kloft arzan firotibû min. Çûyîna karê li şûnên cuda bêyî otomobîl heku diçû dijwartir dibû. Bi otomobîlê min dikaribû êdî di temaşe û civînên li otêlên dûr cîh digirtinî de jî kar bikira."

## 16

Ji katjimêr 11.30 ta 12.30 û li dû rawestandina saetekê ji katjimêr 13.30 ta 17.45 ajot heta ku ev beşê îfadegirtinê bi seri bû. Di dema rawestandina navroyê de Blum nepe-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

jirand fîncana qehweyê û etûrê penêr ji dest mamûrên polîs bigire, û heta bi Xanim Pletzera ku diyar bû rindiya wê dixwazt, û Moedling, alîkarê Beizmenne, bin, wan jî nikaribûn biryara wê bidin guhertin. Xuya bû -wekî Hach da zanîn- wê nedikaribû têkiliyên fermî ji yên şexsî veqetîne, nedikaribû girtina vê îfadeyê wek tiştekî pêwîst bihesibîne. Dema Beizmenne'yê bi meraq nanê xwe dixwarî û qehweya xwe vedixwarî, yaxevekirî û kiravatsist ne tenê wek şexsê bavekî xuya dikir lê herweha dest pê kir wek bavekî biaxife, Katharina Blum bi îsrar daxwaz kir ku bila wê bibin hucreya nezaretê. Herdu mamûrên polîs yên li ber deriyê hucreyê di nobetê de bûn kirin-nekirin ku hindek qehwe û etûrine bidinê lê wê bi eynatî seri hejand û ji şûna xwe neliviya. Wê kişandina cixareya xwe domand û bi şêweyeke qermiçandina poz û tehilkirina rû nefret û qerfa xwe di derheqê çîlikên vereşê de, yên ku li ser û dorhaliyên kursiya tiwalêtê xewan bûn, diyar kirin. Dû re, li dû ku herdu polîsên ciwan û Xanim Pletzer xwaztin îlleh nebza wê bigirin, wê rê da jinpolîsê û li dû ku nebza wê di cîh de xuya kir wê pejirand ku jê re perçeyek gato û fîncanek Çay ji çayxaneya nêzikî wir bête wesandin, lê bi şertê ku ew bi xwe nerxê wan bide. Yekî ji polîsên ciwan, yê ku di destpêka rojê de li pêş deriyê serşoka wê pabû, dema wê kincên xwe li xwe dikirin, xwazt pereyan "ji bo xatirê wê" bide lê wê daxwaza wî paşve vegerand. Gotina herdu polîsên ciwan û ya jinpolîsê li ser Katharina Blum, li gor ev kata wan li gel wê derbas kirî, ev bû: "Ji henekan fêhm nake."



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Îfadegirtina di derheqê pirsên şexsî de katjimêr 13.30 dest pê kir û ta 17.45 domand. Beizmenne nedixwazt di vî warî de weqa dirêj bike, lê ji ber ku Blum dixwazt îlleh bi firehî li ser tiştan biaxife, û ev daxwaza wê ji haliyê herdu abûkatên giştî de hat pejirandin, ew neçar ma, berê bêdil, û dû re dema hindek agahên hatinî dayîn ji bo wî grîng û eleqedar hatin dîtin, razî bibe. Katjimêr 17.45 hat pirsîn, gelo îfadegirtin bila bête domandin, yan na; gelo Blum bila bête berdan, lê bila li hucreya nezaretê were vegerandin? Ber van pirsan, di katjimêr 17.00 de, bi Blum dabûn pejirandin ku hindek çay vexwe û piçek nanê li gel goştê hêta berazan bixwe. Wê herweha berdewamkirina îfadegirtinê pejirandibû çimkî Beizmenne gotibû, ew ê li dû kutabûna îfadegrtinê bête berdan. Li vir pirsa peywendiyên di navbera wê û Xanim Woltersheim de hatibû holê. Ew diya bav-vaniya wê ye, got Katharina Blum, tum haydara wê bû, ji dûr ve diya Woltersheim û ya wê ji haliyê bavan de digihîştin hev, û bi hatina wê ya bajêr re Xanim Woltersheim xwe di cîh de gîhandibû wê.

"Di 20'ê sîbatê de ez ji bo çûna civîneke dansê hatim vexwendin, ya ku divabû di 21'ê mehê de cîh bigirta, lê ji ber ku Xanim Woltersheim wê rojê, roja destpêka karnîvalê divabû biçûya kar, civîna dansê rojekê paşve hat xistin. Di nav çar salan de ev yekemcar bû ku ez diçûm dansê. Na, ya rast ew e, ku di demên cuda de du-sê, heye ku çar, caran ez li mala Blorna, li dû kutakirina kar, li gel mêvanine rabûme dansêye. Di dawiya êvaran de, li dû ku min kar diqedand, firax duşiştin û qehwe belav dikir û li



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dû ku Dr. Blorna karê belavkirina vexwarinê ji bo mêvanan digirt ser xwe, li eywanê bang min dikirin û li wir ez yan li gel Dr. Blorna bi xwe, yan tev mêvanan, mîrzayên ji zanîngehan û şûnên wek dezgehên aborî û rêzaniyê radibûm dîlanê. Li dû kurtedemekê min nema dil kir li wir bireqisim û dirêj nekir min êdî rabûna dîlanê nepejirand çimkî mîrzayan gellek caran pirr vedixwarin û li wir jî dest- û şoravêtinê dest pê kir. Ez dikarim bibêjim, li dû kirîna otomobîla xwe, min nema êdî pejirand di van êvaran de bi kesekî re rabim dansê. Berê, dema min otomobîl nebû, divabû mêvanekî ez li ser riya xwe bigîhandama mal. Tev ev mîrzayê han jî (destê xwe ber bi Hach dirêj kir, yê ku rast jî di rûyê xwe de sor bû) ez çend caran reqisîme." Eger Hach jî hindek caran dest, yan şor, avêtibûnê nehat pirsîn.

## 18

Sedema dirêjkirina kata îfadegirtinê ew bû ku Katharina Blum weqa hûr li nivîsandina gotinên wê diniherî, bi şêweyeke wisa ceddî ku merov mat dima. Wê bala xwe dida hemî peyvên dihatinî nivîsandin û daxwaz dikir ku bila îfadeya wê hevok bi hevok bi dengekî bilind ji wê re bête xwendin. Wek nimûne, gotinên mîna "dest- û şoravêtin" ku li jor behsa wan bû bû û di nivîsandinê de wek ku ji wê hej kiribin, yanê wek "evîndarî û dilgermiya mîrzayan" hatibûn nivîsandin, ji haliyê Katharina Blum de bi carekê ve nedihatin pejirandin. Li ser tiştên wisa munaqeşeyeke dûr û dirêj di navbera wê û herdu abûkatên giştî de, herweha di navbera wê û Beizmenne de, dest pê dikir, ji ber



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ku, wekî ku Katharina li ser van gotinan diyar kiribû, "evîndarî û dilgermî" heye ku wek hesteke hevpar bihatana fêhmkirin, lê "dest- û şor avêtin" yekhalî bûn, û ev bû xwebêja mebesta wê, ne "evîndarî û dilgermî." Dema mamûran gotibûnê ku tiştên wisa bi rastî jî ne weqa grîng bûn û eger munaqeşeyên li ser van tiştan kata îfadegirtinê dirêj bikirana sûc ê yê wê bûya, wê bersîv dabû, ku ew ê îfadeyê îmze neke, eger li şûna "dest- û şoravêtin" "evîn û dilgermî" bihatana nivîsandin. Wê dabû zanîn ku ji bo wê ferqa di navbera herdu gotinan de gellekî mezin bû û yek ji sedemên berdana mêrê wê bû, ji ber ku li cem wî jî evîn û dilgermî tune bû, ya wî jî bêtir yekhalî û dedstavêtin bû.

Qirecireke din li ser peyva "dilbirehim" derket, gotineke di derheqê jin û mêr Blorna de. Di nivîsara îfadeyê de "ji min re rind bûn" hatibû nivîsandin, lê Blum îlleh nivîsandina "dilbirehim bûn" xwazt. Dema li şûna wan peyvan "qenc bûn" hat nivîsandin, ji ber ku peyva "dilbirehim" di rojên îroj de nayê bikarhanîn, ew gellekî xeyidî û got, ku qencitî tiştek e, dilbirehimbûn tiştekî din.

## 19

Di navberê de îfadeya cîranên Katharina Blum hat girtin ku bi pirranî tiştek li ser wê nedizanibûn, yan dikaribûn di derheqê wê de tenê çend tiştan wînin ser zimên. Ew di asansorê de çend caran rastî hev hatibûn, dembaşî li hev kiribûn, hinan dizanibûn Volkswagena sor ya wê bû, hinan ew wek sekretêra kesekî şûnbihind texmîn kiribûn, hinên din weke berpirsiyara mixazeyeke mezin; wek keseke herdem paqij û bi kincên çak, lê piçekî sar. Ji danişţvanên



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

pênc apartmanên qatê heştem tenê duduyan dikaribûn agahiyên hebkî nêziktir li ser Katharina, ya ku herweha li wî qatî dima, bidin. Yek ji wan, Xanim Schmill, xwediya dukaneke berberiyê bû; yê din, Ruhwêdel, karkerekî şirketa elektirîgê, ku nuha di teqawîtê de bû. Tiştê mathîştinê ew bû ku herduyan jî di îfadeyên xwe de gotibûn, ku yekcaran mêvanekî Katharina, yan tev wê, yan bi tenê dihatibûye. Xanim Schmill gotibû, mêvan bi şêweyeke berdewamîn dihat, her du-sê hefteyan carê, yekî ku umrê wî dora çel salîn bû û wekî kesekî "ji cîhên bilind xuya dikir." Birêz Ruhwêdel, li milê din, ew wek kesekî xort dabû nasîn, yê ku geh bi serê xwe, geh jî li gel Xanim Blum diçûye hundir apartmanê, û ev jî heşt, yan neh, caran di nav du salên borîn de, "û van caran ew in yên ku min bi çavên xwe dîtine; li ser carên min nedîtinî, bêguman ez nikarim tiştekî bibêjim."

Dema li dû esir ji Katharina hat xwaztin ku xuya bike ka bersîva wê di derheqê pirsa mêvanan de çi bû, ber çi bersîv bête dayîn, Hach bi xwe hewl da ji wê re dayîna bersîvê hêsan bike û wekî pêşniyariyekê got, ku reng e van mêvanan ew mîrzayan bûn ku ew carine ji mala Blorna digîhandin mala wê. Katharina ya ku ji şerm û hêrsbûnê sor bû bû bi hawayekî tirş û tahl pirsî, eger hatina mêrmêvanan li dij qanûnên welêt bûn; û ji ber ku wê pêşniyariya hach ya ku wek deriyekî derketina ji dijwartiya bersîva vê pirsê hatibû pêşkêşkirin li erdê hîşt, yan wek bersîvekê nepejirand, Hach jî piçekî tirş û tahl bû û gote wê, pêwîst e ew tê bigihê ku va lêkolîna xwe bi pirseke zor grîng ve girêdide, pirsa Ludwig Götten, ku merseleyeke dûr û dirêj e û ev bûye bêtir ji salekê ku polîs û dayireya abûkatiya



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

giştî pê ve mijûl in; ji lewre divabû wê bida zanîn, eger va mêvanê wê, hebûna kîjanî ew înkar nakêye, herdem eynî kes bû. Û li vir Beizmenne bi hişkî şor birrî û got: "ev xuya dike ku ev du sal in tu Götten dinasî."

Katharina li vê gotinê mat ma û nema dizanibû çi bibêje; tenê li Beizmenne niherî û serê xwe hejand, û dema bi şêweyeke ecêb sar got, "na, na, min do ew nas kir," gotina wê wek bersîveke di cîh de nehat guhan. Dema êdî li wir jê hat xwaztin ku mêvên bi nav bike, wê, "te digot qey bizdoyîn bû," serê xwe hejand û nexwazt bersîvê bide. Birêz Beizmenne car din dest bi lîztina rola xwe ya bavîn kir û hewl da bi wê bide bawerkirin ku tiştek pê ve tune eger hevalekî wê hebe, kesekî ku (li vir wî şaştiyeke psîkolojîke mezin kir) li şûna destavêtinê xwedan hestên evîndarî û dilgermiyê be; ew jineke ji mêr berdayî ye û şertên jineke zewicî li ser wê nayên hesibandin, û ne şerm e (dîsa şaştiyeke mezin) heke ji evîndarî û dilgermiyê hin çeyiyên wek dirav û diyariyan jî hatibin der. Bi kirina vê gotinê re Katharina Blum bû zinar, nema xwazt bersîva pirsan bide û daxwaz kir, wê îlleh bibin hucreya girtinê, yan mal. Hemî mat man dema Beizmenne hêdîkan û westa (di navberê de katjimêr bûbû 20.40) gote mamûrekî ku bila wê bi mal gihîne. Lê wî, dema ku Katharina êdî rabûbû, çente, cizdan û tûrikê naylon didan hev, ji nişkan ve û bi hişkî ji wê pirsî: "ev Ludwigê te yê dilovan û dilgerm çawa şeva borîn ji xênî çû der? Hemî deriyên têketin û derketinê di bin çavan de bûn. Te, erê te, rêyek dizanibû û ew raber wî kir, û ez ê xwe bigihînim bin vî tiştî. Oxir be."



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Moeding, alîkarê Beizmenne, yê ku Katharina gîhand mal, dû re da zanîn ku ew di derheqê rewşa wê de pirr mijûl bûbû û tirsiyabû ew bêtarekê bi ser xwe de wîne; tiştekî wê li ser hev nema bû, lê li gel wê jî ew mat mabû ku hîm pêkaniya kirina henekan li nik wê mabû, yan di vê rewşê de hatibû holê. Wî got, dema wî di nav bajêr de diajot, wî jê re bi henek gotiye, eger ew ê ne baş bûya herduyan bikaribûna nuha, bêyî ku ji hev û din şerm bikin û bêyî çi mebest û armanc, biçûna şûneke vexwarin û dansê. Wê jî li wî vegerandiye ku tiştekî wisa dê ne tiştekî xirab bûya, heye ku tew baş bûya; û dû re, dema wî li pêş deriyê xaniyê apartmana wê jê pirsiye, eger rê dide ew wê bigihîne jor, wê bi qerf lê vegerandiye, "na, bi tenê baştir e; wek hûn dizanin, mêrmêvanên min berê pirr in, lê dîsa jî spas."

Tevahiya wê êvarê û ta nîvê şevê Moeding hewl da Beizmenne wîne ser rê ku ji bo Katharima Blum baştir e ew di hucreya girtinê de be, da ku nikaribe çi zirarê bigihîne xwe, û dema Beizmenne ji wî pirsî, eger dilê wî ketibe wê, wî besîv da, ku na, lê ew wê wek meroveke baş dibîne û temenên herduyan wek hev in, û jê bêtir, ew bi teoriya Beizmenne ku tiliyên wê di dek û dolabên mezin de hene ne bawer e.

Tiştê ku wî ji Beizmenne re negotibû, lê dû re bi riya Xanim Woltersheim gihîştibû Blorna, dayîna du şîretan bû ji bo Katharina, ya ku hîştibû ew wê bigihîne deriyê asansorê, şîretên tehlûke. Wî li ber deriyê asansorê gotibû Katharina: "destê xwe mavêje telefonê û sibe rûpelên roj-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nameyekê vemeke." Ne zelal bû eger mebesta wî ROJNAME bû, yan hemî rojname.

## 21

Di eynî rojê de (pêncşem, 21.2.74), katjimêr 3.30 li dû nîvro cara yekem bû ku Blorna li şûna derbaskirina rojên îznê xwe ji bo şemitandina ser befirê amade dikir. Ji vê deqeyê û şûnve van rojên îznê ku wî weqa bi kêfxweşî xwe dabû benda wan hil û heram bûn. Çiqa geş bû seyrana şeva borîn, dema ew û jina xwe Trude li dû gihîştina xwe bi dirêjiya du saetan li ser befirê meşiyan, û vexwarina ew meya xweş li ber koziya germ û ew xewa şêrîn di odeya pencerevekirî de; û di sibeya roja din de herdu, li dû ku bi keyfa xwe û hêdî-hêdî fravîna xwe xwarin, kincên germ li wan, ji xwe re du-sê saetan li ser sekuyê bi dilşadî daniştin, û di ew deqeya ku hema hindik mabû ew bi rê keve de ew kesê RONAME'yê, bêyî danzanîn, xwe gîhand wir û dest pê kir pirsên di derheqê Katharina de jê bipirse. Bi dîtina wî, gelo ji dest wê dihat ku bi curmekê rabe? "Ev çi gotin e?" Blorna lê vegerand, " ez abûkat im û dizanim ji dest kê dikare bête der ku bi curmekê rabe. Curma çi? Katharina? Ne mumkin e, ev çi gotin e? Li ser çi hîmî tu vê gotinê dikiye?"

Dema ew hat haydarkirin ku şeva çûyî kesekî ku polîs ji mêj ve li dû ye li mala wê maye û ji katjimêr 11'ê vê sibeyê de îfadeya wê ji haliyê polîs de siqesiq têye girtine, yekemramana di bala wî de ew bû ku di cîh de biçe alîkariya wê, lê ew kesê ji ROJNAME'yê (gelo li wir jî bêvac xuya dikir, yan Blorna dû re bi bêvaciya wî hesiya?) gote wî ku



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

rewşa wê weqa xirab jî niye; û ji Blorna pirsî eger nikaribe du-sê tiştan di derheqê xusetê wê de bibêje. Dema Blorna xwe ragirt û çi agahî nedan, wî kesî gotê ku negotina tiştekî nêşaneke xirab e û dikare wê xwebêjê bide ku Blum xwediya xusetekî xirab e; û va pirsa wî ji bo "gotareke rûpela yekem" têye pirsîne. Li vir Blornayê tiji hêrs û kerb bûyî got: "Katharina meroveke zor baqil û bi tevdêr e, û dilhonik e" û ew bi dayîna va bersîva xwe nerihet bû çimkî wê xwebêja mebesta wî û tiştê ku divabû ew bibêje neda. Tecrûbeyên wî li gel rojnameyan, hele tew ROJNAME li haliyekî, nebûn. Dema ew kesa di Porscheya(6) xwe de ji ber çavan wenda bû, Blorna solên şemitandina li ser berfê ji lingên xwe danîn û tê gihîşt ku çi xweşî di îzna wî de nema. Ew rabû jor û dît Trude betanî li xwe gerandiye û li ser balkonê veketiye, xwe daye ber berberojkê. Wî ew jî agahdar kir. "Hele telefon ke," wê gotê, û wî hewl da telefon bike, sê caran, çaran, pêncan, lê her gotina "jimara tu dixwazî bersîvê nadêye" dihat bihîstin. Dora katjimêr yanzdeh bi şev wî careke din hewl da lê di apartmana Katharina de dîsa destikê telefonê ranebû. Wê şevê wî pirr vexwar û baş raneket.

## 22

Di sibeya roja îniyê de, dema ew tirş û tahl, westiyayî, nêzikî katjimêr 9.30 gihîşt maseya firavînê Trude ROJNAME direêjê kir. Katharina di rûpela yekem de bû. Wêneyeke weqa mezin û sernivîseke bi tîpên reş û qalin:

EVÎNDARA DIZ KATHARINA BLUM AGAHIYAN



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## LI SER MÊRMÊVANAN NADE

Ew eşqiyayê ku sal û nîveke polîs li dû ye, Ludwig Götten, dikaribû do hatibûya girtin, eger evîndara wî Katharina Blum, karkereke hundir malan, hemî şopên wî nedabûna wendakirin û reva wî nixamtî nehîştibûya. Navenda polîs wisa bawer e ku tiliyên vê Blumê ji mêj ve di dek û dolaban de hene (Bêtir di rûpela dawîn de, di bin sernivîs MÊRMÊVAN de ).

Di rûpela dawîn de wî xwend çawa ROJNAME'yê gotina wî ku Katharina meroveke pirr baqil û bi tevdêr e, û dilhonik e kiriye "weke qaqê sar û pirr xasûk e" û gotina wî ya ku bi gelemperî di derheqê cerîmetê de hatibû kirin bûbû "kirina curmekê herdem ji dest wê tê." Rûpela dawîn wisa didomand:

Keşeyê Gemmelbroich da zanîn, "ez her kirinê ji wê bawer dikim. Bavê wê bi dizî komonîst bû û diya wê, ya ku dilê min pê şewitîbû û min karek dabûyê, meya kilîseyê ku me ji bo armancên olî bi kar dihanî didizî û di enbara kinc û tişt-miştên kilîseyê de tev evîndarê xwe kirinên fahiş dikirin"

Ji du salan û vir de mêrmêvanên Blum bi şêweyeke dayimî hebûne. Gelo mala wê wek navendeke dek û dolabên li dij dewletê dihat bikarhanîn, wek şûneke serek ya eşqiyan, yan heye ku wek quncikekî veşartina çekan? Çawa karkereke hundir malan ku temenê xwe tenê bîst û heft sal in bû xwediya xanîyekî ku li gor texmînan nerxê xwe 110 000 mark dike? Gelo beşekî ji pereyên ji bankê hatibûn dizîn bû para wê jî? Polîs lêkolîna xwe didomînêye. Dayîreya Abûkatiya Giştî bêyî rawestandin li ser vê mer-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

seleyê di kar de ye. WEK HERDEM LI KU TIŞTEK CÎH BIGIRE ROJNMAME LI WIR E. Ser û binê agahdariyên li ser vê merseleyê di hejmara dawiya hefteyê de, sibe, bixwênin.

Li dû nîvro Blorna zincîra wan bûyeran xelek bi xelek hanî bîra xwe:

10.25: telefon ji Lüdingê li hev şaş bûyî, yê ku bi îsrar vegera min dixwaze da ku biçim alîkariya Alois yê ku herweha li hav şaş bûye. Hişên Alois bi tevahî ji hev belav bûne, dibêje Lüding (min bi xwe ew çi caran di rewşeke wisa de nedîtiye; loma baweriya min pirr pê nayê) û didomîne ku Alois nuha li Bad Bedelig di konferenseke bazirganên xiristiyan de beşdar e û divêt li wir axiftineke dirêj pêşkêş bike û civînê bi rê ve bibe.

10.40: Katharina telefon dike û dipirse, eger min rast ew gotina di ROJNAME'yê de kiriye. Dilşad im ku min dikaribû pê bidin fêhmkirin, min çi gotibû û ROJNAME'yê çi nivîsandibû; û ger ne şaş bim, wê jî tiştekî bi vê xwebêjê got: "ez gotina te bawer dikim, bawer dikim; ez êdî dizanim van bêbavan çawa kar dikin. Îroj beyanî çûne li serê diya min ya nexwaş jî bûne bela ye, herweha li serê Brettloh û hinên din." Dema min pirsî, ew nuha li ku ye, wê got, "li cem Else û divêt a nuha careke din biçim îfadedayînê."

11.00: telefon ji Alois; cara yekem bû, û ev 20 sal in ez wî dinasim, min ew rast wekî ketibe hev û bi tirs dibihîst. Dixwazt ez bêderengî vegerim û ji bo pirseke gellekî hesas bibim abûkatê wî. Divabû ew di cîh de biçûya xwendina gotara xwe, dû re dihat kata xwarina li gel bazirganan, li pê wê birêvebirina civînê û êvarê jî ew ê di civîneke



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

neformel de beşdar bibûya, lê dê bikaribûya di navbera 7.30 û 9.30 de xwe bigîhanda mala me, ber beşdarbûna di civîna neformel de.

11.30: Trude jî di wê baweriyê de ye ku em di cîh de vegerin û biçin alîkariya Katharina. Ji kenê bi qerf yê li ser lêvên wê ez dizanim ku teoriyek di derheqê gelşa Alois de di hişên wê de gihiştiye hev (Bêguman di cîh de ye jî, wek herdem).

12.15: Bilêtên vegerê hatin kirîn, çente hatin dagirtin, diravên otêlê hatin dayîn. Li dû îzna ku 40 saetên xwe bûbûn-nebûbûn berê me di taksiyê de li I.bû. Di navbera katjimêr 14.00 û 15.00 de em li balafirgehê li benda rabûna mijê bûn. Axiftineke dirêj li gel Trude li ser Katharina ya ku Trude baş dizane li cem min pirr giran e. Me herweha hanî ser zimên, çawa me Katharina hêvot ku bila ne weqa hest-tenik be, bila ew zarotiya bêşahî û ew zewaca bêtalih ji bîr bike. Me bi bîr hanî, çawa me hewl da nefsbilindiya wê di derheqê pirsên bi diravan ve grêdayî piçekî nizim bikin û diravine xwe bi fayîzeke ji ya bankê kêmtir bi deyn bidinê. Gotina ku dayîna fayîza 9% ji bo me li şûna 14% ji bo bankê dê çi zirarê negihîne me lê dê ji bo wê gellekî bi sûd be jî pêşniyariya me bi wê neda pejirandin. Çiqa çeyîyên Katharina li ser me hebûn! Çer ku wê, bi xusetê xwe yê bêdeng û bi zimanxweşî û tevdêrzanî, îdarekirina karê hundirê mala me girt ser xwe, ne tenê mesrefê mala me daket, lê herweha ji dest me herduyan hat ku em xwe bi tevahî bidin ber karên xwe; û tiştekî wisa bi pereyan nikare bête kirîn. Wê em ji tevliheviya pênc salên horîn ku dibû sedema ewarebûna karên me azad kirin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Dora 16.30, ji ber nexuyabûna kata rabûna mijê, me biryara çûna bi trênê girt. Ez bi şîreta Trude dikim û telefone Alois nakim. Em bi taksiyê diçin rawestekê û xwe digihînin trêna 17.45'an ya beri li Frankfurt. Rêwitiyeke gellekî qels - serêşî, balmijûltî. Heta bi Trude be, ew jî bi şêweyeke ceddî bi tirs e. Rewş li pêş çavên wê reş xuya dike. Mest û hilak em li Mûnşin tew trênê jî diguherin û di yeke din de vagoneke razanê dibînin. Em herdu jî dizanin teşqeleyên li gel Katharina û di derheqê wê de li pêş in; herweha gelşên li gel Lüding û Sträubleder.

## 23

Di sibeya roja şemê de, bi gihîştina rawesteka bajarê di şahiya temaşeyên karnîvalê de re, ew mest û bêkeyf ji vagonê hîn daketibûn-daneketibûn, ROJNAME'yê xwe raber wan kir, û careke din Katharina di rûpela yekem de, îcar li ser nêrdewanên navenda polîs li kêleka mamûrekî polîs'î bi kincên medenî. Sernivîs:

BÛKA KESÊ MUCRIM DEVGIRTÎ DIMÎNE! ŞÛNA GOTTEN NE DIYAR E! POLÎS DI AMEDBÛNEKE BERFIREH DE YE!

Trude ew kirî û deng bi herduyan neket ta ku taksiyê ew gîhandin pêş deriyê wan. Dema wî pereyên şofêr didanê û Trude'yê êdî xwe gîhandibû dêrî, ew vedikir, şofêr tiliyeke xwe ber bi ROJNAME'yê direj kir û got: "Tu jî tê de yî, min tu di cîh de nas kirî. Ma tu ne xwedîkar û abûkatê vê qehpikê yî?" Blorna ji hewcedariyê bêtir baxşîş dayê û şofêrê ku kenê li ser lêvan wek dengê wî bi qerf xuya nedikir çente û tiştên şemitandina ser berfê jê re gîhandin eywanê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

û bi zimanekî xweş xatir xwazt.

Trude qehwe dabû ser û dest û serçavên xwe di serşokê de dişûştin. ROJNAME li ser maseya salonê bû, herweha du telegram, yek ji Lüding, ya din ji Sträaubleder. Ya ji Lüding: "Nebûna bersîvekê ji haliyê te de ez bi rastî dilsar kirim. Lüding." Ya ji Sträbleder: "Fêhm nakim çima nehatî alîkariya min. Li benda telefonkirina te me. Alois."

Katjimêr heyşt û panzdehê sibeyê bû, kêm-zêde, kata ku tê de Katharina firavîna wan dadanî ser maseyê: Çawa xweşik mase radixist, bi kulîlk, bi rûmase û destmalên paqiş; ji babetên curbecur nan, hingiv, hêk û qehwe; û ji Trude re nanê germkirî û rîçal.

Trude jî hema hindik mabû atifî xuya bike; ew tev misînê qehweyê û çend kirtik nan ket hundir. "Rewşa berê êdî venagere, çi caran. Ew ê dawiya keçika wînin. Eger ne polîs be, ROJNAME û dema ROJNAME dest jê berde, xelk. A ji te re, berê vê bixwên û dû re telefone mîrzamêvanan bike." Wî xwend:

ROJNAME'ya ku her têdikoşe da ku we di derheqê bûyeran de agahdar bike dikaribû bêtir agahiyan bi dest xe ku ronahiyê diavêjin ser xusetê Blum û paşeroja wê ya di mij de. Ji dest rojnamevanên ROJNAME'yê hat ku diya Blum ya nexweş bi cîh bikin, ew'a ku bi gazinc dest pê kir û got, ku qîza wê ji mêj ve nehatiye serilêdana wê. Dû re, li dû bihîstina rastiya ji gumanan vala, got: "Zû-dereng va roja dê bihata, zû dereng ê bihata." Mêrê Blum, Wilhelm Brettloh, karkerekî çêkirina cêw û merovekî bi hurmet, yê ku va Bluma berda ji ber ku wê ew li şûn hîştibû, hîn ji diya wê bêtir amade bû ku agahiyan bide ROJNA-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ME'yê. "Nuha," wî got û bi zor ji dest hat hêstirên xwe veşêre, " ez êdî baş têgihîştim wê çima dest ji min berda û çû. Tu nabê' va bûye sedem, va! Nuha êdî hertişt li pêş çavên min zelal bû. Bexteweriya me ya ne pirr, ne hindik, têre wê nedikiriye. Wê dixwaztiye bilind bifire. De karkerekî niyetpak ku lingên xwe qasî bera xwe radine dê trimêla Porsche ji wê re ji ku wîne?! Heye ku hûn bikaribin (wî bi xasûkî domand) şîreteke min bigihînin xwendevanên ROJNAME'yê. Ev e dawiya ramanên şaş yên sosyalîzmê. Ez ji we û xwendevanên we dipirsim: Çawa keçikeke xizmetçî dikare bigihê vê dewlemendiyê? Bêguman bi keda xwe û di rêyeke rast de dê nikaribe. Nuha bi min ve xuya dike çima ez di derheqê ramanên wê yên radîkal û baweriyên li dij kilîseyê de bi tirs bûm; û ez bi qurbane hikmeta xwedê bim ku çi zaro nedan me. Û nuha ku ez pê hesiyam çawa wê bihevûdinlîztina li gel eşqiyayekî daye ser evîna min ya pak û bi usûl, wî beşî jî êdî xwe zelal kir. Li gel her tiştî jî, ez dîsa bang li wê dikim: Katharinka min, bila tu hema li cem min mabûyayî! Bi derbasbûna salan re xanî û trimbêleke me jî dê hebûna, lê helbet, yeke Porsche min ê nikaribûya pêşkêşe te bikim; tenê şahiyeke di cîhê xwe de û bi sînor, li gor rewş û taqeta karkerekî bêzexelî ku bi sendîgehan ne bawer e. Ax, Katharina, ax!" Dûmahî heye.

Di bin sernivîsa KAL Û PÎREKE DI TEQAWÎTÊ DE HATIN HEJANDIN LÊ MAT NEMAN de, Blorna di rûpela dawîn de stûneke bi rengê sor batî nivîsandin xwend:

Berpirsiyarekî xwendegehên Lîseyê ku îroj di teqwîtê de ye, Dr. Berthold Hiepertz, û jina wî, Xanim Erna Hi-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

epertz, dema nûçeyên di derheqê Blum de bihîstin, weke ku bi bandora bihîstina wan hatibin êşandin û hejandin xuya kirin, lê ne "weqa matmayî." Hevkareke ROJNAME'yê ew li Lemgo, li mala qîza wan ya zewicî ku li wir berpirsiyara navendeke serxwehatina nesaxan e, xwe gîhand wan. Hiepertz, pisporekî zimanên kevnar û dîrokê, li cem kîjanî va Bluma ji sê salan û vir de kar dike, got: "Meroveke bi hemî hawayan radîkal e, wê bi xasûkî em xapandin."

(Hiepertz dû re di axiftineke telefonî de ji Blorna re sond xwar ku wî va gotina kiriye: "Eger Katharina rast radîkal e, ew bi şêweya alîkariya xwe wisa ye, meroveke ku tum tevdêrvan û baqil e; yan na, wê demê min di derheqê xusetê wê de baweriyeke şaş afirandiye, lê di jiyana min de çel sal tecrûbeyên mamostetiyê hene û şaştiyên wisa li nik min pirr û pirr hindik in.)

Dûmahiya ji rûpel 1 wisa didomand:
Mêrê Blum yê berê ku ROJNAME'yê di civîneke xweamadekirina endamên Koma dahol û Borzana Gemmelsbroich de xwe gîhandê bi tevahî êşiya, berê xwe wê de bada da ku hêstirên xwe veşêre. Endamên vê komê, bi gotina Meffels, cotyarekî di teqawîtê de, hemiyan ji Katharina nefret dikirin, ya ku herdem bi xusetê xwe ji yên din der bûye û her wisa xuya dikiriye ku ew bi hêsanî tête hejandin û aciz dibe. Kêfxweşiya mêrê wê yê berê, vî karkerê dilpak, bi rojên karnîvalê ji rûyê wê de herimî.

Û li dawiyê wêneyeke Blorna û Trude, di hewşa mala wan de, li kêleka hewzê avjiniyê; û di bin wêneyê de: Rola vê jinê, ya ku demekê bi navê "Trudeya Sor" dihat nasîn,



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

û ya mêrê wê, yê ku yekcaran xwe wek merovekî "çep" di-de zanîn, gelo çi bin? Wêne ya Dr. Blorna, abûkatekî meaşbilind yê dezgehên pîşesaziyê, û jina wî Trude ye, li kêleka hewzê avjiniyê yê koşka wan.

## 24

Li vir divêt em paşve vegerin, wek bikarhanîna wêneyên ji paşerojê di filiman û pirtûkên edebiyatê de: Em ê ji sibeya roja şemê, dema ku Dr.û Xanim Blorna mest û kêmzêde bêhêvî ji îznê vegeriyen, biçin sibeya roja îniyê, dema Katharina ji bo îfadegirtinê car din dibirin navenda polîs. Îcar jinpolîs Pêlzer û mamûrekî din'î piçekî umir mezin ku tenê bi dabençe bû ew, ne ji apartmana wê, lê ji ya Xanim Woltersheim rakirin, şûna ku Katharina katjimêr pêncê sibeyê çûbûyê, îcar bi otomobîla xwe. Çi guman li nik jinpolîs Pêlzer nebûn ku ew ê Katharina ne li mala wê lê li ya Woltersheim bibîne (Ji bo xatirê rastiyê, divêt ji bîr neçe ku em fedakarî û tehmûlkirina jin û mêr Blorna careke din bidin ber çavan: Kurtbirrîna îznê, çûna balafirgera I.bi taksiyê. Mayîna li benda rabûna mijê. Çûna rawesteka trênê bi taksiyê. Girtina trêna beri li Frankfurt, û hên bi ser de guhertina trênê li Mûnşin. Virde-wêde-hejandina di vagona razanê de, û bi gihîştina mal di berbanga rojê de rasthatina li ROJNAME'yê. Dû re ew poşman bû - lê êdî bêyî sûd bû -, çima wî li şûna ji Katharina re, ku wî bi rêya kesê ROJNAME'yê dizanibû li ber îfadegirtinê ye, telefon bike, ji Hach re nekir.)

Tiştê bala hemî kesên di îfadegirtina duyem de, ya roja îniyê, beşdar (yên beşdar dîsa van kesan bûn: Moeding,



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Xanim Peltzer, abûkatên giştî Dr.Korton û Hach û nivîskara protokolê, Anna Lockster, ya ku ji lêhûrniherîna Katharina ya di derheqê bijartina peyvên nivîsandina îfadeyê de aciz dibû û leqeba "pozbilind" li wê kiribû) kişandî ser xwe rûbikenî û zimanxweşiya Beizmenne bû. Ew bi destên rahevdiketinî ket hundir, nerx da dan û stendina li gel Katharina, lêborîna wê di derheqê hin "hişkiyan" de xwazt, hişkiyên ku wî şexsiyeta xwe, ne dayîreya xwe, ji bo cîhgirtina wan wekî berpirsiyar bi nav kir û da zanîn ku xusetê wî carekê wisa bû, ku ew merovekî dil pak, lê di eynî demê de şorhişk bû. Wî dû re lîsteya tiştên Katharina yên polîs dest danî ser rakir. Di lîsteyê de van tiştan hebûn:

1. Kevnedeftereke piçûke kesk ku tê de tenê jimarên telefonan hebûn. Xwediyên jimaran hatibûn bicîhkirin û tiştekî ku merov li ser têkeve gumanan nehatibû holê. Diyar bû ku Katharina Blum va deftera ji deh salan û vir de bi kar dihanî. Pisporekî destnivîsê yê ku hewl dida bi riya destnivîsa Götten şopa wî bajo (Götten ji leşgeriyê jî reviya bû û carekê di dayîreyekê de kar kiribû û wisa şopên destnivîsa wî hatibûn bidestxistin), pêşveçûna nivîsa Katharina wek nimûneyeke gelemper bi nav kir: Keçika ku di şanzdehsaliya xwe de jimara telefona Gerberê qesab nivîsandiye, di hevdehsaliya xwe de ya Dr. Kluthen yê pijîşk, di bîstsaliya xwe de ya Dr.Fehnern - û dû re jimar û navnîşanên xwarinçêkerên dawet û temaşeyan, xwediyên xwaringehan û hevalên bi karên wek yê wê mijûl.

2. Meqbûzên bankê li ser kîjanan Blum bi destê xwe û bi şêweyeke rêk û pêk di beşekî de agahiyên di derheqê wan de nivîsandibûn. Hesahê çûn û hatina diravan bi te-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

vahî di cîh de bû û tiştekî ku merov lê têkeve gumanan tunebû. Defter û kaxezên dayîna deynê Şirketa Haftex, ji kîjanê wê apartmana xwe ya di bînayeta "Koşkên Bedew li Kêleka Çêm" de kirîbû, ku di dosiyeke piçûk de hatibûn parastin, û ew jî wek meqbûzên bankê ji kêmasiyan û gumanan bêpar bûn. Kaxezên dayîna bacê jî, wek hemî kaxezên bi pirsa girtin û dayîna diravan ve eleqedar, ji haliyê hesabdarekî de hatibûn lênihêrîn, bêyî ku pispor bikaribe "çi pereyên pirr ku hatibin veşartin" di çav xwe re ke. Beizmenne giraniyeke mezin dabû pirsa lênihêrîna kaxezên danûstendina diravan, bi taybetî yên wan salan ku wî bi henekî navê "Dema Mîrzamêvanan" lêkiribû. Tiştekî ne di cîh de nehat dîtin. Xuya bû ku Katharina mehê 150 mark ji diya xwe re dişandiye, ku wê mesrefê lênihêrîna gora bavê xwe ya li Gemmelsbroich didaye şirketa Kolter ya li Kuir. Tiştên hundir malê yên wek têxt û maseyê û îskemeyan, wê bi pereyên xwe kirîbûn. Hacetên hundir malê, kincên ser û bini, diravên benzînê, ew jî hatin hesibandin lê dîsa bêyî ku tiştekî ne di cîh de bête holê. Hesabdêr dema hemî kaxez li Beizmenne vegerandibûn gotibûyê: "Kuro, lawo, dema ew hat berdan, eger li karekî geriya, min agahdar bike. Her kes li yeke wek vê digere û nabîne." Hesabê telefona Blum jî çi guman nehanîn holê. Aşkere bû ku telefonkirina ji dervayê bajêr re, eger hebûya jî, pirr û pirr hindik bû.

Herweha hat ronahiyê ku Katharina ji brayê xwe Kurt re, yê ku ji bo kirina diziyê di girtîgehê de bû, heyvê 15-20 mark ji bo bêtirkirina xerclixê wî dişandiye.

3. Deftereke biçûk bi bendên cuda ku di her rûpeleke wê de çar stûn hebûn: Yek ji bo hesabê mala Blorna ku



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

tê de mesrefê hûr-mûrê xwarinê, tiştên paqişkirinê û yên şûştina kincan, çarçevan û destmalan hatibû nivîsandin. Ji hesabê di vê stûnê de hat xuyakirin ku Katharina karê ûtiya malê jî dikir.

Di stûna duyem de hesabê mala Hiepertz bi eynî şêweyê hatibû nivîsandin.

Stûnek jî ya hesabê mala Blum bi xwe bû ku xuya kir wê bi mesrefekî ne zêde îdare dikir; di mehine de tenê 30-50 mark li xwarinê hatibûn xerckirin. Lê di eynî demê de hat xuyakirin ku ew gellek caran diçûbû sînemayê (wê televizyona nebû) û carine çokolat, heta qutiyên çokolatê, ji xwe re dikirîbûn.

Di stûna çarem de çûn û hatina diravên hindek karên din ku wê di ber re dikirin hatibûn nivîsandin, wek mesrefê kirîn û paqişkirina kincên kar û beşekî ji mesrefê trimbêla wê. Li vir, dema dor hat pereyên kirîna benzînê, Beizmenne pirsî, bi zimanekî weqa xweş ku yên beşdar hemî mat hîştin, çima weqa pere ji bo kirîna benzînê hatibûn xerckirin - saeta jimartina kîlometran jî diyar dikir ku otomobîla wê pirr dihatibû bi karhanîn. Beizmenne da zanîn, hesab hatiye kirin ku dûrbûna di navbera mala wê û ya Blorna de bi çûn û hatin 6 kîlometir dikirine, di navbera mala wê û ya Hiepertz de 8, û mala wê û ya Xanim Woltersheim de dora 4 kîlometir, û eger merov ji bo her hefteyê tew 20 kîlometirên din ji bo karekî din bipejirandana, dîsa hejmara kîlometiran ya rojane ji 21'an yan 22'an derbas nedibû. Beizmenne domand, divabû neyê jibîrkirin ku ew her roj nediçû mala Woltersheim, lê qey nake. Li gor vî hesabî hejmara kîlometiran ya salane xwe digîhand 8 000'î. Wek kaxezên otomobîla wê diyar diki-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

rin, dema wê Volkswagena xwe du salan berê ji Klomer kirîbû ew 56 000 kîlometiran bi rê ve çûbû. Du caran 8 000 kîlometir dikir 16 000 û vê hejmarê li gel 56 000'ê berê dikir 72 000, lê saeta hejmara kîlometiran di trimbêla wê de 102 000 raber dikir. De baş e, domand Beizmenne, ew yekcaran diçûye serilêdana diya xwe, berê li Gemmelsbroich û dû re li navenda serxwehatina nexweşan li Kuir - Hochsackel, herweha ya brayê xwe di girtîgehê de, lê dûrbûna Gemmelsbroich, wek ya Kuir- Hochsackel, bi çûn û hatin 50 kîlometir e; herweha ya girtîgehê. Bila ew mehê carekê, tew duduyan, çûbe serilêdana wan - û brayê wê tenê ji 6 heyvan û vir de di girtîgehê de bûye; ber bête girtin li gel diya xwe li Gemmelsbroich dimaye - lê tevî wê jî ji bo du salan 4 000 - 5 000 kîlometirên din dihatin holê. Dîsa jî ajotina 25 000 kîlometiran nixamtî dima û sedema vê yekê nehatibû dayîn. De baş e, gelo ew bi ku de diçûye? Ma ew (wî diyar kir ku mebesta wî ne ew yeka bûye ku careke din gotinên bi xwebêjên xirab wîne ser zimên, lê divabû wê mebesta pirsa wî fêhm bikira) diçûbûye merovekî yan merovine li derekê bibîne, û eger bersîv erê bûya, gelo li ku?

Ne tenê Katharina Blum, lê herweha beşdarên din jî, bi şêweyeke gellekî matmayî û veciniqî guhdare hesab û texmîna Beizmenne dikirin, yê ku bi dengekî nerm diaxift. Wisa xuya bû ku ev hesab û jimarên Beizmenne diyar dikirinî Katharina nexeyidandibûn. Bi encama bihîstina wan ew bêtir matmayî bûbû û veciniqîbû; û ew nuha, ne ku li bersîveke di derheqê wan 25 000 kîlometiran de digeriya, lê dixwazt bi xwe bizanibe gelo wê weqa kîlometir kengê û li ku ajotibûne, bi ku de çûbûye û ji bo çi. Bi



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

daniştina ji bo îfadegirtinê re xuya bû ku dan û stendin îroj li gel wê dibe, hema-hema "nerm" bûbû û heta wekî ku bi tirs be diyar dikir; çayê jî vexwaribû, bêyî ku bi îsrar daxwaza dayîna nerxê wê bike. Û nuha ku Beizmenne pirs û hesabê xwe bi seri kirin bêdengiyeke ecêb (yên beşdar hema-hema hemiyan wisa gotin) dest pê kir, wekî ku kesekî bi encama kifişkirinekê beşekî veşartî ji jiyana Katharina ku ta nuha wek pirtûkeke vekirî dixewinî derxistibe holê, beşekî ku hindik mabû (eger ne bi xêra meqbûzên benzînê bûya) veşartî bimaya, wekî ku kesekî sirreke Katharina ya di quncikekî de veşartî mabû derxistibe holê.

"Erê," got Katharina Blum (û ji vir û şûn ve hemî gotinên wê hatin qeydkirin û di deftera îfadegirtinê de ne), "rast e, min nuha zû di serê xwe de hesiband, rojê bêtir ji 30 kîlometiran dike. Ez qe tê de nefikirîbûm, ne jî min hesab kiribû çiqa pere teklîf dike, lê carine min hema ji xwe re diajot, min hema diajot, bêyî ku cîhekî ji xwe re bikim mebest, yanê dû re cîhek dibû mebest, min berê xwe dida haliyekî û şûnekê xwe dikir mebest.Bi başûr de diçûm, ber bi Koblenz, yan bi roava de, ber bi Aachen, yan bi jêr ve, ber bi binaniya çemê Rhein(7). Ne her roj. Ez nikarim bibêjim çend caran û di navbera çi demê û demê de. Bi pirranî dema baran dibariya û ez bi tenê bûm. Na, ez gotina xwe rast dikim: tenê dema baran dibariya ez bi rê ve diçûm. Ez bi tevahî nedizanim çima. Divêt hûn bizanibin, carine, dema ez nediçûm karê li mala Hiepertz û çi karên din jî nebûn, katjimêr 5 ez digihîştim mal û tiştikî min bikira tunebû. Min nedixwazt her biçim mala Else, hi tayhetî li dû ku dostaniyeke weqa teng di navbera wê û Konrad de dest pê kir, û çûna sînemayê jî ji bo jine-

ke bi tenê ne her dem bêyî tehlûke ye. Carine ez di kilîseyekê de dadiniştim, ne ji ber egerên olî, lê ji ber ku li wir bêdengî heye û merov bi serê xwe tête berdan, lê di rojên îroj de di kilîseyan de jî kesine xwe digihînin te, û ew ne tenê kesên nimêjker in. Helbet çend dostên min hene: Wek Werner Klommer, yê ku min Volkswagena xwe jê kirî, û jina wî, û hinên din ku ji bo Kloft kar dikin, lê merov piçekî dijwar dibîne, û pirr caran şerm dike, ku her bi serê xwe biçe serilêdana wan û neçar bimîne ku rasterast, bêyî çi gotin, bi wan re biçe şûnên ew pêşniyar dikin yan eynî tiştên ew dikin bike. Wisa, ez hema diketim otomobîla xwe, radyo vêdixist û bi rê diketim, û min tim riyên biçûk dibijartin, her di baranê de, û baştirîn rê ji bo min ew'ên bi dar bûn. Carine ez derbas Hollende yan Belcîka dibûm, li wir qehweyek yan bîrayek vedixwar û dîsa vedigeriyam. Belê, nuha ku tu ji min dipirsiye, hat bîra min. Eger tu îlleh bipirsî, çend caran, ez ê bibêjim, heyvê du-sê caran û demine kêmtir yan zêdetir û pirraniya caran bi saetan, heta ku ez katjimêr neh, deh û carine dora yanzdeh mest vedigeriyam mala xwe. Rola tirsê jî ta radeyekê hebû: Ez gellek jinên tenêmayî dinasim ku êvaran li ber televizyonê dest bi vexwarinê dikin û serxweş dibin."

Kenê sivik yê di dema guhdarkirinê de li ser lêvên Beizmenne xewan bû çi guman nedihîştin ew di derheqê gotinên wî bihîstinî de çi diponijî. Wî tenê serê xwe dileqand, û eger wî dîsa destên xwe ra hev xistibin, sedem ew bû ku agahiyên Katharina Blum didan yek ji wan teoriyên di serê wî de îspat dikirin. Ji bo kurtedemekê bêdengiyekê cîh girt, wekî ku yên beşdar mat mabin, yan fedîkar derketibin; wisa xuya dikir, wekî ku yekemcar bû Blum perde ji

ser tiştekî şexsî û veşartî radikir. Dû re tiştên manî, ji ew'ên ku ji mala Katharina hatibûn birin, zû hatin binçavkirin.

4. Deftereke wêneyan ku tê de tenê wêneyên kesên bi hêsanî dihatin nasîn hebûn. Bavê Katharina Blum, yê ku nexweş û xeyidî xuya dikir û pirr ji umrê xwe mezintir. Diya yê, ya ku wek hat xuyakirin bi encama kanserê di nexweşxaneyê de li mirinê bû. Brayê wê; Katharina bi xwe, çar salîn, şeş salîn, di dema paptîzma ji haliyê keşe de, û deh salîn; mêrê wê, keşeyê Gemmelsbroich, cînarine, meriyên malbatê, wênene Else Woltersheim, û peyakî bi umir piçekî mezin û di wêneyê de bextewer ku di cîh de nehatibû nasîn lê dû re Dr.Fehnern, hesabdarê tawanbar, derket. Çi wêneyên ku peywendiya wan bikaribûya li gel teoriyên Beizmenne hebûya nehatin dîtin.

5. Pasporteke bi navê Katharina Brettloh, qîza Blum. Li vir pirsên li ser rêwîtiyê hatin holê û diyar bû ku Katharina hîn di çi "rêwîtiyên dûr de" beşdar nebûye; û çend rojên nexweşiyê ne tê de, ew her dixebitiye. Hat diyarkirin ku wê pereyên îzna xwe ji Fehnern û Blorna digirtine lê dernediketiye îznê. Wê karê xwe li nik wan her didomandiye, yan karên di ber re dikirine.

6. Kevnequtiyeke şekirê çokolat. Tiştên tê de: Deh-duanzdeh name, ne bêtir, ji diya wê, brayê wê, şûyê wê û ji Xanim Woltersheim. Tiştekî ku tilî ber bi tawana ew ji bo wê hatibû girtin direêj bikira di nameyan de nehat dîtin. Di hundir qutiyê de herweha sê-çar wêneyên bavê wê yên di dema leşgeriya wî de hatibûn kişandin, yên şûyê wê bi kincên Koma Dahol û Borzanê, sê-car rûpelikên qetiyanî yên salnameyan ku li ser wan gotinên aqilmendan hati-

bûn nivîsandin, destnivîsên pêjandina çend şîvan û nivîsareke li ser bikarhanîna nıeya bi navê sherry di çêkirina xwarinê de hebûn.

7. Gurzek kaxez: Şehade û dîplomên curbecur, dokûmentên cuda, tevahiya kaxezên telaqê û kaxezên apartmana wê.

8. Sê xelekên kilîtan, kilîtên ku hatibû zanîn ew ji bo çi ne: Yên derî û dolabên wê, yên mala Blorna û yên mala Hiepertz.

Bi nivîs hatibû qeydkirin ku tiştên li jor hatinî binavkirin çi îspat nehanîn holê ku peywendiya wan li gel sedema girtinê hebin. Bersîvên Katharina Blum di derheqê pirrbûna mesrefê benzînê û bilindbûna hejmara kîlometran de bêyî pirs hatibûn pejirandin.

Li vir êdî Beizmenne gustîrkeke bi yaqût û gewher ji beriya saqoyê xwe hanî der ku xuyabû wî hema wisa di beriya xwe de hîştibû çimkî ber wê dirêje Katharina bike bi piyê saqoyê xwe paqiş kir.

– Tu vê gustîrkê dinasî?

– Erê, wê di cîh de bersîv da, bêyî ku fedîkar xuya bike.

– Ya te ye?

– Erê.

– Tu dizanî nerxê wê çiqa ye?

– Nizanim bi çi be, lê bawer nakim nerxbilind be.

"Baş e," got Beizmenne bi zimanekî xweş, "me nerxê wê pirsî, û da ku çi şaştî cîh negirin û neheqî li te nebe, ne tenê ji pisporê navenda polîs lê herweha ji qumçiyekî bajêr. Va gustîrka heşt ta deh hezar mark dike. Ma te pê nedizanibû? Ez ê ji te bawer bikim eger tu bibêjî na, lê divêt tu bidî zanîn ka ew ji ku bi dest te ketiye. Ji bo lêko-

lîna di derheqê mucrimekî de ku dizîna ji bankê ketiye stu û ne dûr e merovek jî kujtibe, dîtina gustîrkeke wisa di mala te de ne tiştekî biçûk e, ne jî tiştekî şexsî ye, wek ajotina bi sedan kîlometir li derdoran û di bin baranê de. Kê va gustîrka da te? Götten, mîrzayê mêvan, yan gelo Götten bi xwe mîrzayê mêvan e? Heke na, tu – wek mêvanxanimekê, eger ez bikaribim vî navî bi kar wînim – bi ajotina bi hezaran kîlometir ku de diçûyî? Ji bo me ne dijwar e ku em şûna gustîrk jê hatî kirîn, yan dizîn, bi cîh bikin lê ez dixwazim fersendekê bidim te. Dixwazim bizanibî ku ez te di derheqê kirineke neqanûnî de tawanbar bawer nakim lê belê wek keseke xeşîm û piçekî romantîk. Tu dikî ji min re – ji me re – çawa şîrove bikî ku te – ya ku ji tiştên ne di cîh de vedicinîqe, heta wek keseke fedok têtê nasîn û ji haliyê nasên xwe de wek 'rahîbe' têtê binavkirin, ya ku naçe dîskoxaneyan ji ber ku tiştên bêvac di wan de cîh digirin, xwe ji mêrê xwe dide berdan çimkî wî dest bi 'destavêtinê' kiriye – va Göttenê ku tu dibêjiye te ber pêr nedinasî di eynî rojê de, merov dikare bibêje li bayê bezê, bi xwe re bir hundir apartmana xwe û li wir weqa zû – em çawa bibêjin – ewqas nêzikî di navbera we de çêbû? Tu çi navî li tiştekî wisa dikî? Evîna bi dîtina yekem re? Diltêketin? Hestên eşqê? Ma ji bo te ne xewan e ku li vir tiştine li hev nayên hene, tiştên ku gumanan diafirînin? Û hîn tiştekî din (li vir destekî xwe xist bêriya saqo û zerfeke sipî jê derxit û ji wê zerfeke biçûktir hanî der, yeke ji ew'ên xweşik ku ji derve ve moravîn û ji hundir ve gewravîn in). Ev zerfa vala ku me di dexîleya maseya te de li gel gustîrkê dît roja 12.2.74 katjimêr 18.00 li postexaneya Düsseldorf ya rawesteka trênê hatiye morki-

rin û ji te re hatiye şandin. Bo xatirê xwedê," got Beizmenne li dawiyê, "eger hevalekî te hebû, carine dihat cem te, yekcaran tu diçûyî wî bibînî, name ji te re dişandin û hindek caran tiştek wek diyarî dida te, bibêje ka ew kî ye; hebûna hevalekî ne cerîmet e. Eger xwe bi Götten ve eleqedar neke çi zirar ji bo te tê de nîne."

Ji hemî kesên li wir beşdar ve xuya bû ku Katharina gustîrk nas kir lê nerxê wê nedizanibû, ku wa bû pirsa mîrzamêvên ya hesas car din dihat holê. Gelo wê dil nedikir çi navan bide ji ber ku ditirsiya leke li navê wî keve, lê gelo mebesta wê parastina kesekî bû ku wê nedixwazt bi vê merseleyê ve peywendîgir bike? Vê carê ew tenê piçekî sor bû. Gelo wê nedixwazt diyar bike ku gustîrk ji Götten girtiye ji ber ku pejirandina wî wekî merovekî dilovan bi yên li wir ê dijwar bûya? Ew bêdeng ma, û te digot hema "li teslîmbûnê" bû, dema dest pê kir bibêje: "Rast e, ez di civîna dansê ya li mala Xanim Woltersheim de tenê tev Ludwig Götten, û ji dil, reqisîm, ew'ê ku min di jiyana xwe de ber wê êvarê nedîtibû, û heta bi paşnavê wî be jî min di dema îfadegirtina roja pêncşemê de ji we bihîst. Dilê min bi ser wî de keliya û yê wî bi ser min de. Dora katjimêr deh min mala Woltersheim li şûn hîşt û tev Ludwig Götten çûm apartmana xwe.

"Gustîrk ji ku hatiye ez nedikarim, na, ya rast, ez naxwazim bibêjim. Ji ber ku bidestketina wê xwe bi tiştekî ku ne di cîh de be eleqedar nake, ez xwe neçar nabînim ku çavkaniya wê bidim zanîn. Kê ew zerfa we raber min kirî şandiye, ez nedizanim. Heye ku di wê de reklamek hatibûye şandin. Gellek cîhên ku peywendiya wan bi çêkirin û pêşkêşkirina xwarinê re heye nuha êdî min dinasin. Çima

tiştekî ku peywendiya xwe bi reklaman re hebe dê di zerfeke xweşike rengîne bêyî navnîşan de bête rêkirin, ez jî nedizanim. Tenê dixwazim bidim zanîn ku hindek cîhên çêkirin û pêşkêşkirina xwarinê dixwazin xwe bi şêweyên spehî bidin nasîn."

Dema ji wê hat pirsîn, çima ew wê rojê, tevî ku baş tête zanîn ew ji ajotina otomobîlê hej dike, li şûna ku bi trimbêlê biçe bi trambayê çûbû mala Xanim Woltersheim, Katharina got, wê nedizanibû eger ew ê pirr yan hindik vexwe, lewma wê çûna bi trambayê baştir dît. Hat pirsîn, eger wê pirr vedixwar, yan eger ew tew carine serxweş dibû. Wê bersîv da ku na wê hindik vedixwar û çi caran serxweş nebûbû, carek ne tê de, ew jî bi amadebûn û hêvotina mêrê wê, di êvareke civakî de, bi beşdarbûna Koma Dahol û Borzanê. Wê êvarê ew serxweş bûbû, ew jî bi encama vexwarina ew tiştê yansûn tê de heye û tama xwe wek ya lêmonadê ye. Dû re ji wê re hatibûye gotin ku nerxê wê babetvexwarinê ne arzan bûye û ji bo serxweşkirinê baş bûye.Dema jê re gotin ku sedema wê dayî – ku wê ji tirsa vexwarina pirr otomobîl nebiriye – ne tiştekî bawerkirinê ye çimkî bi gotina wê bi xwe, wê pirr vedixwar; lewma, ma gelo ji bo wê bi xwe jî ne diyar bû ku wisa xuya dikir wê û Götten hev û din bi tevdêr û dema dixwaztin ditîtin û ji ber vê yekê jî wê hewce nedît ku trimbêla xwe li gel xwe bibe ji ber ku wê dizanibû ew ê di ya Götten de wê êvarê vegere mal, wê serê xwe hejand û got, her tiştî wek ku wê got cîh girtiye. Wê got, dilê wê dixwazt wê êvarê piçekî zêde vexwe lê li gel wê jî wisa nekir. Tiştekî din ku divabû her rawestina ji bo firavînê ji hev derkeve ev bû: Ji ber çi bû ku ne deftereke wê ya şêkan, ne jî yeke pereyên

di bankê de hebû? Gelo, hêyî ku kesek bizanibe, çi pereyên wê di hankê de hehûne? Wê hersîv dabû, ku na, di bankê de tenê hesahek li ser navê wê hebûye. Hemî diravên li nik wê digihîştine hev, heta ku hindik bûna jî, ji ber deynê wê yê fayîzbilind ve dihatibûne dayîn ji ber ku fayîza deynan hindek caran duqatê fayîza ji bo pereyên di hesabên hankan de dihatî dayîn bûye, û tew ji bo pereyên di hesabê şêkan de çi fayîz nedihatibûye dayîn. Li milê din, bikarhanîna deftereke şêkan tiştekî giran û tevlihev bûye ji ho wê. Mesrefê malê û trimbêlê wê ji bêriya xwe, di cîh de, didaye.

## 25

Bixwazî–nexwazî, cîhgirtina xetimandinên curbecur ku merov dikare wek tengasiyê yan guvaştinê jî bi nav bike dê carine cîh higirin çimkî merov nikare ava her kortê bi yek lêdan jê derîne û ber bi haliyekî din bi rê xe, bi şêweyeke wisa ku erdê binê kurtê di cîh de bête xuyakirin. Lê ta ji dest bête der em ê bikin ku xwe ji tengasiyên ne weqa grîng bi dûr xin, û ji lewre, em ê li vir hewl bidin da ku xuya bikin ka çima di va sibeya roja îniyê de Beizmenne û Katharina, herdu jî wisa bêhnfireh, hema–hema nermik, belkî tew dilbirehim, xuya dikirin, tew Katharina nervoz xuya dikir, yan wek keseke ku hatibe tirsandin. Rast e, ROJNAME'yê ya ku cîraneke rind xuşe binê deriyê Xanim Woltersheim kiribû agirê hestên girrê, qehrê, acizbûnê, şermê û tirsê di dilên herdu jinan de vêxistibû, lê axaftina telefonî ya ku li dû kurtedemekê li gel Blorna cîh girtî av bi ser wî agirî de berda. Li milê din, li dû dîtina

ROJNAME'yê û axaftina li gel Blorna jinmamûra polîs, Pletzer, gihîştibû wir û aşkere kiribû ku dorhaliyên mala Katharina, wekî ku di rewşên wisa de ji usûlê ne der bûye, ji haliyê polîs de dihatine tehqîbkirin; lewma jî wê dizanibûye ku Katharina li mala Xanim Woltersheim e, ne li mala xwe, û mixabin, divabû ew li gel wan nuha biçûya navenda polîs ji bo îfadegirinê, û mixabin, herweha Xanim Woltersheim. Li vir, şêweya axaftina vekirî ya Pletzer û zimanxweşiya wê vecinqandina ji ROJNAMA'yê ji bo kurtedemekê ji bîra Katharina rakir û pêkan kir ku ew hişên xwe careke din vegerîne ser bûyera şeva borîn, bûyera ku ew gellekî bextewer kiribû: Ludwig telefon kiribû, û erê, ji wir. Weqa delal dengê wî dihatibûye ku wê nexwaztibû wî agahdare gelşên xwe bike da ku wî di derheqê cîhgirtina wan de xwe lomekar nekira û bi encama tiştên bi serê wê de hatinî xemgîn nebûya. Ew li ser evînê neaxaftibûn. Wê – ji dema ku herdu di otomobîla wê de diçûn mala wê de – qedexe kiribû ku ew jê re li ser evînê bipeyive. Na, na, tiştek ji wê ne kêm bû, û êrê, wê dê di rojên karnîvalê de vêsî bikira, û ji vir û şûn ve ew ê ji wî pê ve li gel kesekî ranebûya dansê, û tenê dîlanên Amerîkaya Başûrr, û tenê tev wî; û li wî haliyî çi hebû? Xanî zor baş bû û her tiştê wî dixwazt tê de hebû, û ji ber ku wê qedexe kiribû ku ew li ser evînê biaxife, wî dil hebû bibêje ku ew wê pirr û pirr û pirr şêrîn dibîne, û rojekê ji rojan, kengê, ew hîn nedizane, belkî li dû çend heyvan, lê heye ku li dû salekê yan duduyan be, ew ê were û wê bibe, bi ku de, ew jî nedizane. Axaftina wan wek ya kesên ji hev û din hez dikin bi telefonê bi hev re dipeyivin domandibû. Çi gotinên ku xwebêjeke têkiliyên gellekî şexsî bidin nehatibûn

kirin, ne hîn tew tiştekî ku ji haliyê Beizmenne de (bêtir belkî ji haliyê Hach de) wisa bi hişkî hatibû ser zimên. Ew deh deqeyan, heye ku bêtir, li gel hev axaftibûn wekî ku Katharina ji Else re gotibû. Di derheqê peyvên ji haliyê herdu evîndaran de li vir hatibûn bikarhanîn, merov dikare filimine nûjen bide ber çavan ku tê de du kes li ser hestên li hember hev diaxifin. Gotinên wisa di telefonê de, ji ber dûrbûna ji hev û din, wekî gotinên ku li hev û din nayên têyên bihîstin.

Ev axaftina telefonî di navbera Katharina û Ludwig de herweha sedema bêhnfirehbûn, zimanxweşî û nermitiya Beizmenne bû, û tevî ku wî li gor baweriya xwe dizanibû çima Katharina di daniştina îroj de ne wek berê serhişk bû, wê li milê din, wek merov dikare têbigihê, nedizanibû ku Beizmenne ji bo eynî bûyerê, çiqa sedem ne wek hev bin jî, wek wê kêfxweş bû. (Divêt merov va bûyera mat û hêjayî balkêşiyê bike sedem ku bêtir telefonê bi kar wîne, heke pêwîst bû tew bêyî kustepista bi peyvên evînê dagirtî, ji ber ku merov nedizane ka kê bi va axaftina telefonî kêfxweş dikiye). Lê Beizmenne herweha dizanibû çima Katharina îroj piçekî bi tirs bû, ji ber ku haya wî ji telefonkirineke din hebû ku xwediyê wê xwe bi nav nekiribû.

Bila xwendevan bi kerema xwe bi şopa çavkaniyên veşartî yên agahiyên di vî beşî de nekeve: merov dikare bibêje, dîwarekî kelpîçîn'î ji çêkirina hosteyekî xeşîm hatiye qulkirin û ava li holê hatiye derxistin yan rijiyaye berî ku dîwarê qels hilweşe û giranî û gêrkirina li holê nemîne.

## 26

Da ku kesek dû re şaş fêhm neke, pêwîst e li vir bête diyarkirin ku Else Woltersheim û Bloran, herduyan jî helbet dizanibûn ku bi encama alîkirina Götten di derheqê reva ji mala wê de, Katharina kirineke li dij qanûnê kiribû. Rastiya ku wê riyeke revê jê re dît bêguman wê dike hevpara şikandina bendine qanûnê, tevî ku ew di derheqê bûyerên eslî de ne gunehbar e jî! Else Woltersheim va yeka rasterast dabû rûyê wê, hema çend deqeyan ber gihîştina Xanim Pletzer da ku wan bibe danîştina îfadegirtinê. Blorna jî nehîşt fersenda yekem ji dest biçe bêyî ku haya Katharina bikişîne ser kirina wê ya neqanûnî. Bersîva ku Katharina di derbareyê vê pirsê de dabû Xanim Woltersheim divêt herweha ji kesekî neyê veşartin: "Lê, ma ne qederê wanî xwazt, û ez ê li gel wî bizewiciyama û zarok biahnîna, heta ku ez bi salan li benda derketina wî ji girtîgehê bimama jî.

## 27

Îfadegirtina Katharina Blum dikare li vir wekî ku bi seri bibe bête hesibandin; tenê divabû bipejirîne ku careke din vegere, heke li dû îfadegirtina kesên din, yên ku herweha di civîna dansê ya li mala Woltersheim cîh girtî de beşdar bûbûn, pirsine din bihatana holê. Li vir divabû êdî bersîv ji pirsekê re bihata dîtin ku di qalibê teoriya Beizmenne ya hevdîtina bi tevdêr û tilîhebûna di kirinên li dij dewletê de pirseke bi qasî xwe grîng bû: Çawa Ludwig Götten bû-

bû mêvanê civîna dansê ya li mala Xanim Woltersheim cîh girtî?

Ji Katharina Blum re hat gotin, ew dikare biçe mal yan li şûna ew dixwaze li benda Xanim Woltersheim bimîne, lê wê dil nekir biçe mal û got ku bûyerên dawîn apartmana wê li pêş çavên wê reş kiribûn û ji lewre wê baştir didît di odeyeke nezaretê de bimîne ta ku îfadegirtina Xanim Woltersheim bi seri dibe, da ku li gel wê biçe mala wê. Li vir bû ku Katharina herdu hejmarên ROJNAME'yê ji çenteyê xwe hanîbûn der û pirsîbû, eger dewlet – va gotina wê bi xwe ye – nikaribe tiştekî bike da ku wê ji vê gemarê biparêze û lekeya li navê wê ketî bide paqişkirin(8). Wê diyar kiribû, di navberê de ji bo wê baş zelal bûye ku sedema îfadegirtina wê di cîh de bû, tevî ku wê hîn jî sedema va hûrlêniherîna kûr ku xwe digîhand "hemî haliyên jiyana wê" fêhm nedikir; lê belê ji dest wê nedihat der ku têbigihê, çawa beşine îfadeya wê, wek pirsa mîrzamêvanan, dikaribûn bikevin dest ROJNAME'yê, û hîn bi ser de jî van gotinên tiji gemar û li hev hatinî hûnan. Li vir Hach, abûkatê giştî, axiftina wê birrî û got, ku ew balkêşiya merseleya Götten li gel xwe hanîbû holê dayîna danzanînekê ji bo weşanên giştî pêwîst kiribûye, ku konferenseke çapemeniyê hîn cîh negirtibûye, lê belê ew balkêşî û tirsa ku reva Götten – reva ku bi alîkariya wê cîh girtibû – hanîbûne holê, rêbirrîna li konferenseke wisa êdî zor dijwar dikiribûye. Li milê din, hevnaskirina wê û Götten ew kiribûye "keseke ji dîroka rojane" û bi encama vê yekê, wekî merov dikare fêhm bike, ew bûbûye keseke ji bo raya giştî balkêş. Eger di gotarên rojnameyan de îhanet yan lekegîhandina ji bo navê wê hebûna, wê maf hebûye ji hali-

yê xwe de li wan gilî bikira, û eger bihata îspatkirin ku mamûrên îfadegirtinê çi gotin gîhandibûne derve, bila wê baş bizanibûya ku polîs ê xwe bigîhanda binê merseleyê û cezakirina mamûrê, yan mamûrên, gotinên îfadeyê gîhandinî derve bixwazta û di derheqê stendina mafên wê de bihata alîkariya wê. Dû re Katharina birin odeyeke nezaretê. Pêwîst nehatibû dîtin ku wê siqesiq têxin bin çavan, jinpolîseke ciwan bi navê Renate Zündach bêyî çek ew pabû, ya ku dû re dabû zanîn, Katharina Blum bi dirêjiya wê katê – dora du saet û nîvan –tiştek nekiribûye, xeyn ji xwendina herdu hejmarên ROJNAMEY'yê, car li dû car. Wê ne çay, ne etûr û nejî tiştekî din pejirandibûne, ne ku bi şêweyeke hişk ew nepejirandine; "bêtir bi zimanxweşî û bêmeraqî." Renate Zündach pirr hewl dabûye ku li gel wê li ser modeya kincan, filiman û dansê bipeyive, da ku bala wê ji ROJNAME'yê bi dûr xe, lê bêyî çi sûd.

Da li gel Blum'a ku wisa diyar bû hişên wê bi tevahî ji haliyê ROJNAME'yê de hatibûn dizîn alîkar derkeve, Zündach polîsekî bi navê Hüften li ber wê hiştibû û çûbû ji arşîvê raporine ji rojnamene din jê re hanîbûn ku tê de li ser eynî pirsê di derheqê îfadegirtin û rola wê de bi şêweke objektîv hatibû nivîsandin. Van rojnameyan raporên kurt di rûpelên sêyem yan çarem de weşandibûn, tew bêyî ku wê bi tevahî bi nav bikin, tenê wek Katahrina B., karkereke hundir malan behsa wê kiribûn. Jinpolîsê rapora di rojnameya "UMSCHAU" de wek nimûne raber wê kiribû: Agahdariyeke tenê bi deh rêzan, helbete bêyî wêne, ku tê de behsa talihreşiya kesekê hatibû kirin ya ku bêyî gunehbarî di vê merseleyê werbûbû. Hemî raporên di rojnameyên din de hatinî dîtin – Zündach panzdeh heb ka-

xez li pêş wê danîbûn – bêhna Blum fireh nekiribûn. Wê tenê gotibû, "ma kî van rojnameyan dixwîne? Hemî kesên ez dinasim ROJNAME'yê dixwînin."

## 28

Da ku bête aşkerekirin ka Götten çawa dikaribûye beşdare civîna dansa li mala Xanim Woltersheim bibe, berê îfadeya wê bi xwe hat girtin, û ji deqeya yekem de diyar bû ku nefreta Xanim Woltersheim li hember hemî kesên di îfadegirtina wê de beşdar çiqa ne kûr bûya jî, bêyî çi guman ji ya Blum kûrtir bû. Wê da zanîn, ew di sala 1930 de ji day bûye, 44 salîn e, bêmêr e, bi karê hundir malan û pêşkêşkirina xwarinê mijûl e, bêyî ku çi dîplom di vî warî de li gel wê hebin. Ber dest bi dayîna bersîvên ji bo pirsa li holê bike, wê "bi dengekî ji hestên atifî vala, dengekî hema–hema wek qûma hişk, ku ji qiseyên xirab û qîrînê bêtir girr û nefreta wê diyar dikirin," sebaret nivîsarên ROJNAME'yê yên di derheqê Katharina Blum de, herweha li hember pêkaniya derbasbûna agahîne di dema îfadegirtinê de hatinî ser zimên ji bo wa rojnameya bênerx, tiştên di dilê xwe de gotin. Wê gotibû, wê fêhm dikiriye ku rola Katharina di vê merseleyê de divabû bihata hûrlêniherîn, lê di eynî demê de, wê ji xwe dipirsiye, eger grîngiya sedeman têrê dikir ku "jiyana meroveke ciwan bihata herimandin," wekî ku nuha dibûye. Wê domandibû û gotibû ku wê Katharina ji roja jidaybûna wê de dinasiye û ev bûbûn du roj ku wê di çav xwe re kiribûye çawa proseyeke hilweşandinê di jiyana wê de cîh digirtiye. Ew pê ve çûbû û ragîhandibû ku ew ne pijîşkeke nefsî bûye, lê dîtina ku

apartmana Katharina nema bala wê dikişand, ew apartmana li ber çavên wê giranbiha û ji bo kîjanê ew demeke dûr û dirêj xebitîbû, nêşaneke ne ji xêrê re bûye.

Dawîdana rêzên Xanim Woltersheim yên bi gazinc û lomeyan dagirtî ne hêsan bû, heta ji bo Bezmenne jî; û tenê dema wî axaftina wê birrî û rexne lê girt, ku çima wê Götten hîştibûye mala xwe, wê dest ji gazincan berda û gotê ku heta bi navê wî be jî wê nedizanibû, ne wî xwe dabûye nasîn, ne jî kesekî ew bi wê dabûye nasîn. Wê tenê dizanibûye ku ew dora katjimêr 7.30'ê êvara wê çarşemê li gel Hertha Scheumel gihîştibûye mala wê, û li gel wan kesekî din'î bi kincên şêxên Ereban hatibûye ku hevala Hertha, Claudia Stern, bi xwe re hanîbûye, kesekî ku bi navê Karl bang lê dikiribûne û bi kirinên ji usûlê der bala beşdaran kişandibûye ser xwe. Gotina hevdîtineke bi tevdêr bi ser û binê xwe ve ne di cîh de bûye, û wê bi xwe jî çi caran navê Götten nebihîstibûye. Wê gotibû ku wê her tiştê biçûk û mezin di derheqê Katharina de dizanibûye, lê dema ji wê re behsa "ew rêwîtiya bi trimbêlê ya mathîştinê" kiribûn, ew neçar mabû bibêje ku wê tiştek li ser vê merseleyê nedizanibûye, û wisa gotina wê ku wê di derheqê Katharina de her tiştê biçûk û mezin dizanibû ta radeyekê hat pûçkirin. Dema pirsa mîrzamêvanan hatibû holê ew fedîkar derketibû û gotibû, ji ber ku Katharina bi xwe ji wê re li ser vê pirsê tiştek negotibûye, wê jî nedixwaztiye tiştekî bibêje. Wê tenê dikaribûye bibêje ku peywendiya Katharina li gel yekî ji wan tiştekî wisa bûye ku "kêmzêde kenê merov pê dihat" û "dema ez behsa kenpêhatinê dikim mebesta min mîrzamêvan e, ne Katharina." Eger Katharina rê dabûya, ew ê amadebûya her tiştê di derheqê

vê pirsê de dizanibû bigota. Ji bo wê ne tiştekî pêbaweriyê bûye ku Katharina di wan êvarên rêwîtiya bi otomobîlê de diçûbûye dîtina vî kesî. Rast e, ew peyaya hebûye lê sedema dilnekirina binavkirina wî ji haliyê Katharina de ew bûye ku wê nedixwaztiye wî bike armanca qerf û henekên xelkê. Rola Katharina di têkiliyên li gel herdu mîrzamêvanan de – ya tev Götten û ya tev mîrzamêvên – yeke bêyî lomedarî û tawan bûye. Katharina her dem keçeke bekkar, rêzdar û piçekî fedok bûye, ya rastir: ji merovan şerm dikiribûye, heta di dema zarokiya xwe de jî, û ew keseke bi olê û kilîseyê bawermend bûye. Lê dû re diya wê, ya ku kilîseya Gemmelsbroich paqiş dikiribûye, ji bo siçiyên bêusûl çend caran bûbûye armanca rexnelêgirtin û lomeyan, û tew carekê hatibûye dîtin, çawa wê tev xizmetçiyê kilîseyê ji şûşeyekê meya ji bo armancên olî tête bikarhanîn vedixwaribûye. Va bûyera weqa hatibûye mezinkirin ku vexwarina şûşeyek mey bûbûye "cîlıgirtina kirinên fahiş," ji lewre jî keşîş di xwendegehê de neheqî li Katharina dikiribûne. Rast e, hişên Xanim Blum, diya Katharina, ne her di serê wê de bûne, û ta radeyekê kêfçiya alkoholê bûye, li divabûye ku merov xwe xistiba şûna wê: şûyekî ku dawiya pitepita wî nedihatibûye, nisax – bavê Katharina – , merovekî ku mest û hilak ji cengê vegeriyabûye û agirê xem û kulên di dilê vê dayê de gurrtir kiribûne; û hîn bi ser de ew kurê – brayê Katharina – ku merov dikaribûye bigota, ketibûye riya şaş. Haya wê ji zewaca Katharina ya bêoxir jî hebûye. Ya rast, ji destpêkê de wê şîret lê kiribûne ku bila li gel vî Brettlohê – wê ji bo va gotina xwe lêborîn ji beşdaran xwaztibû – kûnelês nezewice, kesê ku erd li pêş berpirsiyarên vê dunyayê û yên kilîseyê dûz

dikiribûye û li milê din kesekî çalimfiroş bûye. Ji bo wê, zewaca Katharina ya pêşkat riyeke reva ji rewşa mala wan ya xirab bûye, û wekî ku nuha li pêş çavan aşkere bûye, hema li dû ku wê xwe ji rewşa malbatê û ew zewaca bêoxir azadkiribûye, wê xwe pêş ve biribûye. Şehadeyên wê di derheqê mesleka xwe de bi dest xistibûn rê li hemî gumanan dibirrîne. Wê – Xanim Woltersheim – dikaribûye vê yekê ne tenê bi gotin lê herweha bi nivîs îspat bike ji ber ku ew endama komîteyeke îmtîhanên meslekên destkarî bûye. Nuha ku meraqa xelkê û cîhên giştî di warê demderbaskirinê de ber bi "xwarina amadekirî" diçûye, fersendên ji bo jineke wek Katharina heku diçûn bêtir dibûne, ji ber ku ew ji bo vî karî munasib bûye û di derheqê wî de bi firehî xwendibûye, sebaret raxistin û pêşkêşkirina xwarinê xwedan xibret bûye. Lê anuha, eger di derheqê nivîsarine ku ROJNAMEY'ê li ser wê çapkiribûn de tiştekî cîh negirta û mafên wê lê nehatana vegerandin, wê demê, çawa ku apartmana wê di çavên wê de reş bûbûye, wisa jî meraqa ji bo mesleka wê dê di dilê wê de vemiriya. Bi vê gotinê re Xanim Woltersheim hatibû agahdarkirin ku ne ji karê polîs û abûkatiya giştî bûye, kesekî ji bo "hindek metodên rojnamevaniyê, ku bêguman ne di cîh de bûne, bide cezakirin." Nedivabû ku kesekî serbestiya rojnamevaniyê ji bo armancên xwe bi kar bihaniya, û bila wê baş bizanibûya ku di vî warî de gilîkirineke şexsî dê bi hawayekî adilane bihata lêniherîn, û eger agahî bi şêweyeke ji qanûnên welêt der ji çaviyekê, yan çavîne, hatibûna der, ew kesa, yan kesan, ê bihatana cezakirin. Abûkatê giştî yê ciwan bûye, Dr. Korten, ku li vir bi şêweyeke nêzikî atifî, û gelekî ceddî, piştgiriya serbestiya rojnamevaniyê û parastina

kîbûna çaviyên agahiyan kiribû û gotibû, zor grîng bûye, merov ji bîr ranekira ku kesên xwe ji hevaltî û hevkariya merovên xirab diparastin, bêyî çi guman, xwe nedikirin armancên raporên şêwehişk ku belkî zirar bigîhandana navên wan.

Dr.Korten axaftina xwe domandibû û gotibû ku tevahiya vê pirsê – hebûna Götten û Karl'ê bi kincên şêxên Ereban li mala Xanim Woltersheim – gumanek dihanîbûye holê, ku çawa wisa bi hêsanî ligelhevdaniştineke civakî wê êvarê cîh girtibûye.Va yeka ji bo wî hîn zelal nebûbûye û wî hêviya xwe dispartiye ser îfadegirtina herdu stiyên ciwan, xwediyên têkiliyên bi vê pirsê re, ku belkî bikaribûna tiştekî mentiqî diyar bikirana. Merov nedikaribûye ew bi xwe, Xanim Woltersheim, bi tevahî ji lomeyan biparasta ji ber ku wê çi grîngî nedabûye bijartina mêvanên xwe. Xanim Woltersheim razî nebûbû ku bi vê şêweyê ji hahiyê kesekî ji wê biçûktir de bête rexnekirin û gotibû ku wê herdu stiyên ciwan vexwandibûne da ku li gel hevalên xwe bihatana mala wê, lêbelê ne ji sinçiyên wê bûne ku daxwaza nasnameyan û şehadeyên polîs di derheqê lebatçakiyê de ji mêvanên xwe bikirana. Li vir ew hatibû agahdarkirin ku temenê merov di vê merseleyê de çi rol nedilîztiye, lê li milê din, karê Dr.Korten, wek abûkatê giştî, roleke grîng hebûye. Çawa bûya jî, divabûye wê bipejiranda ku va merseleya di bin lêniherînê de yeke ceddî bûye, yeke ku têkiliya xwe belkî li gel curmenke giran, heye ku tew girantirîn curm, hebûya, curmeke ku pêkan e, wek xuya dikiriye, tihiyên Götten tê de hebûne. Çi grîng e û çi ne girînge, girtina wê biryarê berpirsiyartiya dewletê bûye, ne ya wê. Dema ji wê hatibû pirsîn, eger Götten û

mîrzamêvan belkî eynî merov bûna, Woltersheim gotibû, na, wê baş dizanibûye ku ew ne eynî merov bûne. Lê dema jê hat pirsîn, eger wê bi xwe mîrzamêvan dinasî, çi caran dîtibû, yan lê rast hatibû, ew neçar mabû bibêje na; û ji ber ku wê herweha tiştek li ser pirseke şexsî ya zor grîng jî nedizanibû – pirsa rêwîtiya Katharina ya êvaran –, îfadedayîna wê wek gotinên di cîh de nehatibû pejirandin. Bi şêweyeke hişk ji wê re hatibû gotin ku îfadegirtina wê ji bo nuha kuta bûbû. Ber ji odeyê biçe der – enirî, tête gotin –, wê gotibû ku ew ji Götten bêtir li Karlê bi kincên şêxên Ereban ketibûye gumanan; ew li gel xwe diaxiftibûye û bêyî ku xêtir bixwaze çûbûye.

## 29

Ji ber ku Götten li gel Hertha Scheumel ya hevdeh salîn, firşkareke hundir mixazeyan, hatibû civîna dansê îfadegirtina wê li dû Xanim Woltersheim dest pê kir. Ew piçekî nervoz û bi tirs hatibû dîtin û gotibû, wê çi caran bi polîs re nedabûye–nestandibûye. Li gel wê jî ji dest hatibû ku îfadeya xwe di derheqê hevnaskirina wê û çötten de bi şêweyeke nexirab bide. “Ez tev hevala xwe Claudia Sterm,” wê dest pê kiribû, “ya ku di cîhekî çêkirina çokolatê de kar dike, di apartmaneke bi yek ode, mitabax û serşok de dimînim. Em herdu jî ji xelkê Kuir–Oftersbroich in û malbatên me û Woltersheim, herweha Katharina Blum, ji dûr ve digihên hev (li gel ku wê xwaztibû merîtiya dûredûr bêtir zelal bike û gotibû ku bapîr û dapîrên wan pismam û dotmamên hev û din bûne, va danzanîna wê grîng nehatibû dîtin û jê re hatibû gotin ku “merîtiya dûredûr” têrê

dikiribû). Em Xanim Woltersheim wek Meto bi nav dikin û Katharina jî wek dotmamekê dihesibînin. Wê êvarê, êvara 20'ê sîbata 1974'an, em herdu, ez û Claudia, li hev şaş bûbûn. Me ji Meta Else'yê re gotibû, em ê tev hevalên xwe di civîna dansa li mala wê de beşdar bibin çimkî bêyî wan hejmara peyan ji bo dansê dê ji ya jinan kêmtir bûya. Lê ji hevalê min'î ku leşgeriya xwe dikêye, gotina bêtir di cîh de, di beşê dezgehvaniyê de leşgeriyê dikêye, dîsa hat xwaztin ku di cîh de vegere qişleya xwe. Tevî ku min jê re pêşniyar kir, bila ji qişleyê bireve, bi ya min nebû, ji ber ku ew gellek caran reviyabû û ditirsiya bête girtin û cezakirin. Hevalê Claudia, li milê din, hîn li paşnîvro weqa serxweş bûbû ku em neçar man wî têxin nav livînan. Ji ber vê yekê me biryar girt ku biçin çayxaneya Polkt, bi hêviya ku em li wir rast du kesên rind bêyên da ku wan li gel xwe bibin civîna dansê, ji ber ku me nedixwazt em li cem Meta Else fedîkar derkevin. Di rojên karnîvalê de çayxaneya Polkt tım şên e. Gellek merov li pêş û li dû çûna dansê yan temaşeyên karnîvalê li wir digihên hev û yê bixwaze dikare her dem tê de rast kesên ciwan were. Tevî ku hîn esrê teng bû jî komeke şên ji merovan li wir gihîştibû hev. Ew ciwanê ku ez nuha ji we dibihîsim navê xwe Ludwig Götten e û wekî mucrimekî mezin ji haliyê polîs de têye xwaztine, ez du caran di çayxaneyê de vexwandim dansê. Dema em cara duyem rabûn reqsê, min jê pirsî, eger dixwazt li gel min biçûya civîneke şahiyê. Wî di cîh de bi dilşadî pejirand. Wî gote min, ew rêwîyekî di bajêr re derbas dibûye, cîhekî ew lê razê tunebûye, nedizanibûye ka ew ê wê şevê li ku bima û ji lewre dixwaztibû li gel min biçûya. Di vê bîstê de, kata ku min û vî Göttenî, wek

merov dibêje, ji bo tevçûnê li hev dikir, Claudia li gel kesekî bi kincên Şêxên Ereban hema li kêleka me direqisî, û ez dibêjim wî axaftina me dibihîst çimkî vî şêxê ku dû re ji min re got navê xwe karl e di cîh de bi şêweyeke bergerîn û qeşmerîn ji Claudia pirsî, eger di vê civînê de ji bo wî jî dê piçek şûn hebûya, ew jî bêkes û bêwar bûye. Wisa jî em gihîştibûn armanca xwe û dirêj nekin em di trimbêla Ludwig, mebesta min ya Birêz Götten, de çûn mala Meta Else. Trimbêl yeke Porsche bû û ji bo çar kesan teng bû lê şûna em diçûnê ne dûr bû. Bersîva pirsa, eger Katharina Blum dizanibû em ê biçûna çayxaneya Polkt, erê ye. Di sibeya wê rojê de min telefone Katharina kir, dema wê li mala abûkat Blorna kar dikir, û gotê, ez û Claudia dê neçar bimana bi tenê biçin mala Meta Else eger me kesek nedîta. Min herweha gotê ku em ê biçûna çayxaneya Polkt. Wê va yeka baş nedît û got, em kirinên bêyî berpirsiyartî dikin û zûbizû baweriya xwe bi kesan tînin. Lê Katharina ji vî halî de her wisa ye. Ji lewre mat mam ez dema Katharina di cîh de li Götten xwedî derket û bi tevahiya êvarê li gel wî reqisî, te digot herduyan bi dirêjiya salan hev û din dinasîn."

## 30

Îfadeya Hertha Scheumel hema–hema peyv bi peyv ji haliyê hevala wê Claudia Sterm de wekî di cîh de hat pejirandin. Tenê di derbareyê tiştekî de, tiştekî ne grîng, axaftina wan ji hev cuda bû. Ew sê caran, ne du caran, li gel Karlê bi kincên şêxên Ereban reqisîbûye ji ber ku wî ber vexwendina Hertha ji haliyê Götten de ew vexwandi-

bûye dansê. Claudia Sterm jî mat mabûye ku çiqa zû Katharina Blum, ya ku wek meroveke xweperest tête nasîn, peywendiyeke dostane, hema–hema wek ku wî hinase, li gel Götten bi rê xistiye.

## 31

Divabû îfadeya sê merovên din ji yên di civîna dansê de beşdar bihata girtin: Konrad Beiters, 56 salîn, bi karê kirîn û frotina cêw mijûl dibe, hevalekî Xanim Woltersheim; Georg Plotten yê 36 salîn û jina wî Hedwig ya 42 salîn, herdu jî wek mamûrên belediyê di kar de ne. Di derheqê derbasbûna kata êvara li mala Woltersheim de, ji dema gihîştina Katharina Blum, Hertha Scheumel tev Götten û Claudia Sterm tev Karl'ê bi kincên şêxên Ereban de, hersiyan jî eynî gotin kirin. Êvar yeke pirr xweş bûye, beşdar reqisîbûne, li gel hev axiftibûne û kesê bi navê Karl bi henekên xwe gellek kes kenandibûne. Tenê tiştek ne di cîh de bûye – eger merov bikaribûye wisa bigota, ji ber ku herdu kesên eleqedar, bêguman, ew wek tiştekî ne di cîh de nedîtibûn –, gotibû Georg Plotten, ew jî "kontrolkirina tevahî ya Katharina Blum ji haliyê Ludwig Götten de" bûye. Vê yekê ceddîyetek, hema–hema bayekî fermî, di rewşa êvarê de afirandibûye, tiştekî ku ji temaşeyên rojên karnîvalê der e. Hedwig Plotten gotibû, dema ew li dû derketina Katharina û Ludwig ji bo hanîma bûzê çûbûye mitabaxê, axiftina karl'ê bi kincên şêxan xwe bi xwe re bala wê jî kişandibûye ser xwe.

## 32

Katharina Blum ya ku dîsa li îfadegirtinê hatibû vegerandin got, erê, wê bi telefonê li gel Hertha Scheumel axaftibû, lê careke din da zanîn ku têkiliya wê axaftinê bi çi tevdêrên dîtina Götten re nebû. Ne Beizmenne, lê ji herdu abûkatên giştî yê ciwantir, Dr.Korten, bû ku li vir pêşniyar kiribû, bila Katharina bipejirîne ku wê li dû axaftina li gel Hertha Scheumel telefone Götten kiribû, ku bila biçe çayxaneya Polkt da ku wê li wir wîne ser rê û bikaribe li gel wê, bêyî ku kes wî binase, bête civîna dansa li mala Woltersheim, cîhê ku wan herduyan ê tê de hev bidîtina. Naskirina Scheumel'a ku porê xwe zêde zer e û kincên balkêş li xwe dike dê ne tiştekî dijwar bûya. Li dû vê gotinê Katharina Blum serê xwe hejand û bêyî ku bala xwe bide wî dest pê kir di destê rastê de herdu hejmarên ROJNAME'yê her biguvişe ser hev. Dû re ew berdan û ew li gel Xanim Woltersheim û hevalê wê Konrad Beiters ji navenda polîs çû der.

## 33

Dema li ser îfadeyên hatinî nivîsandin û îmzekirin axaftin bû û hat pirsîn, eger çi valahî di derheqê pirs û bersîvên bi vê merseleyê ve girêdayî hîn mabin, Dr.Korten pirsî, eger ne layiqî hewldaneke tekûz bûya ku merov va Karlê bi kincên şêxan bi cîh bikira û îfadeya wî bigirta. Ji bo wî tiştekî mathîştinê bûye çima "va Karla" hîn nehatibûye hicîhkirin. Ma ne ew jî, wek hatibû diyarkirin, di eynî katê de, eger ne tev Götten be jî, di qehwexaneya Polkt de

bûye û herweha xwe li beşdarbûna di civîna dansê de feriz kiribûye. Ji bo wî, ango Korten, rola vî kesî wek yeke di tarîtiyê û gumanê de dimaye.

Li vir pîqînî bi hemî kesên beşdar ket, keniyan. Heta jinpolîs Pletzera piçekî xweperest, wê jî rê da ku kenekî sivik li ser lêvên wê bête xuyakirin. Nivîskara îfadeyan, Xaninı Anna Lockster, weqa bi deng keniya ku pêwîst bû Beizmenne lıaya wê bikişîne ser civînê. Û ji ber ko Korten lıîn jî tênegihîşt ka mersele çi ye, lıevkarê wî Haclı ew xist ronalıiyê. Ma ew, Korten, qe tênegihîştibûye, yan bi wî ve xuya nekiriye, ku Komîsar Beizmenne xwe bi mebest ji ser şêx re çedikiribûye û navê wî nedihanibûye ser zimên? Ma ne aşkere xuya dikiriya ku va kesa yek "ji yên me" bûye, û tevxweaxaftina wî ya di avrêjê de metodek bûye – bêguman baş nelıatibû bikarlıanîn – bi riya kîjanê wî lıewl dabû lıevkarên xwe bi bêtêlê di derheqê Götten û Blum de agalıdar bike û navnîşana Blum, ku wî nulıa dizanibû, bide wan da ku wan ew lıerdu ji haliyê xwe de têxistana bin çavan. "Û bêyî guman ji bo te diyar e, lıevkarê Birêz, ku di karnîvala îsal de kincên şêxên Ereban ji bo veşartina kîbûna merovan baştirîn ınetod in çimkî di rojên îroj de, ji ber sedemên berbiçav, şêx ji kawboyan(9) bêtir têyên hezkirin." "Gotinê naxwaze," got Beizmenne li dû şîrovekirina Haclı,"ku me ji destpêkê de dizanibû, karnîval ê ji bo çetayan derketinê lıêsan bike û ji bo me jî şopajotin û bidûketina wan ê dijwar bibe, loma, sîlı û şeş saetan ber destpêkirina karnîvalê me nehîşt Götten ji ber çavên ıne wenda bibe. Götten, yê ku kîbûna xwe bi riya lixwekirina çi kincên biyanî nedabû veşartin, di rawestekeke trimbêlan de, ji kuderê wî dû re otomobîleke Porsc-

he dizîbû, di mînîbûseke Volkswagen de şevekê razabû, dû re di qehwexaneyekê de xurniya xwe kiribû û di avrêja wê de rîhên xwe kurr kiribûn û kincên xwe guhertibûn. Me nehîşt ew deqeyeke tenê jî ji ber çavên me wenda bibe. Dora duanzdeh polîsên bi kincên şêxên Ereban, kawboyan û Spaniyan, hemû bi bêtêlên beriyan û bi rolên serseriyên temaşeyan û şûnên dansê, gîh li dû pêgên wî bûn, da ku di eynî katê de her kesê Götten li gel wan dida û distend bihata nasîn. Hemî kesên ku Götten ber gihîştina qehwexaneyê li gel wan axaftibû hatin bicîhkirin û pirs ji wan hatin pirsîn:

garsonekî barekê, li kuderê wî bîrayek vexwaribû;

du keçikên ku ew li gel wan di lokaleke beşê bajêr yê kevin de reqisîbû; karkerekî benzînxaneyeke li nêzikî Holzmarkt, li kuderê wî benzîn ji bo Porşeya hatî dizîn kirîbû;

rojnamefiroşekî taxa Matthiasstrasse;

karmendekî dukaneke cixareyan;

mamûrekî bankê, li cem kîjanî wî bi heft sed dolarên emerikî markên almanî kirîbûn, dolarên ku ihtîmal mezin e ji bankê hatibin dizîn.

Hevdîtina van kesan û Götten lihevrasthatin bû, ne bi tevdêr, û çi şopên bikarhanîna peyvên bi xwebêjên veşartî di navbera kesekî ji wan û Götten de tunebûn. Lê ez qe bawer nakim ku hevdîtina wî û Blum jî yeke bêyî tevdêr be.Axaftina bi telefonê li gel Scheumel, Gihîştina mala Woltersheim di katê de, herweha ew nebixêrdansa ji kûraniya dil û ji saniyeya yekem de tiji evîndarî – û çiqa zû ew li gel hev ji hundir çûbûn der – gişkî li dij dîtineke bêyî tevdêr in. Lê tiştê herî grîng ew e, wekî diyar e, wê hîştiye ew bêyî xatirxwaztin biçe û wê riyeke derketina ji xaniyê

apartmanan kiribûye ber wî ku ji dest hatiye bêyî ji haliyê yên xanî weqa bi miqayitî tehqîbdikirin de bête dîtin ji xênî derkeve. Me xaniyê apartmanan, beşê apartmana wê tê de, deqeyeke tenê jî ji bin çavdêriyê dernexist. Helbet ne tiştekî pêkan bû ku em tevahiya dorhaliyên xênî ku kîlometir û nîvekî çarkoşe ye têxin bin çavdêriyê. Gotinê naxwaze, wê riyeke revê dinasî û ew raber wî kir. Jê bêtir, çi guman li nik min nîne ku wê ji bo wî – heye ku ji bo hinên din jî – şûnên xweveşartinê didîtin, û ew baş dizane Götten nuha li ku ye. Malên ew tê de kar dike hatin lêniherîn, me li gundê ew jê hatî jî pirsî, û apartmana Xanim Woltersheim careke din, dema wê li vir îfade dida, bi tevahî di bin çavan re hat derbaskirin. Bêyî sûd. Ez baştir dibînim ku Blum ne girtî be da ku biçe cîhên ew dixwaze, da ku şaşitiyekê bike, û qe ne dûr e ku bi riya kesê mîrzamêvan şop biçe şûna xweveşartina Götten; û li cem min qe şik nîne ku peywendiya Xanim Blorna, ya ku em nuha herweha bi navê "Trudeya Sor" dinasin û dizanin ku ew di çêkirina nexşeyên xaniyê apartman de beşdar bûye, li gel riya reva Götten heye."

## 34

Divêt li vir bête diyarkirin ku vegera yekem li bûyerên li par hema hindik maye bi seri bibe da ku em ji roja îniyê bigihên şemê. Ta ji dest bête der, em ê bikin ku xetimandin, herweha tengasî û guvaştinên ne pêwîst cîh negirin. Cîhnegirtineke bi tevahî heye ku ne pêkan be. Heye ku bi kelk be em li vir bidin zanîn ku li dû kutabûna îfadeya dawîn, ya roja îniyê paş nîvro, Katharina Blum ji Else

Woltersheim û Konrad Beiters xwaztibû ku bila berê li gel wê biçin mala wê û – ji wan tika kiribû – bila tev wê rabin jor jî; gotibû ku, erê, ew ditirsiyaye. Wê roja pêncşemê bi şev, kurtekatekê li dû axaftina li gel Götten (yê ji derve de li merseleyê binihêre dê bikaribe bêtawanbûna wê bibîne çimkî wê, eger ne di dayîna îfadeyê de be jî, axaftina li gel Götten ji yên din veneşartibû!) tiştekî zor bed cîh girtibûye. Li dû axiftina li gel Götten, wê bihîstok li şûnê hîn vegerandibûye, venegerandibûye, telefon car din lêketibûye. Bi hêviya ku belkî dîsa Götten be, wê di cîh de bihîstok careke din rakiribûye lê li şûna dengê wî bibihîse yekî din bi dengekî "ecêb nizim," hema–hema "bi kustepistî" ji wê re "gotinên riswa" kiribûne, gotinên ne layiq, û tiştê herî nebaş ew bûye ku wî xwe wek kesekî ji danişţvanên apartmanên cînar dabûye nasîn, û gotibûye, eger meraqa wê yariyeke kûre bi şehwet bû, ma çima li derên dûr li kesekî digeriya, dema ku ew bi xwe, cînarê wê, amade bûye û dikaribûye hemî, erê hemî babet û çînikên nêzikyariyê ji bo wê pêşkêş bikirana. Rast e, kirina ew axaftina telefonê bûye ku hîştibûye ew di wê şevê de biçe mala Else. Ew bi tirs bûye, ji telefonê ditirsiyaye, û ji ber ku hejmara telefona wê li nik Götten, lê ne ya wî li nik wê, hebûye, ew hîn li benda telefonkirina wî bûye lê di eynî demê de ji telefonê ditirsiyaye.

Divêt li vir neyê veşartin ku li pêş Blum tirsên din jî hebûn. Yekem: Qutiya nameyan li derve ku ta nuha roleke pirr biçûk di jiyana wê de lîztibû; pirraniya caran wê pê ve diniherî ji ber ku her kes bi yên xwe ve dinihere, lê bêyî kelk. Di sibeya vê roja îniyê de, li milê din, qutî ta dêv tiji name bû bû lê ne nameyên dilşadkirina Katharina. Tevî

ku Else Woltersheim û Konrad Beiters gellekî bizav kiribûn ku nameyan û nivîsarên çapkirî ji destên wê dûr bihêlin jî, wê nepejirandibû, heye ku bi hêviya ku tiştekî ji Ludwigê wê di nav wan de hebûya. Wê li hemî kaxezên li holê – dora bîstan – seyr kiribû, yek bi yek, lê tiştekî ji haliyê Ludwig de di nav wan de nedîtibû û tevahiya gurzê kaxezan gêr çenteyê xwe kiribû. Siwarbûna asansorê ji bo rabûna jor jî bi jan bû çimkî du cînarên wê tê de bûn. Yek ji wan (bawerîkirina vê yekê çiqa dijwar be jî) peyakî bi kincên şêxên Ereban bû ku xuya dikir ew ji tevrabûna jor nerazî bû û ta dikare xwe guvaştibû quncekî asansorê, lê baş bû ku li qatê çarem çû der; û ya din (bi rastî jî tiştekî mathîştinê ye, lê tiştê bûyî bûye), ew jî jineke bi kincên endelusî bû, ya ku bi rûyê xwe yê di paş maskê de tew hewl jî neda ku xwe ji ber Katharina bilivîne, rasterast xwe da pêş wê û ew bi meraqeke hişk û aşkere ji serî ta binê lingan kir armanca "çavên xwe yên bêşerm, sar û qehweyî." Ew ji qatê heştem diçû jor.

Haydar bin: hîn xirabtir dibe. Bi ketina hundirê apartmanê re, ew di navbera milên Beiters û Woltersheim de bû, telefon lêket, û li vir stî Woltersheim ji wê bezatir bû, milê xwe ji yê wê hanî der, xwe gîhand telefonê û bihîstok rakir; rûyê wê tirş bû, zer bû, û deng jê hat der: "Hey tu qehpeya nale lê hatî, hey tu dêlik," û bi aqilmendî bihîstok danî kêleka telefonê li şûna ku li ser deyne.

Xanim Woltersheim û Beiters çi kirin jî, ji dest wan nehat der ku tiştên ji postexaneyê gihîştinî ji destên wê derînin. Wê tevahiya nameyan û nivîsaran, herweha du hejmarên ROJNAME'yê ji çenteyê xwe derxistin û xwazt wan îleh bixwîne, û xwendin jî!

Ne hemî name bênav bûn. Yeke ji wan, ya ku ji yên din tijitir bû, ji cîhekî ku navê "Tiştên Bêtir Şexsî bi Riya Wesandina bi Postayê" li xwe kiribû hatibû şandin, û tê de hemî babetên tiştên ku xwe bi têkiliyên cinsî ve peywendîgir dikin hebûn. Ji bo keseke hest–tenik wek Katharina va yeka tiştekî gellekî giran bû. Hîn xirabtir, kesekî bi tîpên mezin li ser kaxezeke çapkirî zêde kiribû: "Ev in tiştên ku keyfa merov rast tînin cîh." Bi kurtî – ya rast, bi hejmar – nivîsarên din ev ên li jêr bûn:

heft kartên bêyî nav, li pişta kîjanan vexwendinên seksuel bi şêweyên "kêmexlaqî û berbat" hatibûn nivîsandin, û kêmzêde di hemiyan de gotina "dêlika komonîst" hebû;

çar kartên bêyî vexwendinên seksuel lê tiji qiseyên bi nefret, ji "fîtoka sor" bigir ta "berdevka Kremlin;" pênc nameyên ku tê de beşên ji ROJNAME'yê hatinî birrîn hebûn, û li kêleka pirraniya wan (sê yan çar) bi rengê sor gotinên wek "çawa Stalîn negihîşt armanca xwe, tu jî nikarî" hatibûn nivîsandin;

du nameyên bi şîretên olî; di herduyan de jî li ser belavokên olî hatibû nivîsandin ku "divêt tu dîsa xwe fêre kirina nimêjê bikî, ey zaroka bextreşa wenda bûyî" û "xwe bi çogan bavêje ser erdê û tobe bike, Xwedê hîn dest ji te bernedaye."

Û di vê deqeyê de çavên Else Woltersheim li rûpeleke biçûk ket ku di bin deriyê apartmanê re gêr hundir bû bû, û baş bû ji dest wê hat ku vê kaxezê ji Katharina veşêre: "Tu çima kataloga min ya nayînê bi kar naynî? Ma divêt ez bexteweriyê îlleh li ser te feriz bikim? Cînarê te yê ku te ew wisa hi pozbilindî paş ve vegerandibû. Haydar be."

Destnivîs yeke qenc bû, û bi dîtina Else Woltersheim, xwediyê wê dê kesekî zanîngeh kuta kiribe, eger tew ne pijîşk be.

## 35

Tiştekî mathîştinê ye ku ne Xanim W., ne Konrad B.mat man, ne jî tiştek kirin, dema Katharina xwe gîhand bara xwe ya biçûk di salona daniştinê de û sê şûşeyên tiji sherry, whisky, meya sor û nîv şûşeyeke ji meya gulyazê, yek li dû ya din, bêyî xuyakirina çi nîşanên hestîn, bi dîwarên odeya daniştinê yên bêyî leke werkirin, şûşeyên ku bi gihîştina dîwaran re xinc–xincîn bûn û tiştên di xwe de tufe derve kirin.

Eynî tişt di mitbaxa xwe de jî kir, bi avêtina şûşeyên dimisê firengan, ava sîrkeyê û salçeya "worcester". Cîhê gotinê ye ku eynî kirin di serşokê de hat dubarekirin, bi guvaştina lûleyên melhemê û şikandina şûşeyên podrayê, û di odeya razanê de bi şikandina şûşeyeke ava kolonyayê.

Û ew di dema van kirinan de wek keseke bi tevdêr ji hestên xeyidandinê vala, meroveke bi kirina xwe bawer ku dixwazt yên din jî bi vê kirinê bawerkirin bide xuya dikir, ta wê radeyê ku Else W.û Konrad B.ji şûnên xwe neliviyan.

## 36

Gellek teorî hebûn, helbete, di derheqê wê yekê de ka Katharina kengê ramana kujtinê xistiye serê xwe, yan plana kujtinê çêkiriye û biryar girtiye wê bi kar wîne. Bi dîti-

na hindekan, yekemgotara ROJNAME'yê ya ku roja pêncşemê hatibû weşandin têrê dikir; lê bi ya hindekên din, roja îniyê ya girtina biryarê bûye çimkî di wê rojê de ROJNAME'yê hîn jî destê xwe ji sîngê Katharina bernedabûye û bûye sedema herimandina peywendiyên cîranî û reşkirina apartmanê di çavên wê de; herweha telefonkirina wî kesî, nameyên bênav; û hîn tew bi ser de hejmara ROJNAME'yê ya roja şemê, û ya yekşemê jî (li vir em pêşve diçine). Ma gelo texmînên wisa ne bêyî kelk in? Wê tevdêra kujtinê kiribû û bi kar hanî bû – de kî çi dibêje bila bibêje! Gotinê naxwaze "tiştekî ew êşandibû." Gotinên şûyê wê yê berê ew bi taybetî qeherandibûn, û tiştê aşkere xuya ew e ku gotara di ROJNAMEYA YEKŞEMÊ de hatî weşandin, eger ne bû be sedema vêxistina êgir jî, bêguman av jî bi ser de bernedabû.

## 37

Berî ku paşveçûn bi tevahî wek kutabûyî bête binavkirin û em car din xwe bi roja şemê gihînin, divêt tenê hîn tiştek di derbareyê êvar û şeva li dû îniyê de bête gotin ku xwe bi rewşa li mala Xanim Woltersheim ve eleqeqedar dike. Rewşa dawîn li wir: Yeke ecêb aram bû. Rast e, ji dest Beiters, çiqa ji dil hewl dabû jî, nehatibû der ku wê rabike dansê, tevî ku sêlik dabûn ser, tew mûzîka Emerîka başûr jî; herweha nedikaribû ROJNAME'yê û nameyan jî ji wê bi dûr xe, û gotina ku ev hemî ne tiştên grîng bûn û dirêj nedikir dê bihatana jibîrkirin, wê jî tiştek neguhertibû. Wî gotibû, ma xirabtirîn bûyer derbas nebûbûn, perîşantiya rojên zarokiya wê, zewaca li gel wî Brettlohê nizim-

nerx, kêvcîtiya alkoholê li nik diya wê û "bêyî zêdekirin, neçakiya sinçiyên diya te ku di eynî demê de bûbûn sedema derketina brayê te Kurt ji rê û rêçikên rast," ma hemî li paş nemabûn? Ma Götten ne li cîhekî bêyî tehlûke bû? Ma va dema salê ne ya karnîvalê bû, û rewşa wê ya aborî, ma ne baş bû? Ma kesên dilpak, yên wek Blorna û jin û mêr Hiepertz tunebûn, û heta ew kerê ezo be jî (hîn mîrzamêvan vekirî nedihat binavkirin), ma ew jî, li şûna ku merovekî bêbext be, ne qeşmerekî zimanxweş bû? Katharina ne li gel vê dîtinê bû û wê "ew gustîrka nebixêr û ew zerfa nepêwîst" hanîn bîra wan, gustîrk û zerfa ku ew herdu jî kiribûn tengasiyekê û hebû ku bibûna sedema cîhgirtina gumanan di derheqê şûna Ludwig lê dima de. Ma wê çawa dê bizanibûya ku va ramana vala ya di serê vî kerê bêhiş de hêjaye weqa dirav bûye? Na, na, wê ew wek qeşmerekî ku kenê merov pê were nedidît. Tew na. Dema li ser pirsine rojane hat axiftin – wek, eger ew ê ji bo xwe li apartmaneke din bigeriya, û dê ne baş bûya ku ew di derheqê şûna wê de biaxiftana –, Katharina xwe badabû û gotibû, ku nuha tenê tiştek di bala wê de hebûye, çêkirina kincên karnîvalê ji bo xwe, û wê ji Else tika kiribû ku rûşeltekê ji bo kurtedemekê bide wê çimkî kincên şêxên Ereban bûbûn mode û wê jî dixwaztibû ku roja şemê yan yekşemê bi kincên jineke Erebên Şawî "têkevim nav xelkê." Axiftinê domand û hati gotin ku bûyera cîh girtî weqa bed jî nebû. Eger merov rewş kûrekûr bida ber çavan , qe jî ne tiştik bû. Gotina bêtir di cîh de, ji haliyên wê yên xirab bêtir haliyên baş hebûn çimkî bivêt–nevêt Katharina li "kesekî ku ew li bendê bû" rast hatibû û li gel wî şeveke evîndariyê derbas kiribû. Rast e pirs ji wê hatin pir-

sîn, tew em bibêjin, îfadeya wê hat girtin, û divêt bête pejirandin ku Götten jî ne tenê "nêçirvanekî perperîkan" bû û ROJNAME jî her tiji gemara xwe ya her dem bû; çend bêşermên xwe bi nav nekirinî telefon kirin, hinên din nameyên bênav nivîsandin. Êh, ma jiyan nadomîne? Ma rewşa Ludwig ne rind e, û ma ji wê pê ve kesekî din haydare şûna wî ya rihet e? Em ê nuha qatek kincên Karnîvalê bidirîn û Katharina dê tê de bibiriqe; ew ê bi kirasê xwe, yê spî û bi kumik, xweşik û rindik "têkeve nav xelkê."

Û li dawiya dawiyê xurist jî mafê xwe dixwaze û merov xilmaş dibe, piçekî dikeve xew, bi xwe dihese û dîsa dikeve xew. Peyalekê tev vexwin? Çima na? Rewşeke aram: Jineke ciwan li ser dirûnê xilmaş bûye û li dora wê jinek û peyakî bi umir mezintir haydar û bi miqayitî difertiline da ku "xurist mafê xwe bigire." Xurist weqa xwedan maf e ku zengilê telefonê yê ku dora katjimêr dudu û nîvê sibeyê lêdikeve jî nikare Katharina ji xewê hişyar bike. Çima destên Xanimı Woltersheim ya hişyar ji nişkan ve dest pê dikin bilerizin dema ew xwe digihîne hacetê telefonê? Gelo ew bi tirs e ku kesekî bênav gotinên ji usûlê der dîsa bike, wekî ku ber çend saetan qewimî? Merov dizane ku dudu û nîvê sibeyê ne dema telefonkirinê ye lê li gel wê jî ew destikê telefonê radike, lê di cîh de Beiters ji dest wê digire û dema dibêje "halo" xet di cîh de tê girtin. Û careke din lêdikeve û dîsa, tew hîn deng nekiriye, tê girtin. Bêguman kesine hene ku dixwazin merov dîn bikin, li dû ku nav û navnîşan ji ROJNAME'yê dikevin dest wan.

Û di cîh de biryar tê girtin ku Katharina ji hejmara ROJNAME'yê ya roja şemê bête parastin lê ew fersenda

razana Else W.û rûkurkirina Konrad B.di serşokê de bi dest dixe, xwe dişemitîne der, di ronahiya berbangê de sandiqa ROJNAME'yê ya yekem vedike û tiştekî nebûyî dike, BAWERIYA ROJNAME'yê bi xelkê diavêje haliyekî û bêyî dayîna çi pereyan yekê derdixe! Li vir em dikarin bibêjin ku ji bo nuha paşveçûn bi seri dibe çimkî di vê demê û eynî şemê de Blorna û jina xwe mest, xeyidî û xemgîn ji trêna şevê têyên xwarê û eynî jimara ROJNAME'yê dikirin, da ku dû re li mal bixwînin.

## 38

Rewş li mala Blorna di vê sibeya şemê de bi carekê de ji xweşiyê vala ye, ne tenê bi encama şeva kêmzêde bêyî xew di nav hejandin û leqandina vagona razanê de hatî derbaskirin, ne tenê ji ber ROJNAME'ya ku, bi gotina Xanim Blorna, wek mereza reş e, li ku be jî xelasî jê tune; ne tenê ji ber telegramên lomekar ji dostên şûnbilind û hevalên kar û ji dezgeha "Lüstra" (ya Lüding – Sträubleder), lê herweha ji rûyê Hach de, ji bo kîjanî ew ji destpêka sibeyê de, pirr zû, telefon dikine (lê di eynî demê de pirr dereng çimkî ew tê digihên, ew ê gellekî baştir bûya eger wan roja pêncşemê telefon kiribûna). Dengê Hach dilovan nedihat; got, îfadegirtina Katharina bi seri bûye û ew nikare bibêje heke biryarên li dij wê dê bêyên girtin yan na; a nuha ji bo wê piştgirî û alîkarî divabûn, lê hîn ne yên qanûnî. Ma wan ji xwe bîr kiribûn ku ew di rojên karnîvalê de ne, ku abûkatên giştî jî maf hebûn piçekî vêsî bikin û wek yên din demên pîroz carine bi xweşî derbas bikin? De çawa be jî, ew hevnasên hev yên 24 salan in, li

gel hev çûne zanîngehê ye, bi hev re di şûnên teng de beşdar bûne, tev stirane, heta tevrêwîtî jî kirine, û merov ê xwe ji bo axaftina bi bêhna teng di destpêka peyivandinê de weqa nexeyidîne, bi taybetî dema merov bi xwe jî xemgîn û qeherî be. Li dawiyê hat tikakirin ku – û va gotina ya abûkatekî giştî ye – axiftina li ser vê pirsê dû re bi dev, ne bi riya telefonê, bidomîne. Erê, barê wê ne weqa sivik bûye, gellek tişt hîn bi tevahî di tariyê de bûne, lê bes e, pêkan e dûre, li dû nîvro, bi dev. Li ku? Li bajêr. Baştir e li pê. Di dalana entîkxaneyê de. Katjimêr çar û nîv. Telefone apartmana Katharina meke, ne jî ya Xanim Woltersheim, ne jî ya jin–û–mêr Hiepertz.

Kêfê Blornayan herweha ne di cîh de bû ji ber ku bandora nebûna destên tevdêrvan yên Katharina li wir weqa zû û aşkere diyar bû. Çawa dibe ku di nav nîv saetekê de weqa tevlihevî di hundirê malê de hatibû holê tevî ku wan tenê qehwe çêkiribûn, nanê hişk, rûn û hingiv danîbûn ser maseyê; û ew çend çente–menteyên xwe gîhandibûn eywanê. Û li dawiyê heta Trude be, ew jî hat enirandin çimkî mêrê wê car li dû carê jê pirsî ka di çi nuxteyê de merseleya Katharina û Alois Sträubleder, yan tew ya wê û Ludwig, dikaribûn xwe bi va gelşa Katharina ve peywendîgir bikirana, û çima li şûna ku ew bête alîkariya wî, wê tenê bi şêweya xwe ya bi qerf û pêkenîna bêmebest ku pirraniya caran li xweşiya wî diçû, lê ne vê sibeyê, nivîsarên di herdu hejmarên ROJNAME'yê de raber wî dikirin û dipirsî, eger peyveke di wan de bala wî nedikişand ser xwe, û dema wî pirsî, ka mebesta wê çi peyv bû, wê bersîv neda û bi tinaziyeke tiji qerf gotê, wê dixwazt bizanibe ka ew çiqa zû dikare tiştan di çav xwe re ke; û wî gotar dîsa û dîsa

xwend, "ew gemara bêxêr û nalelêhatî ya ku li ku be jî xelasî jê tune," û çiqa xwend jî wê peyvê ew haydare xwe nekir çimkî guhertina şêweya bersîva wî di derheqê Katharina de dabû rojnamevên û binavkirina jina wî wek "Trudeya Sor" hestê xeyidandinê li nik wî heku diçû kûrtir dikir ta ku êdî radest bû û bi sernizimtî daxwaza alîkariyê ji Trude kir û gotê: ew weqa bi hêrsê tiji bûye ku nema dikare hişên xwe bi hawayekî têkûz bi kar wîne, û li milê din, ew ji salan û vir de tenê wek abûkatekî pîşekariyê û gellekî kêm wek abûkatekî cînayî di kar de bûye. Wê jî bi hişkî gotê: "mixabin," lê dû re rehim ket dil û gote mêrê xwe, "ma qe peyva mîrzamêvan bala te nakişîne, tevî ku min bi xwe jî xwediyê telegraman wek mîrzamêvan bi nav kir? Ma gidiyekî wek vî Götten'î bi navê mîrzamêvan tê binavkirin. Helbete, na. Hele ji xwe re li wêneya wî binihêre; ew çi li xwe ke jî, ma kî dê wî wek mîrzamêvan bi nav bike?! Ma ne wisa ye? Cînarekî nekes ku amade ye agahiyan hema wise bide yên din, heye ku leqeba mêrmêvan lê ne mîrzamêvan li kesekî wisa bike; û ez ê xwe li vir di cîh de bikim remildar û bibêjim ku ji vir ta saetekê mîrzamêvanekî me jî dê bê, û ez di remla xwe de: teşqele, lihevnekirin û belkî tew dawiya hevaltiyeke bi salan dibînime, herweha serêşî li gel Trudeya te ya sor, û tev Katharina ku xwediya du sinçiyên tehlûke ye: dilsozî û serbilindî, ji serêşiyê bêtir; û ew ê çi caran li xwe nene ku wê riya revê raberî vî ciwanî kiriye, riya ku min û wê carekê tev lê niherî bû. Metirse, delalê ber dilê min, metirse: kesek pê nahise, lê rastî ew e ku di derheqê reva wî ji apartmanê de ya tawanbar ez im. Bêyî guman ji bîra te çûye ku di odeya min de tabloyeke xêz û nexşeyên rêçikên ha-

cetên germkirin, baderbaskirin, borî û têlên 'Koşkên Xweş li Kêleka Çêm' bi dîwar de bû. Rêçikên hacetên germkirinê sor, yên baderbaskirinê hêşin û yên têlan kesk xuya dikirin. Vê tabloyê weqa bi kûranî bala Katharina kişand ser xwe – wek tu dizanî ew bi xwe meroveke tertîbvan û tevdêrvan e, di vî warî de gellekî jîrek e – ku ew gellek caran li pêş wê radiwestiya û car li dû carê di derbareyê xwebêj û peywendiyên nuxteyên di "wêneya abstrakt" de – va nava wê dabû tabloyê – dipirsî, û hema hindik mabû ez kopiyeke wê pêşkêşê bikim. Ta radeyekê kêfxweşim ku min ew yeka nekir; ji xwe re bifikire dê çi bûbûya heke tiştekî wisa di mala wê de hatibûya dîtin! Teoriya dek û dolaban û şûna çekan ê bi seri bûbûya, herweha tevgirêdana 'Trude'ya–Sor–û–eşqiyan' û 'Katharina–mîrzamêvan.' Va plana dê ji bo hemî babetên dizan, yên tiştan û yên jinan, û ji bo kesên naxwazin bêyên dîtin wek riya çûn û hatina bi dizî bihata hesibandin. Min bi xwe ji wê re bilindî û nizimtiya hemî rêçikan hanî ser zimên: Li kuderê merov ê bikaribûya rast, li kuderê xûz biçûya, û li kuderê divabû merov bixuşiya eger têketina van rêçikan ji bo tamîrkirina boriyan û têlan pêwîst bûya. Va û ne yeke din e riya ku tê re Birêzê me yê ciwan û hêja, pêşabûn û destavêtina kîjanî Katharina dê nuha tenê di xewnan de bikaribe bibîne, ê xwe ji çav û lepên polîs filitandibe, û heke ew rast dizekî bankan e, ew ê di cîh de ketibûya ser metodên nexşeyê – ne dûr e ku mîrzamêvan jî bi eynî rê çûbe û hatibe. Ji bo xaniyên apartmanên nûjen şêweyên payînê yên ji bo şûnên kevin dibin ne munasib in. Eger rojekê fersend ketê polîs û dayîreya abûkatiya giştî di derheqê vê yekê de agahdar bike. Ew deriyên mezin, heye ku herweha

eywana têketinê û asansorê, dipên, lê ji wan pê ve asansoreke karkeran jî heye ku rasterast diçe zêrzamiyê, û ji wir yek dikare li ser zik û çogan du–sê sed metro bixuşe , li derekê devpoşê herqeke binzemîn rake û xwe bike xwê û bihelîne. Ji min bawer bike: ji hêviya ji xwedê pê ve tiştekî kirinê nemaye çimkî Alois hewcedarê çi be jî, ew ne hewcedarê sernivîsarên ROJNAME'yê ye. Tiştê nuha ji bo wî divêt tiliyên alîkar in ku li dû kutabûna hûrlêniherînên bi merselê ve girêdayî bikaribin di dema nivîsandina raporan de rolekê bilîzin; û tiştekî din ku wî qasî sernivîsarên ROJNAME'yê ditirsîne rûyê tirş û tehl yê keseke bi navê Maud e, jina wî ya li gor erf û adetê, diya çar zaroyên wî. Ma te qe di çav xwe re nekir, çawa ew çend caran wek 'ciwanekî dilşad' û bi kêfxweşî – divêt bibêjim, herweha bi zimanxweşî û dostanî – li gel Katharina rabû dansê û çawa wî dixwazt ku îlleh wê bi mal gihîne û çonî wek zarokekî dilşikestî xuya dikir dema Katharina otomobîla xwe kirî? Va bû tiştê ji wî kêm, tiştê ku dilê wî weqa diqaqijî ser, keseke zehf şêrîn wek Katharina, yeke ne hêsan, lê di eynîdemê de – çi ye ew navê peya lê dikin – ha, erê, dilovan, giran lê herweha ciwan, wesfên ku haya Katharina bi xwe ji wan nebû. Gelo dilê te yê peyayî jî carine bi dîtina wê şad nedibû?"

Erê, erê, rast e: wê dilê wî yê peyayî şad dikiriye, wî înkar nedikir, herweha dipejirand ku ji bo wê cîhekî nemaze di dilê wî de hebû, û wê – Trude – bi xwe jî dizanibû ku dilê her merovî, çi jin, çi peya, yekcaran hembêzkirina merovekî/e din meraq dikir, tew heye ku jê bêtir, lê Katharina, na, di derheqê wê de tiştek li holê hebûye ku dê ew çi caran li deriyê wê nekiribûya mîrzamêvanek – û eger

tiştek ketibûya navbera wî û daxwazeke wisa, ya rastir, hewldana ji bo armanceke wisa, ew tişta, wê bêguman mebesta wî fêhm dikiriye, ne hurmeta yan nerxdana ji bo xatirê wê, Trude, bûye lê hurmeta ji Katharina bi xwe re; erê, hurmet, hema hema bilindgirtin, bêtir bilidgirtineke tiji evîn ji bo, merov çi bibêje, ji bo dilpakiya wê – û bêtir ji dilpakiyê, tiştekî ku ji dest wî nedihatiye têxe bêjeyan. Dilhonikiya Katharina ya ecêb û şêweya ku wê çawa jiyana xwe ya ji şahiyê vala ji nû ve û bi tevdêr li riya rast siwar kiribûye ku li nik wî– yê ku panzdeh salan ji wê mezintir bûye û di jiyana xwe de, xwedê dizane, gihîştibûye gellek armancan jî – rêzgirtina ji wê re hanîbûye holê. Eger ramanake yariya li gel Katharina di serê wî de cîh girtibûya, va rêzgirtina ji wê re bûye ku dê nehîştibûya va ramana xwe pêş ve bibe ji tirsa ku tiştekî wisa yan ew yan jiyana wê biherimanda, çimkî ew meroveke hestenik bûye, pirr zû dihatibûye êşandin; û eger xuya bûbûya ku mîrzamêvan rast Alois bûye, wî – aşkere digotiye – dê yek "biavêtaya çengeya wî;" erê, ji bo wê alîkarî divabûye; van dek û dolaban, van pirskirinan û va îfadegirtina ne karê wê bûn – û dem jî nuha bi ser ketibûye, û divabû wî îlleh, bi çi hawayî dibe jî, ber derbasbûna rojê Kathrina bidîtiya,... Li vir Trude ew ji raman û tevdêrên di serê wî de cîh digirtin, bi şêweya xwe ya bêyî hempa hişyare hatina kesekî kir: "Trimbêla mîrzamêvên gihîşt."

## 39

Divêt li vir bête diyarkirin ku Blorna yek neavêt çengeya

Alois Sträubleder yê ku rast bi trimbêleke nerxbilinde hatî kirêkirin gilıîşt. Ji bo me ne tenê rijandina xwînê navêt lê herweha pevçûn, û eger pevçûn dike îlleh hebe, bila ta ku ji dest tê hindik be, li gor mercên nivîsandina raporan be. Xwebêja vê gotinê ne ew e ku rewşa di mala Blorna de ber bi xweşiyê hat guhertin, li bervacêya wê: rewş sartir bû çimkî Trude nikaribû xwe bigirta. Wê tevdana qehweya xwe domand û bi van peyvan bixêrhatina Sträubleder kir: Roj baş, Mîrzamêvan." Wekî ku fedîkar derketibe, Birêz Blorna got, "Bawer im Trude dîsa rasterast çû merseleyê." "Erê," got Sträubleder, "lê pirs ev e: gelo axaftina wê tum bi usûl be?"

Pêwîst e li vir bête gotin ku navbera Trude Blorna û Alois Sträubleder demekê gilıîştibû radeyeke zor bed, li dû ku wî, eger hewl nedabe wê têxe bin lihêfê jî, kiribû ku xwe nêzike wê bike; û wê jî – bi şêweya xwe ya hişk – jê re ragîhandibû, ew di serê xwe de wisa bawer e ku jinan nikaribûn xwe li hember wî ragirtana, lê rastî tiştekî din bûye. Dema merov rewşê wisa bizanibe, dê têbigihê çima Birêz Blorna Sträubleder di cîh de bir odeya karê xwe û ji şûya xwe tika kir, bila wan bi tenê bihêle û di navberê de ( "di navbera çi de?" Xanim Blorna pirsî bû.) çi ji dest wê dihat bike da ku Katharina bi cîh bike.

## 40

Çima odeya karê merov ji nişkan ve lê dibe xuh, wekî ku her tiştê tê de tevlihev û gemarî bibe tevî ku tiştekî toz girtibe naxewine û her tişt di cîhê xwe de ye? Çima madeya yekî ji va kursiya bi çermê sor li hev dikeve, kursiya

ku li ser wê weqa karên bi dohn bi dest ketine û gotinên bi dizî hatine kirine, ew'a ku merov dikare bi rastî jî rihetiya xwe li ser bibîne û guhdare mûzîkê bike? Û heta refên pirtûkan bin jî, çima dîtina wan yekî bêhnteng dike; û ew wêneya bi destê Chagall hatî îmzekirin wisa li ser dîwêr xuya dike, wekî ku ji haliyê hunermend bi xwe de hatibe sextekirin? Xwelîdank, heste, şûşeya wîskî, ma wan bi yekî çi kirine, ew tiştên ku nerxê wan jî giran e, ku yek li dij wan be? Çi rojeke ne xweş li dû şeveke mestkirinê tîne holê û navbera du hevalên kevin dike wek barûta li teqandinê? Çiyê merov li dij van dîwarên bi rengê zerê tarî hatinî neqişandin û bi grafîka nûjen hatinî xemilandin heye?

"Belê, belê," got Sträubleder, "ez tenê ji bo tiştekî hatim; da ku bibêjim, alîkariya te di derheqê vê pirsê de êdî ji bo min navêt. Tu dîsan bizdoyîn bûyî, li balafirgehê, di mij de. Saetekê li dû nemana wêrekiyê yan sebrê li nik we mij rabû, û li gel derengiyê jî hûn ê dîsa bikaribûna katjimêr 18.30 bigihîştana. Eger hûn bi bêhneke piçekî fireh di merseleyê de ponijiyabûna, we dê ji balafirgeha Münşin re telefon kiribûya û agahdar bûbûna ku balafir dîsa di katên xwe de radibûn. Lê ji xwe bîr bike. Ya rast ew e, heta eger mij nebûya jî hatina te dê her dereng bûya çimkî beşê grîng yê îfadegirtinê dê kuta bûbûya û te dê nikaribûya tiştekî bidî guhertin."

"Her çawa be jî, ez bi ROJNAME'yê nikarim," got Blorna.

"Rojname ne tehlûke ye," got Sträubleder," Lüding ew haliya nixamtiye, lê ji bilî wê jî rojname hene, û ez dikarim barê her sernivîsarê hilgirim, tenê ne ew'ên min li gel

eşqiyan peywendîgir dikin. Têkiliya li gel jinekê dê pirr–pirr gelşên şexsî ji bo min wîne holê, ne yên giştî. Wêneyeke li gel jineke çelenge wek Katharina, ew jî çi zirarê nagihîne min. Jê pê ve, dest ji teoriya mîrzamêvan jî berdan; û rast e, min gustîrkeke nerxbilind diyariye wê kiribû ku hat dîtin, û min du–sê name jî nivîsandibûn ku ji wan tenê zerfek hatiye bidestxistin, lê ne ji wan, ne jî ji gustîrkê çi serêşî dê bêtên holê. Nûçeya ne baş ew e ku va Tötgesa di bin navekî din de ji weşanine din re jî dinivîsîne û ROJNAME maf niye wan nivîsaran têxe nav rûpelên xwe û, belê, Katharina pejirandiye li gel wî di hevpeyvînekê de beşdar bibe. Min ber çend deqeyan va yeka ji Lüding bihîst ku cîhgirtina hevpeyvînê wek tiştekî baş dibîne çimkî ji ROJNAME'yê, wekî min got, çi zirar nagihê min lê di derheqê karê wî yê ji bo weşanên din de, berhemên ku ew bi riya kesekî din digihîne wan, tiştek ji dest me nayê der. Wisa xuya ye ku te hay ji tiştekî tune, ne wisa ye?"

"Na, min hay ji tiştekî tune," Blorna bersîv da.

"Bihîstina vê yekê ji abûkatekî ku çawa be jî dawiya min di dest de ye tiştekî mathîştinê ye;" got Sträbleder; "sedema vê yekê jî ew e ku hinan kata xwe di trênên virde–wêde dileqin û dihejin de derbas kirine li cîhê ku xwe agahdare rewşa hewa bikin da ku bizanibin mij dirêj nake dê rabe. Wisa diyar e ku te hîn li gel wê neaxiftiye."

"Na," got Blorna, "lê te?"

"Rasterast, na," got Sträubleder, "tenê dizanim ku wê saetekê berê telefone ROJNAME'yê kiriye û soz daye, ew ê sibe li dû nîvro li gel Tötges di hevpeyvîneke taybetî de beşdar bibe. Tiştekî din jî heye ku min zor balmijûl dike,

pirr û pirr, ji kerban zikê min diêşe (li vir rûyê wî hema–hema xemkêş xuya kir û dengê wî xemgîn hat bihîstin). Ji sibe û pê ve tu dikarî li gor keyfa xwe gotinên neqenc ji min re bikî çimkî ez ne layiqî baweriya we bi min hanîbû bûm lê çawa be jî em li welatekî ku bi rastî azad e dijîne ku tê de merov maf heye jiyana xwe ya evîndariyê li gor meraqa xwe bi rê ve bibe, û bila baweriya te hebe ku ez amade me bi hemî şêweyan alîkariya wê bikim; heta bi rûmeta min be, ez amade me ji bo xatirê wê têxim tehlûkeyê çimkî – erê, tu bikene – ez ji vê jinê hez dikim: lê alîkirin êdî ji bo wê bêkelk e, – ji bo min hîn bi sûd e – ew nahêle kesek biçe alîkariya wê."

"Lê ROJNAME?" pirsî Blorna, "tu nikaribî wê jê biparêzî?"

"Ne li vê radeyê, lo," Sträubleder bersîv da, "Hewce nake tu ceddîyeteke wisa bidî nivîsarên ROJNAME'yê, tevî ku wan hûn piçekî xistin nav devikê maşeyê jî. Bila em li vir li ser rojnamevaniya arzan û serbestiya weşanên giştî nekevin yaxeya hev û din. Em dirêj nekin. Min dixwazt di dema hevpeyvînê de tu jî amade bûyayî, wek abûkatê min û wê. Ez te haydar bikim ku nuxteya herî tehlûke ta nuha hîn ji îfadegirinê û rojnameyan der maye: Şeş heyvan berê min bi wê da pejirandin ku kilîta xaniyê me yê duyem, yê li Kohlforstenheim, ji min bigire. Kilît ne li mala wê, ne jî li gel wê, dîtine lê bi wê re heye, yan bi kêmasî hebû, eger çenekiribe. Ji haliyê min de sedem tenê hesteke atifî bû, çi navî lê dikî bike; min meraq dikir ku kilîteke xênî li nik wê hebe çimkî min nedixwazt hêviya ku ew ê rojekê li min bibe mêvan di dilê min de vemire. Ji min bawer bike ku ez ê çûbûma alîkariya wê, min ê piştgiriya wê kiribûya;

heta ez ê çûbûma da ku bibêjime wan; binihêrin, mîrzamêvan ez im lê ez baş dizanim, ew ê li min xwedî derneketiba; li Ludwigê xwe, erê."

Tiştekî bi carekê de nû ku yekî ji Sträubleder hêvî nedikir di rûyê wî de xewan bû, tiştekî ku hestê meraqê li nik Blorna hişyar kir û hindik mabû dilê wî bi Sträubleder bişewitîne, tiştekî wek xwebiçûkdîtinê, yan gelo bizaveke xapandinê bû ji haliyê wî de?

"Ev çi mersele ye," pirsî Blorna, "xişir, name û nuha jî kilît?"

"Lo, de bes e êdî, Hubert. Ma tu hîn jî tênegihîştiye? Di derheqê vê pirsê de ez hîn nikarim li gel Lüding biaxifim, ne jî li gel Hach û polîs. Çi guman li nik min nîne ku wê kilît daye Ludwigê xwe û wî xwe ji du rojan û vir de li wir veşartiye. Ez bi tirs im, li ser Katharina, li ser wî xortê ehmaq ku pêkan e xwe di xaniyê min yê li Kohlforstenheim de veşartibe. Xweziya ji wir dehf bûbûya ber bête girtin lê li milê din, xweziya ew bigirtana da ku dawiya vê merseleyê bihata. Ma tu êdî tê gihîştî? Û şîreta te çi ye?

"Tu dikarî telefone wir bikî, xaniyê li Kohlforstenheim."

"Û tu dibêjî, eger li wir be, ew ê bersîvê bide?"

"Yan jî telefone polîs bike, da ku bêtarek cîh negire. Çi riyên din tunene. Eger te nexwazt navê xwe bidî, mede. Çiqa pêkaniya hebûna Götten di xaniyê te de biçûk be jî pêwîst e tu polîs agahdar bikî. Heke tu nekî, ez ê bikim."

"Da ku xaniyê min û navê min li dawiyê îlleh di rojnameyan de bi eşqiyan re peywendîgir bibin? Riyeke din di bala min de hebû: min got belkî te biajota wir, mebesta min Kohlforstenheim e, wisa, wek abûkatê min, da ku li

wir rewşê bidî ber çav"

"Nuha, di vê gav û demê de?" pirsî Blorna. Di şema karnîvalê de, ku ROJNAME hay jê heye min îzna xwe ji nişkan ve kurt birrîye? Gelo ew ê çawa li vê kirinê binihêre? Abûkatekî navdar, abûkatekî pîşekariyê, xwediyê koşkeke bi hewz, mêrê "Trudeya Sor" îzna xwe li cîh dihêle da ku biçe serîkî li xaniyê te yê dawiya hefteyan xe? Da ku binihêre, eger tiştek bi sarincê hatibe, yan hacetê dûzana germahiyê baş hatibe eyarkirin; eger çi cam hatibin şikandin, di bara te de tiştên vexwarinê têrê bikin; yan da ku binihêre eger çi şêdarî gihîştibe rûşeltên te, hah? Ma gelo tu rast gaveke wisa di cîh de dibînî, di demekê de ku Birêzên ji ROJNAME'yê hemî gavên min dipêne. Ma ez hema ji vagona trênê, kêmzêde, rasterast berê xwe bidim koşka te da ku seyr bikim eger pîvok li derketinê ne yan kulîlkên spî seri hildane? Gelo tu rast vê rê di cîh de dibînî tevî ku vî Ludwig Göttenê hêja berê raber kiriye ku ew nêşandarekî jêhatî ye?"

"De bes e, lo," got Sträubleder, "bawer nakim cîh li vir ji qerf û henekên te re mabe. Tika dikime tu wek abûkat û dostê min qenciyekê bikî ku ji çeyîke şexsî bêtir pêwîstiyeke hemwelatî ye; û tu hîn ji min re gotina kulîlkên rengspî dikiye. Ji doh û vir de mersele weqa kerr û nixamtî maye ku heta ji wir be jî (navenda polîs) hîn ta nuha çi agahî negihîştine min. Agahiyên di dest me de hemî ji ROJNAME'yê ne, ew jî bi xêra Lüding yê ku tê de kesên cîhbilind dinase. Navendên polîs û abûkatiya giştî di derheqê vê merseleyê de tew êdî telefona şalyariya kar û barên hundirîn jî nakine, şûna ku Lüding tê de herweha kesên şûnbilind dinase. Mersele yeke jiyan û mirinê ye, Hu-

bert."

Di vê deqeyê de Trude, di destan de radyoyeke biçûk, bêyî ku li dêrî xe derbas hundir bû û bi dengekî nizim got: "mirin ji navberê rabû, êdî mersele ya jiyanê ye; spas ji xwedê re. Lawik girtin, yê ku ji ehmaqiya xwe teqîn li polîs kiriye û bi gulleyên wan brîn bûye lê ne di tehlûkeyê de ye. Di baxçeyê xaniyê te de, Alois, li Kohlforstenheim, di navbera hewzê avjiniyê û erşa tirî de. Gotina koşkeke bi sedhezaran ya hevalekî merovekî bi navê Lüding dikine. Û tiştekî din têye gotine; ew jî diyar dike ku bi rastî hîn mêrên baş hene: Yekemgotina vî dostê me yê bi navê Ludwig ew bûye ku tiliyên Katharina bi carekê de di vê merseleyê de tunebûne, ku hevnasiya wî û wê bi tevahî pirseke evîndarî û şexsî bûye û peywendiya xwe li gel kirinên neqanûnî ku dixistine stuyê wî tunebûye, wan kirinên ku di derheqê wan de wî xwe her bêtawan didabûye zanîn. Heye ku pêwîst be tu çend pencereyên şikestî bi cam bikî, Alois; gellek gulle hatine avêtine. Tu hîn nehatiye binavkirin lê li gel wê jî, heye ku baştir be tu telefone Maud bikî ya ku nuha, gotinê naxwaze, gellekî hêrs bûye û hewcedare piştgiriyeke nefsî ye. Rast erê, tiştekî din jî: Sê kesên ku dibêjine ew hevalên Götten in, ew jî di eynî demê de li şûnên din hatine girtine. Dibêjine ku van bûyeran ji bo komîsarekî polîs, bi navê Beizmenne, serkeftineke mezin e. De rabe, Aloisê hêja, rabe, carekê li jina xwe ya çak jî bibe mîrzamêvan."

Ne dijwar e merov tê bigihê ku di vê deqeyê de rewşa di odeya Blorna ya kar de gihîştibû radeya pevçûnê, tiştekî ku bi carekê de li şêwe û hawayê raxistina odeyê nedihat. Dibêjine –dibêjine–, ku Sträubleder rast jî kiriye ku dest

biavêje qirika Trude Blorna lê mêrê wê nehîştiye û gotiye Sträubleder, ku bêyî guman mebesta wî ne lêxistina xanimekê bûye. Dibêjine –dibêjine–, Sträubleder jî li wî vegerandiye, ku wî bawer nedikiriye leqeba "Xanim" ji bo jineke wisa zimandirêj di cîh de bûye, ku peyvine hebûne yên ku divabûn carine nehatana bikarhanîn, bi taybetî di demên xenıgîniyê de. Herweha gotibûye, heke ew careke din, hema careke tenê, peyvên wisa dagirtî bibihîse, êdî –de baş e, êdî çi–, erê, êdî dan û stendina di navbera wan de dê nemaya. Ew hîn ji hundir derketibû, derneketibû, û berî ku fersend têkeve dest Blorna da ku bibêje Trude ku wê îcar bi rastî jî piçekî zêde kir, dema wê axiftina wî di dêv de birrî û ragîhand: "Şeva borîn diya Katharina miriye. Min ew li Kuir–Hochsackel bi cîh kir."

## 41

Ber em dest bi badandin û minawereya xwe ya dawîn bikin divêt rê ji bo haydarkirineke teknîkî bête dayîn. Di vê serpêhatiyê de gellek tişt cîh digirine. Ew ta radeya şermezekirinê û dijwarkirina birêvebirina wê bi bûyeran dagirtî ye: tiştekî ku ji bo berjewendiya wê zirar e, ne kar. Gotinê naxwaze ku kujtina rojnamevanekî ji haliyê karkereke malxevaniyê de tiştekî xemkêş e û bûyereke wisa pêwîst e bête şîrovekirin, yan bi kêmasî bizav ji bo wê yekê bête kirin. Lê li milê din, di derheqê abûkatên bi nav û deng de ku rojên îzna xwe li şûnên şemitandina ser befirê, îzna ku bi xuha eniyê hatiye bidestxistin, ji bo xatirê karkereke hundir malan kurt dibirrin; de di derheqê wan de merov dikare çi bike? Û di derheqê xwediyên dezgeh û karxane-

yan de (yên di ber re her weha profesor in , yan di nav partiyên siyasî de xwediyên rolan in) yên ku ji bo xatirê evîneke encamvala bi zorê kilîtên xaniyên xwe yên li çolê (û herweha xwe jî) gêre beriya vê karkera hundir malan dikin; û wekî diyar dibe bêyî ku bigihên armancên xwe; ew'ên cîhgirtina propagandeyê ji bo navên xwe dixwazin lê bi şertê ku tenê ji bo berjewendiya wan be; de di derheqê wan de çi dikare bête kirin? Û di derheqê wan bûyer û kesan de ku berbihevhanîna wan, yan berbiçavhanîna wan, ne tiştekî pêkan e, ew'ên ku pirr caran nahêlin ku av di herqa xwe de (bi gotineke din, proseya cîhgirtina bûyeran) ber bi pêş biçe çimkî, em bibêjin, ew di paş perdeyan de hatine veşartine; de di derheqê wan de çi dikare bête kirin? Û di derheqê polîs de merov ê bikaribe çi bike, ew'ên ku gellek caran "tapên guhan" (mebest rêdana guhdarkirina xetên telefonê ye: Wergêr) dixwazin û bi dest jî dixin? Bi kurtî: legan bi qulikan dagirtî ye, lê di eynî deınê de ava ji van qulikan tête der çi sûdê nagihîne kesê serpêhatiyê pêşkêş dike. Erê, li ser vî yan wî tiştî kesek (kesekî wek Hach û mamûrine polîs, mêr û jin) dikare biaxife lê ji gotinên wan peyvek jî çi sûdê nayne holê ji ber ku kesek ji wan ne amade ye di dadgehê de îfadeyê bide yan devê xwe veke. Van şêwegotinan ne çi îspatên rêk û pêk in! Çi sûda giştî nagihînin vê merseleyê. Nimûneyek: tevahiya pirsa bi "tapên guhan" ve girêdayî. Bêguman ew ji bo bidestxistina agahiyan tête bikarhanîn lê ji ber ku van agahiyan ne ji lênerînên polîs lê ji çaviyeke din hatine girtin, navêt ne di dadgehê de behsa wan bête kirin, ne jî gotina cîhgirtina şêweya bidestxistina wan bête ser zimên. Ber her tiştî: gelo çi di serê kesê ku guhdare

axaftina xelkê dike de cîh digire, mamûrê bêtawan ku tenê karê jê hatî xwaztin dikêye ku em dikarin bibêjin neçar e bi vî karî rabe, kesê ku em dikarin bibêjin, eger tew ne ji bo bicîhkirina fermanekê be jî, ji bo pariyê nanê xwe (heye ku li dij daxwaza xwe) vê kirinê dikêye; gelo va kesa çi diponije dema ew neçar dimîne guhdare axiftina di navbera du kesên din de bike; em bibêjin: di navbera daniştvanekî xaniyên nerxbilind ku nêzikîxwaztinê pêşniyar dike û meroveke gellekî baş, jîr û kêm–zêde bêleke de, yeke wek Katharina Blum? Gelo hestên wî yên moralî lê yên seksuel, yan her du jî, dilipitin? Gelo hestên hêrsbûnê li nik wî radibin lê yên dilpêşewitandinê, yan heye ku ji usûlê der yên kêfjêrehatinê, dema meroveke ku navê "rahîbe" lê hatiye kirin bi encama bihîstina peyvên ji dengekî zivir yê kesekî li serê wê bûyî bela di kûraniya canê xwe de brîndar dibe?

Hemî van tiştan li wî haliyî cîh digirine, hîn gellekên din jî li vî haliyî. Gelo mamûrê bêziyan yê tehqîbkirina axaftinên telefonî ku ji bo bidestxistina nanê xwe di kar de ye çi diponije dema kesekî bi navekî wek Lüding, kesê ku hindek caran di vê serpêhatiyê de hatiye binavkirin, telefone sernivîsarê ROJNAME'yê dike û kêm–zêde dibêje wî: Di cîh de S. jê derîne û graniyê bide ser B.? Gotinê naxwaze ku xeta telefona Lüding jî tête tehqîbkirin, ne ji ber wê yekê ku axiftina wî pêwîst e bête guhdarkirin, lê ji ber rêgirtina li tehlûkeyê eger hat û kesekî ji ew'ên gefandina ji bo girtina diravan ji xwe re kirinî kar, yan neyarên siyasî, yan diz û yên din ji wî re telefon kirin. Ma tevguhdarekî bêtawan ê çawa bizanibe ku S.xwebêja Sträubleder dide û B.xwebêja Blorna, ku bi encama vê tevaxaftinê

merov ê di rûpelên ROJNAMEYA YEKŞEMÊ de tiştekî di derheqê S.de nema bibîne lê pirr di derheqê B.de? Ma kî dê bizanibe ku ki gel daxwaza tiştekî wisa jî Blorna di çavên Lüding de abûkatekî pirr jêhatî ye û jîrbûna xwe li gor mewziyeta herêmî û navneteweyî îspat kiriye? Dema em li şûnên din gotina çaviyên ku "nikarin tevlihev bibin" dikin, tiştê ku dikeve bala me çîroka mîrekî û mîrekê ye finda kîjanan bi pufkirina rahîbeya şaş re tête vemirandin – û kesek dikeve ava kûr û difetise.

Û li vir Xanim Lüding ji aşpêja xwe daxwaz dike, bila ji sekretêra mêrê wê re telefon bike, ka Lüding roja yekşemê ji bo paşxwarina xwe çi dixwaze, şillikê bi tovên xeşxaşê li gel dondermeyê û qeymêx, lê tenê li gel dondirmeyê? Û sekretêra ku naxwaze serokê xwe aciz bike lê dizane ew ji çi hez dike, yan belkî tenê ji bo teşqeleyan bi rê xe, bi dengekî hişk bersîvê dide ku ew baş dizane, Birêz Lüding vê yekşemê karamêla bi aqît dê baştir bibîne. Aşpêja ku, bêguman, herweha dizane Birêz Lüding ji çi hez dike napejirîne, axaftina wê dibirre û dibêje, tiştekî wisa ji bo wê nû ye û heye ku ew tiştê wê bi xwe jê hez dikir û tiştê ku Birêz Lüding jê hez dikir li nav hev xistibin; û eger bikaribûya bi kerema xwe xeta wê û ya Birêz Lüding bigîhandana hev da ku wî bi xwe diyar bikira ka ji bo paşxwarinê çi dixwazt. Li dû vê gotinê sekretêra ku carine bi serokê xwe re dihere konferensan û di xwaringehên otêlên mezin de li gel wî dixwe, dibêje, dema ew bi wî re bûye mîrza Lüding karamêla bi aqît li dû xwarinê dixwaztiye. Îcar aşpêj: Lê vê yekşemê ew ne li gel wê, sekretêrê, rêwî bûye. Heye ku wî xwarina xwe li gor kesên li gel wî dixwarin dibijart. Û herweha û herweha. Dû re gotûbêjeke dûr û di-

rêj li ser şillikê bi tovên xeşxaşê cîh girt – û tevahiya vê axiftinê li ser hesabê hemwelatiyên ku bacê didin li ser teypê tête girtin! Û yê ku xeta telefona ofîsa wî tehqîb dike pêwîst e guh baş bide ser axaftinê, ka çi peyvên li gor şifreya anarxîstan nedihatin bikarhanîn; gelo peyva "şillik" xwebêja bombeyên destan nedida, û gelo mebest bi "şillikê li gel dondirmeyê" ne bombe bûn? Li ınilê din, heye ku va merova li dû bihîstina vê şêweaxaftinê xwe bi xwe re bibêje: Ma hin kesan jî gelşên xwe hene! Yan: xweziya min jî gelşên wisa hebûna! Çimkî heye ku merovê guhdar yekî bi derd û kul be. Heye ku keça wî hîn nû ji mal reviyabe, yan kurê wî dest bi kişandina heşîşê kiribe, yan kirêya xaniyê wî dîsa rabûbe. Û va hemî (guhdarkirina xeta telefonê û dagirtina li ser teypan) ji ber ku carekê gef bi riya telefonê li Lüding hatibûn xwarin ku bombeyek ê di ofîsa wî de bête bicîhkirin. Û li dawiyê mamûrê bêtawan tê digihê şillikê li gel tovên xeşxaşê çi ye, ku nanikekî vê paşxwarinê dikare têre şîva wî bike.

Weqa bûyer li haliyekî cîh digirine û me hay ji bûyerên li wî halî cîh digirine tune. Bila merov hema bikaribûya guh bida gotinên li ser teypan! Merov ê têbigihîşta ka nêzikbûna di navbera Else Woltersheim û Konrad Beiters de ta çi radeyê kûr e, yan eger herdu nêzikî hev û din dibûn! Ka peyva "dost" di têkeliya di navbera herduyan de çi xwebêj heye. Gelo Else bi navê delalo, evîndaro, yan tenê Konrad, yan belkî Konnî, ew haydar dikir? Gelo çi babetên lêkerên xwebêja nêzikbûnê didan di navbera wan de dihatin bikarhanîn? Gelo Konradê ku dibêjine dengê xwe xweş e ji wê re distira dema bi telefonê li gel wê diaxift – eger ne wek dengbêjekî konseran be jî, bi kêmasî

wek yekî ji komeke dengbêjan –? Stiranên nûjen? Helbestên opera? Yan gelo, tew bi şêweyeke vekirî û bêvac li ser nêziktêkiliyên demên borîn û tevdêrên ji bo yên li pêş axaftin dibû? Merov, erê, dê bixwazibe tiştên wisa bizanibe çimkî ji bo pirraniya merovan ne tiştekî pêkan e ku ew bi riya hêza mêjî dûredûr li gel hev û din bidin û bistînin. Loma, ew baştir dibînin ji bo van armancan telefonê bi kar wînin. Gelo kesên karbidest dizanin karê guhdarkirina axaftinên di telefonê de çi bi hişên mamûrên di vî karî de tîne û çi bandorê li rewşa wan ya nefsî dike? Ez bibêjin, jineke bêvace ku lê ketine gumanan e û xeta telefona wê têye tehqîbkirine telefone hevalê xwe yê tevrazanê kir, hevalê ku herweha wek wê bêvac e. Ji ber ku em di welatekî azad de dijîne û dikarin wek daxwaza xwe bipeyivin, herweha di telefonê de; de ji xwe re bi bîr wînin çi û çi dikare rasterast yan bi riya teypan derbas guhên kesekî yan keseke bi terbiya yan xweperest bibe! Ma gelo bikarhanîna tiştekî wisa di cîh de ye? Gelo ji bo êşandina nefsî ya mamûrên guhdar tevdêr hatine kirin? Gelo biryarên sendîgehên mamûran, yên karmendên neqliyat û ragîhandinê di derheqê vê pirsê de çi bin? Xem ji bo xwediyên karxaneyan, anarxîstan, birêvebir û karmendên bankan tête kişandin, lê kî di derheqê hêza neteweya me ya dagirtin û guhdarkirina teypan de xeman dikişîne? Gelo li nik kilîseyan gotineke di derheqê vê pirsê de tune be? Gelo konferensa metranan li Fulda û komîteya birêvebirina rêxistina katolîkên Almanya di derheqê vê pirsê de ne xwedan raman bin? Gelo çima papa bêdeng maye? Ma qe kes bi bîr nayne çi û çi, ji karamêla bi aqît bigir ta xirabtirîn şêweyên porno, digihên van guhên bêguneh? Li pêş çavên

me ji ciwanan re têye gotine mesleka mamûrtiyê çi yeke baş e – û em dibînin dema ew dibin mamûr çi tê serên wan? Wan dikin ber karê bêvaciya li ser telefonan. Va ye li vir îmkanek tête holê ku dikare êdî kilisîyê û sendîgehan carekê bigihîne hev. Heye ku bikaribin li gel hev ji bo karmendên guhdarkirina axaftinên di telefonê de kûrsekî perwerdekirinê bi rê xin. Dersên dîrokê bi riya teypan. Ji bo tiştekî wisa pereyên pirr navên.

## 42

Em nuha bi dilekî xemgîn vedigerin haliyê pêşîn û xwe bi çavî û herqan ve mijûl dikin ku rev jê niye; û li vir jî şîrovekirinek divêt! Me gotibû ku xwîn ê nema li vir birije û divêt bête gotin ku di derheqê mirina diya Katharina de me sozê xwe bi cîh anî. Erê, mirina wê ne yeke bi xwîn bû lê di eynî demê de ne yeke wek ya kesên din bû. Bêguman bikarhanîna şêweyeke zorê bûbû sedema mirina Xanim Blum lê zordariyeke bêmebest. Li gel her tiştî jî divêt bête gotin – va gotina pêwîst e bibe – ku merovê bûyî sedema mirina wê ne dixwazt wê bikuje, ne jî derbeke mirnê li wê xe, û heta ne jî wê brîn bike. Merovê li vir behsa wî têye kirin li gor îspatên li holê, û wekî ku wî bi xwe jî li xwe nabû, ji Tötges pê ve ne kesekî din e, ew'ê ku bi xwe di bûyereke bi xwîn de rast mirina xwe hat, bûyereke ku tevdêr jê re hatibûn kirin. Roj hîn ya pêncşemê bûye dema ew li navnîşana diya Katharina geriyabûye û ew bi cîh jî kiribûye lê nikaribûye rêdana dîtina wê di nexweşxaneyê de bi dest xe. Rahîbe Edelgard ya li ser deriyê nexweşxaneyê û serekpijîşk, Dr.Heinen, ew agahdar kiribûne ku bi

encama emeliyateke giran, lê serkeftî, ku xwe bi nexweşiya şêrpençê ve peywendîgir dikir Xanim Blum, gotinê naxwaze, hewcedare rewşeke aram bûye û ji bo bixwehatina wê zor grîng bûye ku ew neyê acizkirin. Ji ber vê yekê hevpeyvîneke li gel wê ne tiştekî pêkan bûye. Dema Tötges gotibûye, ji ber ku peywendiya qîza wê li gel Götten hebûye, Xanim Blum bi xwe jî, wek keça xwe Katharina, dibûye xwediya "cîhekî di dîroka nûjen de" û wisa xelkê maf hebûye di derheqê wê de jî agahdar bibin, Dr.Heinen lê vegerandibûye ku ji bo wî bi xwe, wek pijîşkekî, kesên ku di dîroka nûjen de xwedan şûn bin jî di nexweşxaneyê de ber her tiştî merovên nexweş in. Tötges di çav xwe re kiribûye ku di nexweşxaneyê de boyevanine di kar de bûne; û dû re wî li pêş hevalan pesna xwe dabûye û gotibûye ku wî di sibeya roja îniyê de bi riya "hêsantirîn dubare, dubereya merovê karker" – bi dîtina saqoyekî boyevanan, satilekê û firçeyekê – xwe gîhandibûye odeya Xanim Blum çimkî agahiyên li cem diyan hene – yên nexweş jî di nav de – li nik kesekî din tunene; wî raste rast merseleya qîza wê jê re gotibûye lê nedizanibû heke wê her tişt bi tevahî fêhm kiribûye çimkî navê Götten ji bo wê bêyî xwebêj bûye. Xanim Blum gotibûye: "Çima va dawiya û ne yeke din, çima va dawiya?" Va gotina wê di ROJNAME'yê de bûbû: "Tiştekî wisa divabû biqewime, çi rêyên din nebûn." Di derheqê vê gotinê de Tötges gotibû, wek rojnamevanekî ew ketibûye ser ku "biçe alîkariya yên bêçare da ku xwebêja mebesta wan bi şêweyeke zelaltir bête diyarkirin."

Tiştekî ku îspat bike heke Tötges rast xwe gîhandibû diya Katharina Blum li holê niye. Gelo ew rast li gel wê axaftibû lê ji bo ku bikaribe wan gotinên di ROJNAME'yê de bispêre wê derew kiribûn û ew hevpeyvîna li gel wê afirandibû da ku xuya bike ew çiqa rojnamevanekî jîr û jêhatî ye, û da ku li nik yên din pesna xwe bide? Dr.Heinen, rahîbeya berpirsiyar Edelgard, nêrseke spanî bi navê Huelva, paqişkereke portugalî bi navê Puelco, hemî dibêjim ku ne pêkan e "vî kesî bêşermiyeke wisa kiribe û bi vî karî rabibe" (Dr.Heinen). Bêyî çi guman, çûna cem diya Katharina ku Tötges bi xwe dibêje cîh girtiye, lê heye ku ji haliyê wî de hatibe afirandin jî, pirseke zor grîng e; û ne dûre, wekî ku merov dikare tê bigihê ku berpirsiyar û karmendên nexweşxaneyê vê hevdîtinê ji kokê ve wekî tiştekî ne pêkan diyar dikin çimkî divabû tiştekî wisa cîh negirtibûya. Divêt em zor miqayit bin da ku neheqî li çi haliyan nebe. Bi gotineke din, yan wî xwe bi dek û dolaban gîhandiye diya Katharina, yan jî dîtina wê iddîa kiriye da ku wan peyvên di rapora xwe de bi kar hanîbûn bike peyvên wê. Guman tê de tune, biryara Katharina ku qatek kincên karnîvalê ji xwe re amade bike, da ku biçe li eynî meyxaneya ku Schönnerê ronedî tê de "keçikeke ji wan keçikan" dîtibû û li gel wê çûbû û venegeriyabû tiştine di çav xwe re ke, li dû pejirandina beşdarbûna di hevpeyvîneke li gel Tötges de û li dû weşandina gotareke wî'ye din di ROJNAMEYA YEKŞEMÊ de hatibû girtin. Divêt em nuha piçekî bi sebir bin da bibînin ka çi dibe. Tiştekî aşkere li holê heye ku rast ji haliyê Dr.Heinen bi xwe de

hatiye gotin. Ew jî ew e ku mirina Maria Blum, diya Katharina, ji nişkan ve bûye û kesek ne li bendê bûye, ku "tiştine kesekî hesabê wan nekiribû, li gel nebûna îspatan jî, di mirina wê de rola xwe lîztibûne." Di derheqê vê yekê de divêt lome li boyevanên bêguneh nebin. Navêt leke li rûmeta karmendê almanî keve: ne rahîbeya berpirsiyar Edelgard, ne jî stiyên biyanî Huelva û Puelko dikarin bêyî çi guman bibêjin ku karkerên li wir hemî boyevan bûne – şirketa Merkens ya li Kuir çar kes ji bo vî karî rêkiribûn –, bi taybetî ji ber wê yekê ku her yekî ji wan li şûnekê karê xwe dikiriye. Loma, kesek nikare bide îspatkirin ku kesekî saqoyê boyevanan lê, firçe û satil di dest de, xwe ji derve de negîhandibe hundir. Tötges gotibû (baştir e bête gotin, li xwe nabû, çimkî çi îspatên cîhgirtina hevpeyvînê li holê nînin) ku ew li cem Maria Blum bûye û Katharina di derheqê vê gotina wî de agahdar bû. Birêz Merkens bi xwe jî înkar nekiribû, ku gotinê naxwaze, her çar karkerên wî di eynî demê de ne li cîhekî bûn, û eger kesekî bixwaztibûya xwe bişemitîne hundir wî dê bi hêsanî bikaribûya. Dr.Heinen dû re gotibû, ji bo îddîaya ku gotinên di gotarê de yên diya Katharina ne, wî dê li ROJNAME'yê gilî bikira da ku wê riswa bike çimkî karekî wisa ne yê kirinê ye, lê çawa gotina Blorna ku ew ê "yekê bavêje çengeya Sträubleder" nehat bicîhkirin ya Dr. Heinen jî wisa ma.

## 44

Dem dora nîvro bû di şema 22'yê sîbatê de û jin û mêr Blorna, Xanim Woltersheim, Konrad Beiters û Kathari-

na di qehwexaneya Kloog de, li Kuir, êdî gihîştibûn hev (xarzêyê xwediyê xwaringeha ku Katharina berê tê de kar kiribû ew bi rê ve dibir). Wan hev û din hembêz kirin û hêstir ji çavan hatin xwarê, heta ji yên Xanim Blorna be jî. Gotinê naxwaz e, rewş di qehwexaneya Kloog de jî ya rojên karnîvalê bû lê xwediyê wê, Erwin Kloog, yê ku ji mêj ve Katharina dinasî û qîmeta wê dizanibû, di hundir mala xwe de şûnek da wan. Ji wir Blorna telefone Hach kir û gotê, hevdîtina wan ya di entîkxaneyê de dê îroj dû nîvro ne pêkan bûya, herweha gotê ku ne dûr e axaftina Tötges ya li gel diya Katharina bûbe sedema mirina wê, ew mirina ku her kes mat hîştibûye. Hach di sibeya vê rojê de bêhnfireh bûye û gotibûye Blorna, bila bi kerema xwe ji Katharina re bibêje ku ew ji bo mirina diya wê dilxemgîn bûye; wî dizanibûye ku Katharina dê ji wî dilsar nebûbûya, û bi rastî jî, ma dê ji bo çi dilsar bûbûya? Gotinê naxwaze, ew ji bo xizmeta wê her amade bûye, bila bizanibûya. Rast e, ew nuha bi encama îfadegirtina Götten zor mijûl bûye lê dikaribûye katê bibîne. Li milê din, wî dil hebûye bibêje ku di îfadegirtina Götten de ta nuha tiştekî ku zirarê bigihîne wê tunebûye. Götten bi evîndarî û rindî behsa wê kiribûye, lêbelê rêdana ku ew bikaribe wî bibîne ne pêkan bûye çimkî ew ne meriyên hev û din bûne û wî bawer nedikiriye gotina ku ew destgirtiyên hev û din in ê têre bidestxistina rêdanê bikira.

Baş diyar e ku li dû bihîstina nûçeya mirina diya xwe Katharina ne di rewşeke weqa xirab de bûye, ew bêtir wek keseke ku ji tengasiyekê azad bûbe dixewiniye. Katharina, wek merov dikare tê bigihê, hejmara ROJNAME'yê, di kîjanê de hevpeyvîna Tötges û peyvên ku wî wek yên diya

wê dabûn zanîn hatibûn weşandin, raber Dr.Heinen kiribû, lê wê bi xwe merseleya bevpeyvînê wek wî, mîna ku bêtareke mezin be, nedîtibû. Li gor wê, van merovan kesên mêrkuj û rûmetkuj bûne û wisa diyar bûye ku dizîna rûmeta xelkê, nav û dengê wan, û alozkirina rewşa saxlemiya wan ji bo karmendên vaşêwe rojnameyan tiştekî adetî bûye. Dr. Heinen yê ku bi şaştî Katharina wek meroveke komonîst dizanibû (ne dûr e ku wî gotinên mêrê wê yê hatî berdan ku bi xasûkî ew gotinên xwe kiribû di ROJNAME'yê de xwendibin) li honikbûna dilê wê piçekî mat mabû û pirsîbû, heke wê va metodê ROJNAME'yê wek gelşeke ji rewşa civakî hatî didît. Katharina negihîştibû mebesta wî û serê xwe hejandibû.

Li dû axaftina li gel Dr.Heinen wê da dû Rahîbe Edelgard da ku biçe diya xwe di enbara laşan de bibîne. Ew û Xanim Wolersheim tev ketin hundir û wê bi xwe çarşef ji ser rûyê diya xwe rakir, got, "erê," û eniya wê ramûsa; û dema Rahîbe Edelgard pêşniyar kir, bila ew çend du'an bike, Katharina serê xwe hejend û got, "na." Wê dîsa rûyê diya xwe nixamt, ji rahîbeyê re spas kir, û di dema derketina ji hundir de bû ku wê dest bi girî kir, berê bi kerrî, dû re bi deng û li dawiyê bêyî bikaribe xwe bigire. Heye ku wê bavê xwe jî bi bîr hanîbû, yê ku wê di şeş saliya xwe de herweha di enbareke laşan ya nexweşxaneyekê de cara dawîn dîtibû. Hat bîra Else Woltersheim, na, ew haydare wê yekê bû, ku wê hîn nedîtibû Katharin digiriye, heta di zarokiya wê de jî, dema ku ew di xwendegê de ne bextewer bû û ji ber rewşa malbata wan tê de xemgîn bû. Dû re Katharina bi rêzemendî û dilgermî spasiya stiyên biyanî Huelva û Puelco jî kir, ji bo her tiştê ku wan ji diya wê re

kiribûn. Ew bi tevahî li ser hev bû dema wê nexweşxane li şûn hîşt û ji xwe bîr nekir bi riya nexweşxaneyê telegramekê bişîne girtîgeha ku brayê wê tê de bû da ku ew jî agahdar bibe.

Bi tevahiya dû nîvro û êvara wê rojê ew wisa ma: li ser hev. Tevî ku wê car li dû carê herdu hejmarên ROJNAME'yê derdixistin, bi firehî di derheqê wan de li gel Blorna, Else W.û Konrad B.diaxift, wisa diyar bû ku baweriya wê di deheqê ROJNAME'yê de jî hatibû guhertin. Bi peyvên rojên îroj: kêmtir li gor hestên di dil de û bêtir bi analîzkirin. Bi beşdarbûna li gel van merovên nas û di odeya daniştinê ya Ervin Kloog de wê herweha peywendiya xwe ya li gel Sträubleder hanî ser zimên: Êvarekê, li dû vexwendineke li mala Blorna, wî ew gîhandibûye mala wê. Tevî ku wê dil nekiribûye û hema–hema bi hişkî gotibûyê, daketina wî ji otomobîlê ne pêwîst bû, ew bi wê re ta deriyê mezin û dû re ta deriyê apartmana wê meşiyabûye û ber ew derî bigire wî lingekî xwe xistibûye ber dêrî û hewl dabûye derbas hundir, û nêzike wê, bibe. Ew dû re neçar mabûye paş ve biçe û li xatirê xwe hîştibûye ku wê ew wek kesekî ku jin li ber dihelin nehesibandibûye. Li dû ku bi ya wî nebûye –kat êdî dû nîvê şevê bûye – ew dilsar çûbûye mala xwe. Ji wê êvarê û şûn ve ew êdî bi dû wê ketibûye, car li dû carê dihatibûye, kulîlk dişandibûne, name dinivîsandibûne, û ji dest wî hatibûye der çend caran derbas hundir jî bibe, û yek ji van caran bûye dema ku wî bi zor ew gustîrka dabûye wê. Va bûye merseleya wê û Sträubleder. Loma jî wê nexwaztibûye di îfadedayîna xwe de gotina mêvantiya wî, yan wî bi nav, bike çimkî wê dizanibûye mamûrên beşdar ê qe nikaribûna ji wê bawer bi-

kin ku di navbera wan de tiştekî cîh negirtibûye, heta bi ramûsanekê be jî. Kê dê bawer bikira ku keseke wek wê dê kesekî wek Sträubleder nepejiranda, yê ku ne tenê dewlemend bû lê di cîhana rêzaniyê, aboriyê û zanistiyê de bi dilovanî û zimanxweşiya xwe deng dabû, hema-hema wek bokeyekî filiman. De kê dê ji karkereke hundir malan, yeke wek wê, bawer bikira ku ew li bokeyekî filiman xwedî derneketibû, û ne tenê ji ber sedemên moralî, lê herweha ji ber sedemên zewqî jî?! Li nik wê bi carekê de çi dilovanî ji bo wî tunebûye. Xwemijûlkirina îfadegiran bi pirsa mîrzamêvan ve ew gellekî êşandibûye ji ber ku wê nedikaribûye heta navê yarîtiyeke siq jî lê bikira çimkî navekî wisa dê xwebêjeke şaş bida, û wê çi hestên ji bo yarîtiyeke siqesiq di derheqê Sträubleder de bi carekê de nebûne, lê wê dê nikaribûya peywendiya li gel wî bi kesekî, bi teybetî bi hejmareke mamûrên îfadegir, fêhmkirin bida. Lê li gel her tiştî jî – û li vir ew keniya – di dawiya dawiyê de ew ji wî re spasdar bûye ji ber ku kilîta xaniyê wî ji bo Ludwig bi sûd bûye, bi kêmasî navnîşana mala wî ya li çolê – û li vir ew dîsa keniya– çimkî bêyî kilît jî Ludwig ê bikaribûya têkeve hundir, lê helbet bi kilît hêsantir bûye. Wê dizanibûye ku di rojên karnîvalê de kesek di koşkê de tunebûye çimkî du rojan berê Sträubleder careke din li serê wê bûbûye belayeke mezin û kiribûye ku îlleh bi wê bida pejirandin, bila herduyan dawiya hefteyeke karnîvalê di koşkê de li gel hev derbas bikirana, ber çûna konferensa Baden B.ku wî beşdarbûna tê de dil dikiribûye. Erê, Ludwig ew (Katharina) agahdar kiribûye ku polîs li dû wî ne lê tenê gotibûye ku ew ji ber leşgeriyê direviyabûye û dê li dû kurtedemekê ji welêt derketa; û – cara sêyem bû ku dikeni-

ya– li xweşiya wê hatibûye ku wî di rêçika boriyên germkirinê re ji xênî bide derxistin û haydare deriyê taybetî bike, yê ku li dawiya xaniyê "Koşkên Xweş li Kêleka Çêm," li quncê taxa Hochkeppel merov digîhand der. Na, haya wê jê tunebûye ku polîs ew û Ludwig dipane lê şandina wî di wê rê re ji bo wê wek lîztikeke cendirme û dizan bûye, û di sibeya roja pêncşemê de bûye, ne berê –Ludwig rast jî katjimêr şeş ji hundir derketibû –, ku ew haydare giraniya merseleyê bûbûye. Nuha ku Ludwig hatibû girtin dilê wê rûniştibûye çimkî wî dê nikaribûya êdî bi kirinên ne di cîh de rabûya. Ew ji destpêkê ta dawiyê bi tirs bûye ji ber ku baweriya wê bi vî Beizmenne'yî nedihatibûye.

## 45

Divêt li vir baş bête xuyakirin ku dûnîvro û êvara wê rojê xweş derbas bûbûn, weqa xweş ku bêhna hemiyan –jin û mêr Blorna, Else Woltersheim û Konrad Beiters yê ku ta radeya mathîştinê bêdeng mabû – fireh bûbû. Li dawiyê hemî, Katharina bi xwe jî, di wê baweriyê de bûn ku rewş êdî "ber bi hêsantiyê diçû." Götten hatibû girtin, îfadegirtina Katharina bi seri bûbû, diya Katharina ji êş û jana xwe azad bûbû, tevî ku ber dema xwe miribû jî, tevderên birina goristanê û gorkirinê dihatin kirin û hemî kaxezên fermî dê roja duşemê li Kuir beqediyana – tevî ku ew roja tatîleke olî bû jî mamûrekî bi kerema xwe dabû zanîn, ew ê kaxizan pêgihîne. Bi ser de jî kêfxweşiyek bû ku xwediyê qehwexaneyê, Erwin Koloog, tew nepejirandibû çi diravan jî ji wan bigire (nerxê xwarin û vexwarina wan), û li derketinê gotibû: "xeman mekişîn, Kato, ne her kesê li vir te

wek meroveke nebaş dinase." Heye ku piştgiriya di vê gotinê de yeke bi sînor be; ma gelo peyvên "ne her kes" çi xwebêjê didin? Lê çawa be jî, merov dikaribû bigota, "ne her kes." Li wir li hev kirin ku biçin mala Blorna û beşê êvarê yê mayî li wir derbas bikin. Di mala Blorna de nehîştin ku Katharina destên xwe yên tertîbvan bi kar wîne, ew di îznê de bûye û divabû rihetiya xwe bigirta. Xanim Woltersheim di mitbaxê de etûr çêkirin, Blorna û Beiters jî soba vêxistin. Bi rastî jî Katharina pejirand, bila carekê hinên din jî ji bo rihetiya wê kar bikin. Danişţina wan ya li gel hev gellekî xweş bû, û eger ne ji bo xatirê mirina merovekê û girtina kesekî pirr hêja bûya tevdêra piçek dans jî dê di kûraniya şevê de hatibûya kirin çimkî, çawa bûya jî, ew di rojên karnîvalê de bûn.

Ji dest Blorna nehat der ku biryara beşdarbûna di hevpeyvîneke li gel Tötges de bi Katharina bide guhertin. Katharina gellekî axaftibû û bi dirêjiya êvarê dostane û zimanxweş mabû. Dû re, li dû cîhgirtina hevpeyvînê – "hevpeyvîn lê çi hevpeyvîn!" –, Blorna di şûna xwe de hişk bû dema hat bîra wî, çawa wê bi dilhonikî û bi îsrar cîhgirtina hevpeyvînê daxwaz dikir, û çawa bi serhişkî beşdarbûna wî di dema hevpeyvînê de nedipejirand. Lê li gel wê jî wî nedikaribû bigota ku Katharina ji sedî sed di wê êvarê de tevdêra kujtina wî kiribû. Bi dîtina wî ROJNAMEYA YEKŞEMÊ bû ku tevdêra kujtinê bi tevahî xistibû serê wê.

Li mala Blorna bi aştî xatir ji hev xwaztin, hev û din hembêz kirin, lê îcar bêyî hêstir, ew jî li dû ku wan bi hev re guhdare mûzîka klasîk û sivik kirin û li dû ku Katharina û Else Woltersheim piçekî li ser jiyana xwe ya li Gem-

melsbroich û Kuir peyivîn. Katjimêr deh û nîvê êvarê bû dema Katharina, Xanim Woltersheim û Beiters bi sozdayîna hevaltiyeke siq û dilsoziyê ji mala Blorna derketin; û Birêz û Xanim Blorna xwe pîrozkirin ku ew li gel derengiyê jî di katê de – ji bo Katharina di katê de – ji îznê vegeriyan. Li ber germahiya agirê ku dest pê kiribû vemire û bi vexwarina piyalek mey li gel hev, wan tevdêra çûna şûneke din ji bo îznê kirin û li ser xusetê hevalê xwe Sträubleder û jina wî Maud axaftin. Dema Blorna ji jina xwe tika kir ku bila nema peyva "mîrzamêvan" li pêş Sträubleder bi kar wîne çimkî divabû wê bi xwe jî bizanibûya ku va peyva bûbû yeke hesas, Trude Blorna ji haliyê xwe de got: "bila em wî weqa zû nebînin."

## 46

Baş diyar e ku Katharina beşê êvarê yê mayî bi aramî û kerrî derbas kiribû. Wê qatê kincên jinên Ereban li xwe kiribû, li hindek şûnan car din li ser dirûnê zêde kiribû û gotibû, ew ê destmaleke spî li şûna hicabê bi kar wîne. Dû re hersiyan ji bo kurtedemekê guhdare radyo kiribûn, çend piskewît xwaribûn û çûbûn razên. Beiters, yê ku cara yekem bû tiştekî wisa bi şêweyeke aşkere dikir, tev Xanim Woltersheim çûbû odeya wê ya razanê; Katharina jî xwe li ser karyoleyê bi cîh kiribû.

## 47

Dema Else Woltersheim û Konrad Beiters di sibeya roja yekşemê de ji xew rabûn, maseya xwarinê bi şêweyeke rêk

û pêk hatibû raxistin. Qehwe di misînê termos de bû û Katharina, ya ku diyar bû bi lezet xwarina xwe dixwar, li paş maseya odeya daniştinê rûniştibû û ROJNAMEYA YEKŞEMÊ dixwend. Gotinên ji vir û pê ve hema–hema bi tevahî ji ROJNAMEYA YEKŞEMÊ hatine girtin. Rast e, îcar "çîroka" Katharina û wêneya wê ne di rûpela yekemîn de bûn. Îcar wêneya Ludwig Götten di wê rûpelê de bû, bi sernivîsar: "DILOVANÊ KATHARINA BLUM DI KOŞKA MEROVEKÎ PÎŞESAZ DE." Gotara di derheqê Katharina bi xwe de îcar ji her carê dirêjtir bû lê di nav rûpelên 7, 8 û 9 de li gel hejmareke ji wêneyan hatibû weşandin; di wêneyan de: Katharina wek zaroka beşdare merasîmên pejirandina olî; bavê wê di dema vegera ji şerê cîhanî de; kilîseya li Gemmelsbroich, şûna ku malbata Blum lê dima; dîsa koşka Blorna; diya Katharina wek jineke çel salîne mest ku hema–hema li ketinê bû, li pêş xaniyê wan yê li Gemmelsbroich; û li dawiyê wêneyeke nexweşxaneya ku tê de diya Katharina êvara îniyê li ser şemê miribû. Nivîsara ROJNAMEYA YEKŞEMÊ:

Qurbana yekem yava Katharina Blum'a ku hîn kesek negihîştiye ser û binê rola wê û hîn li ser lingan azad e diya wê bi xwe bû ku ew bûye sedema mirina wê. Heta bi diya wê be, ew jî bi agahdarbûna di derheqê kirinên qîza xwe de hatibû hejandin û ji kerban can dabû. Tu dibêjî qey kirinên wê yên din têrê nedikirin, wê, di dema ku diya wê di sikrana mirinê de bû, xwe avêribû hembêza kesekî eşqiya û di civîneke dansê de li gel wî reqisî bû; û mirina diya wê hêstireke tenê jî ji çavên wê nedabû rijandin, tiştê ku wê digihîne radeya bêşermiyeke bêyî hempa. Gelo va

jina rast tenê "wek qaqê sar e û gellekî xasûk e?" Şûya xwedîkarekî wê, pijîkekî hêja ku berê li gundekî di kar de bû, wê wisa dide nasîn: "Şêweya dan û stendina wê wek ya qehpeyan bû. Ji bo xatirê kurên xwe yên xort, nexweşên dihatinî cem mêrê min, û ji bo sûda mêrê min bi xwe jî, ez neçar mam wê ji kar derînim." Gelo tiliyên Katharina B.di dek û dolabên Dr.Fehnen de jî hebûne? (ROJNAME'yê di katê de li ser wê pirsê nivîsandibû). Gelo bavê wê xwe bi sextekarî wek nexweş diyar kiribû? Çima brayê wê bû mucrim? Hîn ne diyar e ka va jina çawa weqa zû gihîşt jor û salê weqa pere bi dest dixe. Nuha êdî aşkere ye ku Katharina Blum riya revê kiribûye ber Götten'ê destbixwîn; wê dostî, pêbawerî û alîkariya meroveki gellekî rêzdar, zanyar û pîşesaz ji bo armancên xwe yên neqenc bi kar hanîn. Di navberê de li nik ROJNAME'yê agahî gihîştin hev ku ne mîrzamêvan bûn yên ku diçûn cem wê, lê ew bû ya ku wek stîmêvanekê diçû koşkê da ku bikaribe wê ji bo armancên xwe bi kar wîne. Ew derketinên wê yên bi trimbêlê nema êdî wek tiştekî mathîştinê têyên ber çav. Bêyî ku du caran tê de biponije, wê rûmeta meroveki bi rêz, rewşa malbata wî û fealiyetên wî yên siyasî – di derheqê wan de ROJNAME'yê gellek caran nivîsandiye –, bêyî ku çi girîngiyê bide hestên şûyeke dilsoz û çar zaroyan, xistin tehlûkeyê. Wisa xuya ye ku Blum li gor daxwaza komeke çep hewl didaye da ku benê pêşveçûna siyasî ya S.biqetîne.

Gelo polîs û abûkatiya giştî rast dixwazine ku guh bidin gotinên Götten'ê navbişerm yê ku bizavê dikêye da ku Blum bi tevahî bêtawan xuya bike? ROJNAME careke din va pirsa ku gellek caran pirsiye dipirse: Gelo şêweyên

ku li welatê me ji bo îfadegirtinan têyên bikarhanîn ne pirr nerm bin? Gelo pêwîst be merov li hember nemerovan merov bimîne?

Di bin wêneya Dr.Blorna û xaniyê wan de:

Di vê malê de Blum ji katjimêr heft ta şanzdeh û nîv bi serê xwe kar dike, bêyî ku kesek wê tehqîb bike, bi pêbaweriyeke sed ji sedî ji haliyê Dr.û Xanim Blorna de. Gelo li vir çi cîh digirt dema Blorna'yên ne haydar li kar bûn? Yan, heye ku ew ne weqa nehaydar bûn? Peywendiya wê û wan wek yeke zor baş, hema–hema wekî ku yên hev bin, hatiye diyarkirin. Cînaran ji bo ROJNAME'yê dan zanîn ku merov dikare hema–hema gotina dostaniyekê di navbera wan de bike. Di derheqê xwediyên malê de jî tiştine li holê hene lê nuha ne kata wan e, yan erê? Gelo rola Xanim Blorna ya ku di kutûgên xwendegeheke bilind ya teknîkî de wek "Trudeya Sor" tête binavkirin çi be? Çawa Götten dikaribû di bin çavên polîs de ji apartmana Blum bireve? Kî bi şêweyeke rêk û pêk di derheqê nexşên xaniyê "Koşkên Xweş li Ser Çêm" de agahdar bû? Xanim Blorna bi xwe. Firoşkara bi navê Hertah Sch.û karkera bi navê Claudia St., herduyan jî ji bo ROJNAME'yê diyar kirin: "Ew wisa bi hev re direqisîn, te digot bi salan hev û din dinasîn" (yanê Blum û yê eşqiya, Götten). Ew ne hevdîtineke bi tesaduf bû, ew hev–dîsa–dîtin bû.

## 48

Dema hevaline Beizmenne rexne lê girtin ku wî ji katji-

mêr 23.30'ê êvara pêncşemê de hay ji wê yekê hebûye ku Götten di koşka Sträubleder de bûye lê li gel wê jî ew bi dirêjiya çel û heşt saetan bi serê xwe hatibûye berdan, û wisa jî tehlûkeya ku ew ji wir bireve hebûye, Beizmenne keniya û got, roja pêncşemê, ji nîvê şevê û şûn ve reva Götten êdî ne tiştekî pêkan bû. Bi gotina wî, xanî di nav daristanê de bûye lê baş bûye ku li dorhaliyên wî şûnên bilind hebûne ku dikaribûne wek "burcên payînê" bêyên bi karhanîn. Wezîrê kar û barên hundirîn di derheqê rewşê de bi tevahî hatibûye agahdarkirin û hemî biryarên hatinî girtin pejirandibûne.Hejmareke ji komandoyên taybetî xwe di cîh de bi helîkopteran gîhandibûne wir; helbet helîkopter ji koşkê wê de daketibûne da ku neyên bihîstin; û xwe li ser wan şûnên bilind bi cîh kiribûne. Di sibeya roja din de polîsê herêmê jî hatibûye agahdarkirin û du dozîne ji mamûrên polîs tev yên din bûne. Armanca vê tevdêrê ew bûye ku kesên li gel Götten didan û distendin bihatana bicîhkirin û, wekî dû re diyar bûye, li gel tehlûkeya reva Götten jî va tevdêra yeke di cîh de bûye çimkî pênc kesên ku peywendiya wan li gel wî hebû hatibûn girtin. Gotin nedixwaztiye ku van pênc kesan divabûn bihatana girtin û malên wan bihatana velokirin berî ku Götten bi xwe bihata girtin. Polîs xwe dabûye benda wî ta ku kesekî ew li gel bide û bistîne li holê nemabûye û, yan ji ber nemiqayitiya wî yan xemnekişandina wî, dikaribûye wî ji dorhaliyên koşkê tehqîb bike.

Wî, Beizmenne, dixwaztiye di derheqê bidestxistina hindek agahiyên grîng de spasiya rojnamevanên ROJNAME'yê bikira, ji dezgeha weşanê re û herweha ji beşên bi wê ve girêdayî re yên ku agahiyên xwe bi şêweyeke serbes-

tir dikaribûne bi dest xin ku bi riya îfadegirtinê ne pêkan bûye. Wî dil hebûye agahiyên di derheqê Xanim Woltersheim de wek nimûneyekê bida: van agahiyan bi xêra rojnamevanên ROJNAME'yê hatibûne holêye û diyar bûye ku paşeroja wê jî wek ya Blum ne zelal bûye. Woltersheim di sal 1930 de wek qîza karkerekî ji Kuir ji day bûye. Diya wê hîn jî dijiyaye, û ji şûnan gîh li ku? Li Almanyaya Rojhelat, û ne li dij daxwaza wê, na; bi daxwaza wê bi xwe. Gellek caran hatibûye vexwendin ku bila bihata warê xwe Kuir, li kuderê wê xaniyekî biçûk û donimek zevî hebûne; cara yekem di 1945'an de, car din di 1952'an de û careke din di 1961'an de, kurtedemekê ber lêkirina dîwêr. Lêbelê wê her sê caran jî va pêşniyariya ji kokê de nepejirandibûye. Bavê Woltersheim, ew hîn piçekî balkêştir bûye, kesekî bi navê Lumm, her weha karker, û jê pê ve endamê Partiya Komonîst ya Almanya bûye, di sala 1932'an de çûbûye Yeketiya Sovyetî û li wir av li ser xwe zelal kiribûye. Bi baweriya wî, Beizmenne, merov ê nikaribûya kesên wek wî şopwenda di lîsteyên leşgerên almanî yên "wenda" de bidîta.

## 49

Tevî ku daxuyakirinên di derheqê peywendiyên hindek bûyer û feahiyatan de kêm–zêde aşkere li holê ne jî, merov ditirse ku ew tenê wek îşaret, yan tew şaş, bêyên têgihîştin. Ji ber vê yekê divêt li vir rê ji bo daxuyakirineke din bête dayîn: ROJNAME'ya ku bi rêya rojnamevanê xwe Tötges bêguman bûbû sedema zûmirina diya Katharina di hejmara xwe ya yekşemê de Katharina bi mirina diya

xwe gunehbar kiribû û – bi şêweyeke kêmzêde vekirî – ew kiribû diza kilîta koşka Sträubleder ya li çolê! Va yeka divabû baş bihata diyarkirin çimkî pêkan e ku hindek merov haydarê nebûbin. Heye ku herweha ji bo hinan baş xuya nebûbe ROJNAME'yê ta çi radeyê derew kirine, gotinên merovan guhertine û rastî xar kiriye.

Blorna dê li vir wek nimûneyekê bête dayîn ku çawa ROJNAME dikare tew li kesên ku belkî ji hindekên din bêtir bi mentiq bin jî bandorê bike. Diyar e ku ROJNAMEYA YEKŞEMÊ li wî beşê bajêr yê ku mala Blorna lê bû nedihat kirîn. Li wir rojnameyên çaktir dihatin xwendin. Ji ber vê yekê Blorna'yê ku wisa bawer bû va merseleya êdî kuta bûbû ta nîvro ji nivîsarên di ROJNAMEYA YEKŞEMÊ de ne haydar bû. Ew tenê piçekî bi tirs li benda encama hevpeyvîna Katharina ya li gel Tötges bû, û li dû nîvro, dema wî telefone Woltersheim kir, ew di derheqê nivîsaran de hat agahdarkirin.Xanim Woltersheim ji haliyê xwe de wer dizanibû ku Blorna van nivîsaran xwendine. Ber em bidomînin, hêvî ew e ku Blorna wekî merovekî bi şêweyeke rasteqîne û ji dil ji bo Katharina xemgîn, herweha wek merovekî aqilmend, cîhê xwe di vê serpêhatiyê de girtibe. Dema Xanim Woltersheim beşine nivîsarên di ROJNAMEyê de ji wî re xwendin, wî guhên xwe – wek tê gotin – bawer nekirin û ji wê daxwaz kir, bila careke din bixwîne. Dema bi ya wî bû, ew neçar ma bawer bike û – wek dibêjin – hema hindik mabû biteqe. Qîr û qara wî hat, di mitbaxê de li şûşeyeke vala geriya, dît, tev wê reviya garacê, li kuderê rind bû ku jina wî rastê hat û nehîşt ew bombeyeke molotov çêbike, agirbombeya ku wî dixwazt biavêta ofîsa redaksiyona ROJNAME'yê, ber

ku yeke din jî biavêta "koşka yekem" ya Sträubleder. Hele merov ji xwe re vê wêneyê bide ber çavan: merovekî di zanîngehan de xwendî, çel û du salîn, kesekî ku bi encama jîrbûn û aqilmendiya di derheqê birêxistina peyman û lihevkirinên curbecur de – ew jî li ser sehneya navneteweyî, ji Brzaîl bigir ta şûnên wek Erebistana Seûdî û Îrlende – xwe di nav heft salan de li nik Lüding kirîbû layiqe pesindanê û li nik Sträubleder layiqe nerxgiraniyê; bi gotineke din, merovekî bi nav û dengekî navneteweyî, ne hema kesekî ku di hevêrka xwe de tête nasîn; wî xwaztibû bombeyeke molotov çêbike.

Xanim Blorna va biryara di cîh de wek yeke bêhemd û tevdêr, wek yeke ji haliyê anarşîstên bûrjiwazî de tê girtin, bi nav kir û ew ji serê wî hanî der, mîna ku merov bi axaftinê jana ji beşekî giyana kesekî nexweş yan brîndar derîne. Dû re wê bi xwe dest avêt telefonê û ji Xanim Woltersheim xwazt, bila ji wê re wan beşên ji nivîsaran bixwîne. Divêt li vir bête gotin ku ew jî, heta bi wê be jî, zer bû û tiştek kir, heye ku ji bombeyên molotov xirabtir be: wê telefone Lüding kir (yê ku di vê deqeyê de şillikê li gel qeymêx û dondirmeyê dixwar) û hema rasterast gotê: "hey tu bênamûs, hey tu bêbav." Erê, wê xwe bi nav nekir, lê guman têde tune ku her kesê Blorna dinase herweha dengê jina wî jî dinase, ya ku bi zimantûjiya xwe deng daye. Bi dîtina mêrê wê, wê li vir jî piçekî zêde kiribû; û wî wer dizanibû ku wê ji Sträubleder re telefon kiriye. Dû re pevçûnên curbecur cîh girtin, di navbera herdu Borna'yan bi xwe û di navbera wan û yên din de, lê ji ber ku bi encama cîhgirtina wan kesek nehat kujtin divêt rê bête dayîn ku em xwe ji ser wan re çebikin. Diyarkirina van encamên

negrîng yên şêweya rojnamevaniya ROJNAMEYA YEKŞEMÊ bi mebest bû, da bête zanîn ku kesên ronakbîr û şûnbilind jî dikaribûn bêyên hêrskirin û heta dikaribûn tevdêrên bikarhanîna zorê jî têxin serên xwe.

Diyar e ku di vê katê de – dora nîvro – Katharina, li dû derbaskirina saet û nîvekê di ew şûna ku rojnamevan tê de digihîştin hev de, meyxaneya bi navê "Qaza zêrîn," bêyî ku ji haliyê rojnamevanan de bête nasîn, şûna ku reng e ew ji bo berhevkirina agahiyên di derheqê Tötges de çûbûyê, diçe mal û xwe dide benda gihîştina Tötges, yê ku li dû dora çaryekekê digihê wir. Pêwîst niye di derheqê hevpeyvînê de tiştek bête gotin. Em berê dizanin ew çawa derbas bû (li beşê 3'yemîn binihêre).

## 50

Da ku bi şopa gotina keşeyê Gemmelsbroich keve, gotina ku bavê Katharina bi dizî komonîst bû – tiştê ku her kes mat hîştibû –, Blorna ji bo rojekê çû wî gundî. Yekem: Keşe got, erê, wî ew gotina kiriye û ROJNAMEYÊ wekî ku wî gotiye nivîsandiye; îspat di derheqê vê gotinê de li nik wî tunebûye, ne jî wî dixwaztiye – tew gotibû, ji bo wî ne grîng bûye – ku çi îspatan pêşkêş bike; wî hîn dikaribûye pişta xwe bi hestên bêhnkirina xwe girêbida, û wî bêhn kiribûye ku Blum komonîst bûye. Xwebêja hestê bêhnkirina xwe wî nexwaztibû şîrove bike, ne jî amade bû bersîvê bide dema Blorna jê tika kiribû: Heke wî nedikaribûye hestê bêhnkirina xwe şîrove bikira, bila bi kêmasî diyar bikira ka bêhna keseke komonîst çawa bûye, ka komonîstekê çi bêhn dida; û li vir – mixabin divêt bête go-

tin – keşe hêrs bûye û bi hişkî ji Blorna pirsiye heke ew katolîk e; û dema wî gotiye, erê, keşe erkê guhlêdanê haniye bîra wî, tiştê ku Blorna tênegihîştibû. Gotinê naxwaze, karê Blorna yê lêkolîna di derheqê mala Blum de ku diyar bû xelkê wê derê jê hez nedikir ji vir û şûn ve dijwartir bû; gotinên hîn xirabtir li ser diya Katharina hatin kirin, ya ku rast carekê tev berdestê kilîseyê yê ku di navberê de ji kar hatibû qewitandin şûşeyek ava meya bimbarek vexwaribûye. Di derheqê komonîstbûna bavê wê de eger tiştek hebûya, ew jî ew bû ku wî di sala 1949'an de di meyxaneyeke ji heft meyxaneyên gund de ji cotyarekî bi navê Scheumel re, dibêjine, gotibûye: "Tiştên ji sosyalîzmê xirabtir jî hene." Bêtir di derheqê vê pirsê de nehatibûye bidestxistin. Ji vê serilêdana xwe Blorna tenê tiştek bi dest xist: li dawiya gera xwe ya li gund ew bi xwe jî, eger ne bi mebesteke xirab bûya jî, wek komonîst hat binavkirin, û va jî ji haliyê jinekê de (tiştê ku Blorna rast mat hîşt) ku piçekî alîkariya wî jî kiribû û herweha hindek sempatî jî diyar kiribû: mamosteya di teqawîtê de di dema xatirxwaztinê de bi qerf keniyabû, tew çavekî xwe jî bi wî re qurç kiribû, û gotibûyê: "Çima tu nabêjî ku tu jî yek ji wan î, û jina te ber her kesî?"

## 51

Mixabin merov nedikare şêweyên bikarhanîna zorê bi tevahî ji vir dûr bihêle. Divêt nuha tiştine bêyên diyarkirin ku dema xweamadekirina Blorna ji bo abûkatiya ji Katharina re cîh girtine. Şaşitiya wî ya herî mezin ew bû ku li dû tikakirina Katharina wî pejirand bibe abûkatê Götten

jî û hewl da hevdîtina herduyan pêkan bike, li ser hîmê ku ew destgirtiyên hev in, ku nêşankirina wan di ew êvar û şeva bîstê sîbatê de cîh girtibûye û her weha û her weha. Merov ê bikaribe bide ber çavan ROJNAME'yê dê li dû vê yekê çi û çi di derheqê wî, Götten, Katharina û Xanim Blorna de nivîsandibe. Pêwîst niye behsa wan nivîsaran li vir bête kirin. Tenê çend tiştên ji mewziyetê der ê bêyên diyarkirin, ew jî eger zor grîng bin, ji ber ku merov êdî ROJNAME'yê baş dinase. Gotinek dihat belavkirin ku Blorna dil heye jina xwe berde, gotineke bi tevahî bêyî bingeh, lê li gel wê jî bû sedema ku Xanim Blorna li mêrê xwe têkev gunanan. Hat diyarkirin ku ew ji haliyê aborî de bi bin ve çûye, tiştê ku ne baş bû çimkî di cîh de bû. Bi rastî jî wî lingên xwe piçekî ji bera xwe zêdetir dirêj kiribûn çimkî bi ser her tiştî de wî ta radeyekê berpirsiyartiya apartmana Katharina jî hilgirt ser milên xwe, apartmana ku bikirêdayîn û frotina wê dijwar bû çimkî ew wek şûneke "bi xwînê hatî lekekirin" dihat hesibandin. Bi kurtî, nerxê wê daket lê li gel wê jî divabû Blorna dayîna teqsîtên mehane, pereyên fayîzê û mesrefê din bidomanda. Hîn tew şan li holê dixewinîn ku şirketa xaniyan, Haftex, belkî li Katharina Blum gilî bikira çimkî, bi dîtina wan, wê di warê kirêdayîn, birêvebirin û nerxê frotina "Koşkên Xweş li Ser Çêm" de zirar gîhandibû şirketê. Wek xuya ye: gelş û xem ne hindik in. Hewldana yekem ji haliyê şirketa ku Xanim Blorna tê de kar dikir, ku wê bi riya dadgehê ji kar derxin bi ser neket. Şirketa dezgehvaniyê bizav kir ku li nik dadgehê vê sedemê bi kar wîne: rêznegirtina ji şertên pêbaweriyê re, çimkî wê, Xanim Blorna, xêz û rêçikên hundirîn yên xaniyê apartmanan bi Katha-

rina dane nasîne. Kesek hîn nedizane ka hewldanên duyemîn û sêyemîn ê çi biryarê bi dadgehê stendin bidin. Tiştekî din: Blorna'yan otomobîla xwe ya duyem frotin, û li par wêneya trimbêla wan ya mayî, ku bi rastî jî yeke çeleng û nerxgiran e, di bin vê sernivîsarê de ket ROJNAME'yê: "ABÛKATÊ SOR Ê KENGÊ NEÇAR BIMÎNE JI VÊ OTOMOBÎLÊ DAKEVE YEKE WEK YA PIRRANIYA XELKÊ?!

## 52

Bêguman dan û stendina di navbera Blorna û şirketa Lüstra de jî, eger bi carekê de nehatibe birrîn jî, kêm bû. Tenê "biserikirina" hindek peymanên aborî di dest wî de hîştibûn. Lê ber kurtedemekê Sträubleder va gotina bi telefonê derbas guhên wî kiribû: "Em nahêlin hûn ji birçîna bimirin," û tiştê li vir Blorna mat hîştî bikarhanîna "hûn" bû, li şûna "tu." Ew hîn ji bo şirketên Lüstra û Haftex ta radeyekê di kar de bû lê ne ji bo projeyên navneteweyî, tew ne ji bo projeyên tevahiya welêt jî; tenê ji bo karine herêmî dihat bikarhanîn, bêtir ji bo çend karên wan der û doran, bi xwebêja ku divabû ew serê xwe bi xwediyên gazincan û afirgerên gelşan re biêşîne, kesên wek ew'ên gilî dikin çimkî dîwarine wan li şûna ku bi mermer, wek soz hatibû dayîn, bêyên nixamtin bi nihîtên şîn hatibûn nixamtin; yan kesên nerazîbûna xwe diyar dikin ji ber ku ji wan re hatibû gotin, deriyê serşoka wan ê bi sê qat reng bête boyaxkirin lê li dû şeqitandina bi kêrê, yan li dû hanîna kesên di vî warî de pispor, dîtine ku ne sê lê du qat reng hatine bikarhanîn; gilîkirina ji bo tiştên wek

dilopkirina ava henefiyên banyo, çewtiyên makîneyên hêrandin û derhanîna gemarê, tiştên ku wek egera nedana pereyên li gor peymanan têyên bikarhanîn – ev şêwekar in ku nuha ji bo wî têyên dayîn, di dema ku ew berê, eger ne her dem bûya jî lê pirr caran, di navbera bajarên wek Buenes Aires û Persepolis de ji bo beşdarbûna di îmzekirina peymanên grîng de di balafiran de bû. Di leşgeriyê de ji bo tiştekî wisa "rutbedaxistin" tête gotin ku pirr caran sernizimtiyê û şerma li pêş xelkê jî bi xwe re tîne. Encam: hîn sanciyên kûr tunene lê zikê Blorna dest pê kiriye biêşe.

Herweha ne ku sûda Blorna bû dema wî li Kohlforstenheim ji polîs pirsî, ka di dema girtina Götten de kilîta deriyê koşka Sträubleder ji haliyê hundir de di cîhê xwe de bû lê ji yê derve de, û eger çi şan li holê hebûn ku wî ji bo ketina hundir zor bi kar hanîbe. De va pirsa wî ji bo çi, bi taybetî ku dû girtina deftera lêkolînê? Bi vî hawayî – divêt bête gotin – zikên diêşin rihet nabin. Erê, berpirsiyarê navenda polîs, Hermann, zimanxweş bû û li wî neket gumanan ku belkî komonîst be lê li gel wê jî bi şêweyeke ceddî jê re pêşniyar kir ku bila bi pê pirsên wisa nekeve. Ji bo Blorna tenê tiştekî kêfxweşkirinê li holê heye: Jina wî roj li dû rojê ji wî re rind dibêye. Erê, ew hîn zimantûj e lê ne li dij wî; tenê li dij hinan, ne li dij hemiyan. Tevdêra ku ew koşka xwe bifroşin da ku apartmana Katharina bikrin û têkevinê tenê ji bo sedemekê cîh negirt: biçûkbûna wê, ji ber ku Blorna dil heye dest ji ofîsa xwe ya li bajêr berde û karê di dest wî de mayî tenê li mal bike. Va merovê xwedî bîr û baweriyên serbest, kesê ku ji jiyana xweş hez dike, xelk jê hez dike, hevkarmendekî ji jiyînê razî ku

heval bi dilşadî diçûn mala wî; vî merovî dest pê kiriye wek kesekî xwe ji her kesî û her tiştî bi dûr xistibe xuya bike, yekî ku çi haydariyê nade kincên xwe, tiştê ku berê ji bo wî gellekî grîng bû; û ji ber ku ew bi rastî jî, ne ku ji bo xatirê modeyê, bala xwe nade kincên xwe, hindekan ji hevkarên wî dest pê kirine bibêjin ku ew nema êdî xwe bi baqişkirina xwe ve mijûl dike û tew bêhna ne xweş jî jê tê. Wisa, hêviya ku karekî rêk û pêk bi dest wî keve nema li holê heye ji ber ku – tiştek jî dê li vir veşartî nemîne – bêhna giyanê wî nema êdî ya berê ye, ne ya wî peyayî ye ku xwe di destpêka rojê de dide ber ava dûş, sabûna zehf, xweşbêhna bin çengan û kolonya bi kar tîne. Bi kurtî: guhertineke mezin li nik wî cîh digirêye. Hevalên wî – hîn çendek mane, ji wan yek Hach e, yê ku herweha li gel pirsa Katharina Blum û Götten bi şêweyeke fermî mijûl e – di derheqê wî de bi tirs in, bi taybetî ew di derbareyê êrîş û nefreta wî de – li hember ROJNAE'yê ya ku carcaran wî di kurtegotarên xwe de bi bîr tîne –, hestên ku li şûna bêyên der nuha têyên daqurtandine, bi tirs in. Heval weqa bi tirs in ku wan ji jina wî Trude xwaztine, bila baş haydare wê yekê be ku mêrê wê çi çekan nakirêye yan tiştên teqandinê li hev siwar nakêye, çimkî meroveki bi navê Eginhard Templer şûna rojnamevanê hatî kujtin, Tötges, girtiye û karê wî didomînêye: ji dest vî Templerî hatibû der ku wêneya Blorna di deriyê dukaneke rehînkirinê de bikişîne, herweha wêneyeke din ji dervayê pencereya li ser taxê de ku xuya dikir çawa Blorna û xwediyê dukanê li gel hev didan û distendin: ew di derheqê rehînkirina gustîrkekê de diaxiftin ku yê din bi berçavikeke taybetî lê dinihêrî. Di bin wêneya di ROJNAME'yê de hatî weşandin:

## "GELO ÇAVIYÊN SOR MIÇIQÎN LÊ KESEK DIXWAZÊYE XWE BI ŞÊWEYEKE SEXTE HEWCEDAR XUYA BIKE?"

## 53

Xema Blorna ya herî mezin ew e ku bi Katharina bide pejirandin, bila di dadgehê de bibêje, wê biryara tolgirtina ji Tötges roja yekşemê girtiye û mebesta wê tirsandina wî bûye, ne kujtin. Divabû bigota ku dema wê ew ji bo roja yekşemê vexwend hevpeyvînê, wê dil hebûye rasterast jê re bigota ku wî bi rêya şêweyên xwe yên çewt çi û çi hanîbû serê wê û diya wê, lê kujtina wî tew roja yekşemê jî di bala wê de nebûye, heta ne li dû xwendina ROJNAMEYA YEKŞEMÊ jî. Divabû wisa xuya nebûya ku Katharina bi dirêjiya rojan tevdêra kujtinê kiribûye û ew bi zanibûn bi kar hanibûye. Ew bizavê dikêye da bi wê bide fêhmkirin – Katharina înkar nake ku li dû xwendina gotara roja pêncşemê ramanên kujtinê di serê wê de hebûne – ku gellek merov – ew bi xwe jî – ramanên kujtinê carine dixin serên xwe lê divabû merov cudabûna di navbera ramanên kujtinê û tevdêrên kujtinê de bizanibûya. Ji bilî vê pirsê yeke din jî bala Blorna mijûl dikiye: ku Katharina ta nuha li kujtina Tötges ne poşman e û ji ber vê yekê dê nikaribe di dadgehê de wê hestê xuya bike. Li şûna ku xemgîn be, ew dilşad xuya dikiye ji ber ku rewşa ew tê de "wek ya berdilê min Ludwig e." Di girtîgehê de ew wek girtiyeke ku dikare ji bo yên din bibe nimûneyeke baş tête hesibandin. Ew di mitbaxê de kar dike lê eger dadkirina wê dereng bimîne, dê di beşê zexîreyê de têkeve ber kar li kuderê – têye

gotine – ne berpirsiyarên wî beşî, ne jî yên tê de dixebitin, bi hatina wê kêfxweş in çimkî nûçeya duristiya wê ber wê gihîştiye wire; û pêkaniya ku ew dema girtina xwe bi tevahî – têye gotine panzdeh sal ê ji bo wê bêyên xwaztin û heşt ta deh sal ê bêyên dayîn – di beşê zexîreyê de derbas bike li hemî girtîgehên welêt gellek kesan nerihet dikêye. Wek em dibînin: duristî û jêhatina di warê tertîbvaniyê de li çi şûnan bin jî, heta di girtîgehê de be, nayên xwaztin; berpirsiyar bi xwe jî naxwazin.

54

Wekî Hach di navbera xwe û Blorna de gotiye, pirsa ku Götten pêkan e kesek kujtibe wisa xuya ye dê nikaribe bête îspatkirin; loma, gunehbarkirina ji bo tawaneke wisa dê ji stuyê wî derkeve. Li milê din, kêm–zêde hatiye îspatkirin ku ew ne tenê ji leşgeriyê reviyaye, lê zirareke mezin jî (bi dirav û tiştan, ne tenê zirareke moralî) gîhandiye va sazûmana pîroz. Curma wî kirî ne dizîna ji bankekê, lê valakirina xizneyeke leşgrî bûye ku tê de mehangiya endamên du alayiyan û gellek pereyên din hebûne; herweha sextekirina hesabên bankan û dizîna şêkan. Bi gotinke din, ji bo wî jî heşt ta deh sal li pêş in. Xwebêj ew e ku ew ê sîh û çar salîn ji girtîgehê derketibe û Katharina sîh û pênc salîn; û Katharina rast jî tevdêran ji bo salên li pêş dikiye: ew dihesibîne, heta ku ew bête serbestkirin gellek fayîz ê ketibe ser sermiyanê wê û dema ew kata gihîşt, ew ê "li der–merekê, bêguman ne li vir, xwaringehekê veke, li gel xizmeta pêşkêşkirina xwarina ji bo munasebatan. Pirsa heke ew ê ji haliyê dezgehên fermî de wek destgirtiya

Götten bête pejirandin yan na dê bi ihtîmaleke mezin ne ji haliyê berpirsiyarên şûnbilind lê yên gellekî şûnbilind de bête bersîvdan. Kaxezên di derheqê vê yekê de hatine pêşkêşkirine û dest bi meşa dirêj ya di navbera dayîreyan de kirine. Ji haliyekî din ve, hat diyarkirin ku kesên Götten ji koşka Sträubleder telefone wan kiribû hemî endamên hêzên leşgerî yan jinên wan bûne, di nav wan de herweha serleşger û jinên wan. Têye gotine, riswatiyeke bi sînor di rojên dahatû de dê derkeve holê.

## 55

Di wê demê de ku Katharina hema–hema bêyî xem tevdêrên pêşeroja jiyana xwe dikiye, dilê Xanim Woltersheim roj bi roj bi hestên girr û şewatê têye dagirtine. Ew gellekî nerihet bû ji ber lekelêxistina navên day û bavê wê yê mirî ku wek qurbaneke stalînîzmê tête hesibandin. Dilê Else Woltersheim weqa ji merovan û civatê sar bûye ku heta bi Konrad Beiters be nikare xwe di çavên wê de piçekî baştir bide xuyakirin. Ji ber ku ew nuha bêtir di karê xwarina sar de mijûl e, yanê tevdêra amadekirina xwarinê ji bo şûnine dike û berpirsiyartiya belavkirina wê dike, girr û hêrsa wê bi ser mêvanan de dibare: rojnamevanên navneteweyî dibin, yên ji welêt dibin, pîşesaz, berpirsiyarên sendîgehan, karmendên bankan, sekretêrên dayîreyan û her weha. "Carine," wê gotibû Blorna, "ez xwe bi zor digirim ku leganeke tiji bostaniya kartolan bi ser saqoyê kesekî zîrt de nerijînim, yan siniyek salmonê bîsofî(10) bernedim suqura qehpeyeke ehmaq da ku ew êdî fêrî dersekê bibin. Hele bila carekê ji haliyê min de jî li wêneyê bête niherîn: çawa

ew xwarinê gêr devên xwe yên vekirî dikin, çawa êrîşe nanê bi kavyar dikin, û hindekên wisa hene ku ez dizanim milyonêr in, yan jinên milyonêran in, ku cixareyan, kibrîtan û kirtikên petit Fours (11) derbas beriyên, yan çenteyên, xwe dikin. Heye ku tew rojekê kodikên naylon jî li gel xwe wînin da ku qeheweyê û tiştên din jî bi xwe re bibin; û ev hemî bi şêweyekê yan ya din ji baca em didin tête der. Kesine hene ku wê rojê ne firavînê, ne jî xwarina nîvro dixwin, û dema digihên şûna vexwendinê wek keçelokan bi ser xwarinê dikevin – mebesta min ne îhanetkirina keçelokan e."

## 56

Ji pevçûnên ku tê de dest hatine bikarhanîn ta nuha me hay ji yekê heye ku, mixabin, deng da. Di vekirina pêşengeheke wêneyên Fredrick Le Boche de bû, ji bo kîjanî Blorna wek patron dihat nasîn, ku Blorna û Sträubleder dîsa rast hev dihatin; û dema Sträubleder devkenok ber bi wî hat, Blorna nexwazt destê xwe dirêjê bike lê Sträubleder destê wî xist nav yê xwe û bi dizî gotê: Ji bo xatirê xwedê, te çima wisa ceddî bi vê merseleyê girtiye?! Em nahêlin hûn bi bin ve biçin, lo, lê wa ye tu xwe bi xwe dixiye binî." Mixabin pêwîst e têkeve rapora me ku îcar Blorna rast yek avêt çengeya Sträubleder. Em merseleyê pirr li ba nexin da ku zû jî bête jibîrkirin: xwîn rijiya, ji pozê Sträubleder; çar ta heft dilop, bi gotina hinan, lê tiştê xirabtir va bû: tevî ku Sträubleder paş ve vegeriya jî, wî gote Blorna: "Ez dibexşînim, ez her tiştî ji bo xatirê rewşa atifî ya tu tê de dibexşînim." Wisa diyar e ku bi vê

gotinê re Blorna xwe wenda kir û bû sedema lihevûdinxistinê, bi gotina şahidan. Wek tête zanîn li şûnên ku tê de kesên wek Sträubleder û Blorna dikevin nav xelkê de rojnamevan jî têyên dîtin, û wisa wênekêşekî ROJNAME'yê, yekî bi navê Kottensehl ku şûna Schönner'ê hatî kujtin girtibû, va fersenda ji dest berneda, û ROJNAME'yê – ji ber ku ew êdî baş tête nasîn divêt merov mat nemîne – wêneya wî di bin vê sernivîsarê de, di hejmara roja li pêş de bêguman, da weşandin: "RÊZANEKÎ XWEPEREST JI HALIYÊ ABÛKATEKÎ ÇEP DE TÊYE LÊDANE." Di eynî şûnê de jinên wan, Maude Sträubleder û Trude Blorna, hatin hember hev. Maude Sträubleder gote Trude Blorna: "Dilê min bi te dişewite, Trudeya hêja," û Trude B.li Maude S.vegerand: "Dilşewatiya xwe vegerîne nav sarincê da ku têkeve nav hestên te yên din ku herweha di wir de veşartî ne." Li dû ku wê ji Maude S.car din peyvên bexşandinê, bi zimanxweşî, hema–hema peyvên bi evîn, wek: "Qe tiştek, heta gotinên te yên hişk bin jî, dilşewatiya min bi te kêm nake" bihîstin, Trude B.bi peyvine wisa li wê vegerand ku em nikarin wan li vir wek hatinî gotin binivîsînin, lê em ê tenê behsa tiştên ku peyv pê ve peywendîgir bûn bikin, wek agahdarkirina Maude S.ku çawa mêrê wê gellek caran bizav kiribû xwe nêzikî wê, Trude B., bike; û tiştine din jî hatin gotin – wisa jî wê pêwîstiya nixamtina agahiyan ku jina abûkatekî divabû rêzê jê re bigire da bin lingan –, wek: merseleyên gustîrkê û kilîta koşkê, "yên ku jinbirçîyê te'yî car li dû carê paş ve hatî vegerandin di hundir apartmanekê de hîştibûn." Li vir herdu stiyên ku pev diçûn ji hev hatin veqetandin, ji haliyê Fredick Le Poche bi xwe de, yê

ku fersenda rijandina dilopên xwîna Sträubleder ji dest bernedabû û bi haydariyeke mezin piçek kaxeza helçînk dabû bin dilopine xwînê û wisa – wekî wî bi xwe dabû zanîn – perçeyek ji hunera di deqeyê de afirandibû, bi vî navî: "Dawîhatina hevaltiyeke bi salan di navbera du peyan de." Û wî îmzeya xwe li binê kaxezê xist û neda Sträubleder, da Blorna, bi van peyvan: "Ji xwe re bifroşe da ku rewşa te ya aborî piçekî baştir bibe." Bi encama ragîhandina vê bûyerê û raberkirina zora tê de hatî bikarhanîn pêwîst e merov bikaribe têbigihê ku huner hîn jî bi rola xwe ya civakî radibêye.

## 57

Bi rastî jî cîhê daxê ye ku bi nêzikbûna dawiyê re weqa hindik ahengî li holê xuya ye û hêviya ku va rewşa di rojên têyên de bête guhertin gellekî bi sînor e. Li şûna berbihevhatinê dijhevî hat holê. Me maf heye bipirsin, gelo çawa, yan çima, wisa bû? Wa ye jineke ciwane dilşad kêm–zêde bi kêfxweşî diçiye vexwendineke dansêye ku zirara kesekî tê de tune û va jima li dû çar rojan (ji ber ku va rapor e, ne dayîna bîr û baweriyê, pêwîst e tiştên cîh girtinî bêyên nivîsandin) dibe kujer, û ev jî ji rûyê nivîsarên di rojnameyan de. Qirecir, nakokî, û dû re tew pevçûn jî, di navbera du hevalên salên dûr û dirêj de têyên holê. Jinên wan peyvên hişk bi hev wer dikin. Dilşewatî, lo tew evîn jî, paş ve têyên vegerandin. Tiştên bi carekê de ne xweş têyên holê. Merovekî bextewer, bêhnfireh, ku ji jînê, ji rêwîtiyê, û ji tiştên qenc hez dike weqa xwe ji bîr dike ku êdî bêhna ne xweş ji giyanê wî tê! Tew dibêjine ji

devê wî jî bêhna bed têye. Va merova koşka xwe dixe firotinê, diçe cîhê rehînkirina tiştan. Şûya wî "li karekî din digeriye," çimkî ew baş dizane, ew ê ji karê xwe bête avêtin; tew amade ye, va jina jîr û jêhatî amade ye karekî piçekî ji yê froşkareke mixazeyên firotina mobêlya bilindtir bipejirîne û wek "şîretvaneke raxistina hundir malan" bixebite, lê heta di derheqê bidestxistina vî karî de be jî jê re tê gotin: "biborîn, xanima hêja, muşteriyên me ji wan kesan in ku te wek neyarekê dizanin." Bi kurtî: Rewş baş xuya nake. Abûkatê Dewletê Hach ji dostan re gotiye, tiştê ku ew hîn ditirse ji Blorna re bibêje ev e: heye ku dadgeh wî, ji ber peywendiya wî ya nêzik bi merseleyê re, wek abûkatê Katharina û Götten nepejirîne. Encam ê çi be, va pirsa dê çawa bi seri bibe? Çi dê bête serê Blorna eger nehêlin ew êdî Katharina bibîne û – divêt êdî bête gotin! – destê xwe di destê wê ke? Guman tê de tune ku Blorna ji wê hez dike, ne ku ew ji wî, û çi hêvî jî ji bo wî li holê nîne çimkî her tiştê wê yê "Ludwigê hêja" ye! Û divêt bête gotin ku "hevgirtina" destên wan tiştekî bi tevahî yekhalî ye çimkî tevahiya wê wisa cîh digire: Dema Katharina dosiyan, noteyan, yan kaxezan derbas destên wî dike, ew destên xwe sê, çar, bi pirranî pênc dehyekên saniyeyekê ji usûlê bêtir li ser destên wê dihêle. De merov ê li vir çawa gotina hebûna ahengiyê bike heke hestên wî yên ji bo Katharina jî wî haydare wê yekê nekin ku xwe piçekî, em bibêjin, bêtir bişo? Zanibûna ku ew tenê, ne kesekî din, di derheqê çekê ku Katharina ji bo kujtina Tötges bi kar hanîbû de agahdar e – tiştê ku Beizmenne, Moeding û alîkarên wan hîn pê nedizanin –, ew jî ne sedemeke kêfxweşkirinê ye. Konrad Beiters bêyî ku kesek jê bipirse

gotibû Blorna, ew berê merovekî nazî bûye lê kesekî pê nedizanibû çimkî wî ji kesekî re negotibûye. Di wan deman de ew li Kuir berpirsiyarê partiyê bûye, û dikaribûye çeyiyekê bi ser diya Else Woltersheim xe; û nuha pirsa dabençeyê: ew ji karê wî yê berê jê re mabûye û wî ew li mala xwe vedişartiye lê ji ehmaqiya xwe carcaran raber Else û Katharina dikiriye, tew carekê her sê li gel hev çûbûne daristanekêye û li wir avêtibûne nêşanêye. Katharina xwe wek sekmaneke baş diyar kiriye û gotiye wî, wê wek keçeke ciwan di klûbeke sekmaniyê de garsonî kiribûye û dihîştine ew li wir carine çend gulleyan biavêje nêşanê. De roja şemê êvarê Katharina kilîta apartmana wî jê xwaztibûye, bi gotina ku, wekî merov dikare têbigihê, wê dixwaztiye piçekî bi serê xwe bimîne çimkî apartmana wê bi xwe di çavên wê de êdî reş bûbûye,... lê li milê din, ew wê êvarê li mala Else Woltersheim razabû, loma, wisa xuya bûye ku wê dabençe sibeya roja yekşemê ji mala wî rakiriye, ew jî li dû xwarina firavînê, xwendina ROJNAMEYA YEKŞEMÊ û derketina bi kincên jinên Ereban da ku biçe ew cîhê ku tê de rojnamevan digihîştin hev.

## 58

Di dawiya dawiyê de, çawa be jî, tiştekî ku keyfa merov piçekî xweş dike heye: Katharina merseleya kujtina Götten bi tevahî ji Blorna re got, herweha çawa wê ew heft yan şeş saet û nîvên di navbera dema kujtinê û gihîştina cem Moeding de derbas kiribûn. Baş e ku em ê bikaribin gotinên Katharina bi xwe bixwînin çimkî wê ew bi nivîs derbas Blorna kiribûn da ku bikaribe ji bo dadgehê sûdê jê

bigire:

"Ez çûm bara rojnamevanan, tenê da ku li wî binihêrim. Min xwazt bibînim ka merovekî wisa çawa xuya dike, vedixwe, direqise; ev merovê ku jiyana min herimand. Ez berê çûm apartmana Konrad, dabençe rakir û tew bi xwe jî dagirt. Di dema ku em ji bo avêtina nêşanê li gel hev çûbûn daristanê de min ji wî xwaztibû ku raber min bike çawa gulle diketin dabençeya wî. Ez saet û nîvekê ta du saetan li barê mam lê ew nebat. Min gotibû xwe, eger ew wek kesekî pirr erjeng xuya bike, ez ê di bevpeyvînê de beşdar nebim, û eger min ew di barê de dîtibûya hevpeyvînê dê cîh negirtibûya. Lê ew nehat meyxaneyê. Da ku hin kesên di meyxaneyê de li min nebin bela, min ji xwediyê wê, merovekî bi navê Peter Krafluhn ku ez wî bi riya karê xwe dinasim, yê ku di hindek şahiyan de berpirsiyartiya garsonan dikir, tika kir ku bihêle ez li paş barê alîkariya garsonên tiştên ji bo vexwarinê amade dikin bikim. Gotinê naxwaze ku Peter bay jê bebû ROJNAME'yê çi û çi di derheqê min de nivîsandibû. Wî got, eger Tötges were, ew ê min bi îşaretekê haydare hatina wî bike. Du–sê caran, ji ber ku dema karnîvalê bû, min pejirand ku rabim dansê. Nebatina Tötges dest pê kiribû min bitirsîne û balmijûl bike çimkî min nedixwazt bêyî amadebûn di hevpeyvîna li gel wî de beşdar bibim. Wisa, dema katjimêr bû duanzdeb ez çûm mala xwe û di ew apartmana gemar û leke lê ketî de min xwe di rewşeke bi tenî de hest kir. Tenê çend deqe derbas bûbûn ku min tê de hema emniyeta dabençeyê serbest kiribû û ew bi şêweyeke wisa di çênte de bi cîh kiribû ku ji bo kişandinê amade be, dema zengil lêket. Dema min derî vekir, wa bû li pêş dêrî rawestiyabû; û min jî hîn

digot belkî ji deriyê mezin yê li bini zengil lêxistiye û du–sê deqe fersend ê hebin ber dîtina wî, lê ew bi asansorê rabûbû jor û wa bû li pêş min bû, û ez ji bin ve hatim hejandin. Di cîh de min dît ew çi segbav e, merovekî rast bênamûs. Û bi ser ve xweşik jî. Ji ew'ên ku wek çeleng têyên hesibandin. Qey we ew di wêneyan de dîtiye. Bi vekirina dêrî re gote min: 'Belê, Blumikê, em her du çi bikin nuha?' Deng bi min neket, ez vegeriyam hundir û wî da dû min û got: 'Tu çima wisa bizdoyîn li min seyr dikiye, Blumika min? Bi ya min be, em ê bi kutanê dest pê bikin.' Di navberê de destê min xwe gîhandibû hundir çênte, û dema wî dest avêt kirasê min, ez ponijîm: 'Kutandin, çima na?' Û min dabençe kişand û di cîh de teqe lê kir. Du caran, sê caran, çar caran. Jimara rast nema dizanim. Rapora polîs ê xuya bike çend caran, heke te xwazt bizanibî. Bila neçe serê te ku ev yekemcar bû peyakî dest diavêt kirasê min – dema merov ji çardeh saliya xwe de, hîn zûtir jî, dest pê bike di malên xelkê de kar bike, ew ê fêrî tiştên wisa jî bûbe. Lê belê kesekî wek vî kesî û hîn bi ser de 'kutandin' jî! Û ez ponijîm: De baş e, ha ji te re kutandin. Gotinê naxwaze, wî hesabê tiştekî wisa nekiribû, û wî dora nîvsaniyeyekê li min mêze kir, wekî dema di filiman de kesek ji nişkan ve tête lêxistin. Dû re ew kat xwar, wek ez dizanim, mirî. Min dabençe çekir kêleka wî , çûm der, bi asansorê daketim jêr û car din li barê vegeriyam; û peter mat ma çimkî nîvsaetek bûbû, nebûbû, ku ez ji wir derketibûm. Li wir min karê xwe di barê de wek berê domand lê îcar neçûm dansê, û di kata li wir de min her digote xwe: 'ez bawer nakim min tiştekî wisa kiribe,' lê min dizanibû rast e. Û peter carcaran dihat û digot:

nema îroj tê, ew yarê te, û min jî gotê: Belê, wisa xuya ye. Û min wisa da xuyakirin ku ji bo min xem nake. Ta katjimêr çar min cudababetên lîkorê yan bîra berdidan peyalan, şûşeyên şampanyayê vedikirin û xwarina sar pêşkêşe mêvanên meyxaneyê dikir. Dû re min ew cîh li şûn hîşt bêyî ku xêtir ji Peter bixwazim. Ez berê çûm kilîseyeke ji barê ne dûr, dora nîvsaetekê li wir danişţim û diya xwe bi bîr hanî, ew jiyana wê ya şerpeze û perîşan, û min bavê xwe jî bi bîr hanî, ew'ê ku bi şev û roj lome dikirin û qiseyên xirab diavêtin dewletê, kilîseyê, mamûran, serleşgeran û her tiştî, lê dema wî yek ji wan ji bo mebestekê didît wî xwe diavêt lingên wan, xwe weqa nizim dikir ku bi zor deng jê dihat der. Û min mêrê xwe bi bîr hanî, Brettloh, û ew derewên wî ji Tötges re gotibûn; û helbet min brayê xwe jî bi bîr hanî, ew'ê ku her li dû pereyên min bû û heku min çend mark didan ser hev, ji dest wî dihat ku wan ji min bigire û li tiştên bêvac, li kincan, motorsîklan xerc bike, yan bi cûzê derde. Gotinê naxwaze, min keşe jî bi bîr hanî, ew'ê ku li xwendegehê navê 'Katika me ya sorik' li min kiribû, û min qe nedizanibû mebesta wî bi vî navî çi bû, û zarok hemî dikeniyan ji ber ku ez rast jî di cîh de sor dibûm. Belê. Bêguman min Ludwig jî bi bîr hanî. Dû re ez ji kilîseyê derketim û çûm sînemaya herî nêzik, û ji wir dîsa çûm kilîseyeke din, çimkî di ev yekşema karnîvalê de tenê di kilîseyekê de merov dikaribû piçek aramî bibîne. Gotinê naxwaze ku ez herweha di derheqê kesê hatî kujtin de ponijîm, ku di hundir apartmana min de bû, bêyî êşandineke wûjdanî, bêyî poşmantî. Ma ne wî kutandin xwazt, û min jî kuta; ma ne wisa ye? Û ji nişkan ve bi min ve xuya kir ku yê bi şev ji min re telefon dikir, û her-

weha Elseya bêçare aciz dikir, ew bi xwe bû. Ez ponijîm, deng eynî va denga bû, û min gote xwe, xweziya min hîştibûya ku axaftina xwe ya vala piçekî din bidomanda da ku baş têbigihêm eger dengê wî û yê di telefonê de bêyî çi guman eynî deng bûn, lê dê dîsa jî bêyî çi sûd bûya. Û dû re dilê min qehweyeke giran xwazt, û ez çûm qehwexaneya Beckering, çûm mitbaxa wê, ne hundir salonê, çimkî ez jina xwediya wê, Kathe, ji rojên xwendegeha malxevaniyê de dinasim. Kathe ji min re pirr rind bû, tevî ku ew zor mijûl bû jî. Wê fîncanek ji qehweya xwe da min, qehweya wek ya dapîra min ya ku ava germ bi ser qehweya hatî hêrandin de dirijand. Lê dû re wê dest pê kir li ser gemara di ROJNAME'yê de biaxife, bi zimanxweşî, lê bi şêweyeke wisa ku xuya dikir wê bi kêmasî piçek ji wê bawer dikir – ma xelk ê çawa bizanibe ku bi tevahî derew e?! Min bizav kir ji wê re şîrove bikim lê ew tênegihîşt; hema çav bi min re qurç kir û pirsî: 'Û tu rast ji vî kesî hez dikî?' Û min gotê: 'Erê.' Û dû re min ji wê re ji bo qehweyê spas kir, li derve taksiyek girt û çûm dîtina Moeding, mamûrê polîs yê ku di wê demê de gellekî rind bû ji bo min."

**Notên dawî**

(1) Temaşeyên karnîvalê li welatên Roman – Katolîk cîh digirin. Li Almanya rojên karnîvalê di beşê dawîn yê heyva sibatê de dest pê dikin. Êvaran xelk kincên mat û biyanî li xwe dikin, hindek caran da ku kîbûna xwe veşêrin. Mûzîk û dîlan, temaşe, henek, xwarin û vexwarin li gellek şûnan, bi taybetî di dawiya hefteyan de ta berbangê didomînin.

(2) Volkswagen (Volksvagin): Markeyeke otomobîlên ji çêkirina Almanya.

(3) Erebên şawî: Bedewî; Erebên çolê yên koçer.

(4) Saturn: Xudayê çandiniyê (zîraetê) li nik kevneroınanan.

(5) Ardenne Pastete: Paté Ardenne, babetekî xwarinê.

(7) Bajarê Aacchen (Axin tê xwendin / Çemê Rhein (Rayn tê xwendin).

(8) Wergerandina peyv bi peyv divabû wisa bûye: "...da ku wê ji vê gemarê biparêze û şerefa (yan namûsa) wê ya wendabûyî li wê vegerîne.

(9) Cowboy (Kawboy tê xwendin): Gavanên emerikî. (Mebest siyasî ye).

(10) Salmonê bîsofî: Goştê babetekî masiyan ku dixin nav dû da ku bêhna dû jê were.

(11) Petite Four: Babetên ji xwarina sar ku li ser piskewîtên ne şêrîn yan nên li mêvanan belav dikin.

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ **Celadet Alî Bedir-Xan** / Gramer
- DÊ Û DÊMARÎ **Egîdê Xudo** / Roman
- KESKESOR **Nûredîn Zaza** / Çîrok
- DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN **Rohat** / Lêkolîn
- HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ **Mehmed Uzun** / Ceribandin
- MÎRZA MEHEMED **Medenî Ferho** / Roman
- MILKÊ EVÎNÊ **Rojen Barnas** / Şiîr
- ZAROKA ŞEVÊ **Jack London** Werger: **Mustafa Aydogan** / Çîrok
- BIYANÎ **Albert Camus** Werger: **Fawaz Husên** / Roman
- MÎRZAYÊ BIÇÛK **A. de Saint-Eksupéry** Werger: **Fawaz Husên** / Çîrok
- GOTIN **Yaşar Kaya** / Ceribandin
- ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR **Xelîl Duhokî**
- ŞEVÊN SPÎ **Dostoyevskî** Werger: **Firat Ceweri** / Roman
- MIŞK Û MIROV **John Steinbeck** Werger: **Firat Ceweri** / Roman
- BEXÇEYÊ VÎŞNE **Çexov** Werger **Firat Ceweri** / Piyes
- LI BENDA GODOT **Samuel Becket** Werger: **Firat Ceweri** / Piyes

- GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: **Firat Cewerî** / Aforîsma
- GIRTÎ **Firat Cewerî** / Çîrok
- KEVOKA SPÎ **Firat Cewerî** / Çîrok
- KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT **Firat Cewerî** / Ceribandin, hevpeyvîn
- XEZAL **Sîma Semend** / Çîrok
- EVÎNA REBEN **Derwêş M. Ferho** / Şiîr
- BANGA HAWARÊ **Medenî Ferho** / Şiîr
- KULTUR Û RAMAN **Şerefxan Cizîrî** / Ceribandin
- KURÊ ZINARÊ SERBILIND **Sidqî Hirorî** / Roman
- ŞIÎRÊN BIJARTE **Mayakovskî** Werger: **Süleyman Demir** Şiîr
- PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ **Mustafa Aydogan**
- ŞEREFA WENDABÛYÎ YA KATHARINA BLUM

  **Heinrich Böll** Werger: **Şahînê Bekirê Soreklî** / Roman
- HINGÊ **Rojen Barnas** / Çîrok



Heinrich Böll di sala 1917'an de li Kölnê hatiye dinyayê. Ew piştî şerê cîhanê yê duwemîn, bi berhemên xwe *Trên di demê de gihîşt, Lê tu li ku bû yî* û *Adem* mîna nivîskar navê xwe dide bihîstin. Ew berhemên xwe bi belengazî û kambaxiya piştî şer dihûne; ji bo mirovatiyê li çirûskeke hêvî û aştiyê digere.

Böllê ku demekê serokatiya giştî ya PENê jî kiriye, di sala 1972'an de layiqî xelata Nobelê ya edebiyatê hatiye dîtin. Gava ew di sala 1987'an de wefat dike, ew mîna aktîvîstekî aştîxwaz gelek berhemên hêja li dû xwe dihêle. *Şerefa wendabûyî ya Katharina Blum*, ku wergeriyaye gelek zimanên cîhanê, ji aliyê ziman, form û naverokê ve yek ji berhemên Böll ya herî serketî tête dîtin.

Weşanxaneya me vê berhema hêja bi wergera Şahînê Bekirê Soreklî bi serbilindî pêşkêşî xwendevanên kurd dike.

Weşanên NÛDEM